T.K.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

NAVÊ TEZÊ

# Deq û Wate Xwendineka Pragmatîkî
## (Pexşana Lawikê Min Wek Mînak)

TEZA LÎSANSA BILIND

AMADEKAR
Bakhtiar Ismael ABDULRAHMAN

ŞÊWIRMEND
Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

VAN – 2020

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

TEZİN ADI

# Praktik Bir Okuma Olarak Metin ve Anlam
# (Örnek Olarak "Oğlum"Parçası)

YÜKSEK LİSANS TEZİ

HAZIRLAYAN
Bakhtiar Ismael ABDULRAHMAN

Danışman

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

VAN - 2020

(Lîsansa Bilind)
Bakhtiar Ismael Abdulrahman

ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
Kanûna Yekem - 2020
Deq û Wate Xwendineka Pragmatîkî
(Pexşana Lawikê Min Wek Mînak)

## KURTE

Şirovekirina deqî çalakîyeka hunerî, zanistî û dahênankarî ye. Gelek kirdeyên hoşekî û zîhnî tê da bi kar tên. Wekî: Têgihîştin, derbirîn, zanîn û şirovekirina hêmayan bo dîyarkirina wateya deqî. Lêkdan cûreyek e ji wergêrana derûnî pêk tê. Wek Jakopsonî amaje pê kirî, têgihîştin û ravekirina heman deqî di zimanekî dî da wateyeka cuda dide. Ev cûre lêkdan bo ravekirina deqên giran bi kar tê, ku xwendevanî desthilata temam li ser nabe.

Çemkê deqî hizir, wate û wêneyê hoşekî bi xwe ve digire, ku deq xuya dike bi rêya deng, peyv û risteyê da di çarçoveyê dewrûberê zimanî da. Lêkolîn li ser xwedê deqî me nagêhîne lêkolîneka temam. Bi tenê ew lêkolîn nebin ku çar dewrên deqî bi xwe ve bigire. Bi wateyeka din ew barûdoxê deq tê da ji dayîk bûye di sîngê xwedê berhemê deqî da ye. Çunke wê wate girê daye bi barûdox, jîyan, hizirkirin û helwesta dewrûberî ve. Ji ber hindê ziman dîyardeyeka komelayetî ye û têgihîştin jî di vê çarçoveyê da radiweste ser lênêrîna deqî di çarçoveya dewrûberî da. Dewrûber çarçoveyekê giştî ye ku tê da binema û yekeyên deqî bi rê dixe.

Agahîyên dewrûberên zimanî û bikaranîn di deqî da komeleka binema û zanyarîyên giring dide xwendevanî, ku pêk tên ji wêneyê giştî ku komeleka parçe û wêneyên rêxistî bi xwe ve digire. Bi vê çendê jî em nikarin bigêhîne wateya çi parçeyan heta cihê wê di nav parçeyên giştî da nezanin. Ji ber hindê şarezabûn di taybetmendîyên di nav deqî da me nagêhîne wateya temam a deqî. Wateya temama deqî bi tenê bi rêya girêdana deqî

bi dewrûberî ve dê me bigêhîne wateya mebest. Bi wateyeka dî heta em sinorê peywendîya di navbera deq û dewrûberî nezanin, em nagêhîne wateya kûr a deqî. Anko divêt deq ji dewrûberî nehê veqetandin da em bikarin wateya veşartî ya deqî bizanin. Helbet ev çend jî li ser zanîn û layenê epîstemolojîya xwendevan û rexnegirî dimîne.

**Peyvên sereke** : Deq , Wate, Xwendineka pragmatîkî

Hejmara Rûpelan : 141

Şêwirmend : Doç. Dr. Nesim Sönmez

(Yüksek Lisans)
Bakhtiar Ismael Abdulrahman

YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
Kasim - 2020

Praktik Bir Okuma Olarak Metin ve Anlam
(Örnek Olarak “Oğlum”Parçası)

## ÖZET

Metnin yorumlanması sanatsal, bilimsel ve keşifsel bir iştir. Birçok zihinsel öğe kullanılır. Bu öğeler arasında metnin anlamının görülmesi için anlamak, ifade etmek, bilmek ve öğelerin yorumlanması yer alır. Karşılaştırma bir çeşit psikolojik çeviridir. Jakobson’un belirttiği gibi, bu, bir dildeki anlama ve yorumlama, aynı metin başka bir dilde farklı bir anlam ifade eder. Bu yöndeki karşılaştırma, ağır metinlerin yorumlanmasında kullanılır, ki okur metnin tamamına hakim olamayabiliyor.

Metnin kavranılması, düşünce, anlama ve zihinsel imgeleri kendisine bağlar. Metin ses, kelime ve cümle yoluyla, dilin etrafında belirginleşir. Araştırma, bizi salt metnin kendisi ile bir sonuca ulaştırmaz, eğer metnin çevresindeki araştırmalar olmazsa. Çünkü metnin anlamı, yaşam, fikir ve çevredeki hal ve hareketlere bağlıdır.Bundan dolayı, dil toplumsal bir olgudur ve anlam da bu çerçevede metnin bakış açısı içinde kalır. Çevresel faktör genel bir bakıştır metinde. Bu nedenle metnin temellerini içinde barındırır. Metinde dil dışındaki çevresel baskılar ve dilin kullanımı, okura toplumsal bir altyapı ve önemli bilgiler sunar, ki genel bir resimden parçalanmış bir toplum ve uygun bir resim ortaya çıkar.

Bizler, onun yerini genel parçaların içinde bilmeyene kadar, bununla hiçbir parçanın anlamını da elde edemeyiz. Bu nedenle, bizim metin içindeki özelliklere hakim olmamız, onları bilmemiz, bizi metnin anlamının tamamına ulaştırmaz.Metnin tam olarak anlaşılması, sadece metin yolu ve çevresi ile anlatılmak istenene varabiliriz. Başka bir ifade ile, bizler metin ile etrafındaki ilgili sınırı bilmeyene kadar metnin derin

anlamını da bilemeyiz. Elbette bu da, okur ve eleştirmenin bilgi düzeyi ve epistemolojisi üzerinde kalmaktadır.

**Anahtar Kelimeler** : Metin , Anlam , Praktik Bir Okuma.
Sayfa Sayısı : 141
Tez Danışmanı : Doç. Dr. Nesim Sönmez

(M.Sc. Thesis)
Bakhtiar Ismael Abdulrahman

YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY
INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES
November - 2020
Pragmatical text and meaning
**(** Lawke Min Poetry as an example**)**

## ABSTRACT

The interpretation of the text is an artistic, scientific and exploratory task. Many mental items are used during the process. These elements include understanding, expressing, knowing and interpreting the elements in order to see the meaning of the text. Comparison is a kind of psychological translation.

As Jakobson points out, this is the meaning and interpretation in one language, the same text means a different meaning in another language. This comparison is used in the interpretation of heavy texts, so that the reader may not be able to master the entire text.Comprehension of the text connects thought, comprehension and mental images to itself. The text becomes clear around the language through sound, word and sentence. Research will not bring us to a conclusion with the text itself, unless there is research around the text. Because the meaning of the text depends on life, idea, and the state and actions in the environment. Hence, language is a social phenomenon and meaning remains within the text's perspective in this framework. The environmental factor is an overview in the text, so it contains the basics of the text. Environmental pressures other than language and the use of language in the text provide the reader with a social background and important information, which emerges from a general picture a fragmented society and an appropriate picture. Nor can we get the meaning of any part with it, until we know its location in the general parts.

For this reason, our mastery of the features within the text, knowing them does not allow us to reach the full meaning of the text. We can arrive at what is desired to be fully

understood the text, explained only through the text path and its surroundings. In other words, we cannot know the deep meaning of the text until we do not know the boundary around the text . Absolutely this is depends on knowing and Epistemology of reader and critics.

**Keywords** : Text , Meaning , Pragmatical Reading.
Quantity of Page : 141
Supervisor: Doç. Dr. Nesim Sönmez

# NAVEROK

KURTE ..... I
ÖZET ..... III
ABSTRACT ..... V
NAVEROK ..... VII
LÎSTA KURTEBÊJEYAN ..... X
PÊŞGOTIN ..... XI
DESTPÊK ..... 1
Beşa Yekem ..... 4
1. Pêkhate  û Taybetimendîyên Deqî ..... 4
1.1. Pênaseyên Deqî ..... 4
1.2. Taybetimendîyên Deqî ..... 11
1.2.1.  Likandin ..... 11
1.2.2.Vehandin ..... 12
1.2.3. Mebest ..... 14
1.2.4. Pesendkirin ..... 15
1.2.5. Ragihandin ..... 16
1.2.6. Helwest ..... 18
1.2.7. Hevdeqî ..... 19
1.2.7.1. Cûreyên Hevdeqîyê ..... 22
1.2.7.1.1. Hevdeqîya Yekser ..... 22
1.2.7.1.2. Hevdeqîya Neyekser ..... 22
1.3. Ruxsar û Naveroka Deqî ..... 24
1.4. Cûreyên Deqî ..... 27
1.4.1. Deqê Girtî ..... 28
1.4.2. Deqê Vekirî ..... 29
1.5. Deq û Dewrûber ..... 30
1.6. Cûreyên Dewrûberî ..... 34

1.6.1. Dewrûberê Zimanî ........ 34
1.6.2. Dewrûberê Nezimanî ........ 35
1.7. Vegerandina Dewrûberî bo Deqî ........ 42
1.7.1. Peywendîyên Hokarî ........ 43
1.7.2. Peywendîyên Ferhengî ........ 44
1.7.3. Peywendîya Niwandina Şêwazî ........ 44
1.7.4. Peywendîya Hevdeqî ........ 45
1.7.5. Peywendîya Hêla Wateyê ........ 45
Beşa Duyem ........ 46
2. Wateya Deqî ........ 46
2.1. Cûreyên Wateya Deqî ........ 46
2.1.1. Wateya Semantîkî Ya Deqî ........ 51
2.1.1.1 . Wateya Erkî ........ 53
2.1.1.2. Wateya Ferhengî ........ 53
2.1.2. Wateya Pragmatîkîya Deqî ........ 54
2.1.2.1. Wateya Zimanî ........ 55
2.1.2 .2. Wateya Dewrûberî ........ 55
2.2. Binemayên Wateya Pragmatîkê ........ 56
2.2.1. Şander ........ 56
2.2.2. Wergir ........ 56
2.2.3. Babet ........ 56
2.2.4. Dewrûber ........ 57
2.3. Şirovekirina Deqî ........ 57
2.4 . Qonaxên Şirovekirina Deqî ........ 62
2.4.1. Qonaxa Xwendina Deqî ........ 63
2.4.2. Destnîşankirina Fikrê ........ 64
2.2.3. Zanîna Jîyana Nivîserî û Jîngeha Wî ........ 65
2.2.4 . Hest û Sozên Nivîserî ........ 66
2.2.1.5. Şêwazê Nivîserî ........ 67
2.2.6. Hilsengandin û Biryardan ........ 69

2 .5. Astên Şirovekirina Rehendên Pragmatîkî ........ 70
2.5.1. Nîşankar ........ 70
2.5.2. Girêmanîyên Pêşekî ........ 72
2.5.3. Kirdeyên Axivtinê ........ 73
2.5.4. Derkevteyên Axivtinê ........ 74
Beşa Sêyem ........ 78
3. Deq di Navbera Mebesta Nivîser û Têgihîştina Xwendevanî ........ 78
3.1. Deq û Mebesta Nivêserî ........ 78
3.1.1 Cûreyên Xwendevanî ........ 79
3.2. Deq û Têgihîştina Xwendevanî ........ 82
3.2.1. Astên Têgihîştinê ........ 86
3.2.2. Hokarên Zimanî yên Dibine Egerê Tênegihîştinê ........ 88
3.3. Qonaxên Xwendina Pragmatîkî Ya Deqî ........ 93
3.3.1 . Rola Xwendevanê Deqî ........ 94
3.3.2. Pêngavên Xwendina Pragmatîkî ya Deqî ........ 95
3.3. Tijîkirina Valahiya Deqî ........ 97
3.4. KurtkirinaWateya Deqî ........ 100
3.4.1. Binemayên Kurtkirina Deqî ........ 101
3.4.2. Qonaxên Kurtkirina Wateya Deqî ........ 102
3.6. Pêngavên Şirovekirina Pragmatîkî Ya Deqî ........ 105
3.7. Mînaka Praktîkî Ya Şirovekirina Pexşana Lawikê Min ........ 107
ENCAM ........ 131
ÇAVKANÎ ........ 133
JÎYAN NAME ........ 141

## LÎSTA KURTEBÊJEYAN

| | |
|---|---|
| K.T. | Komara Turkîya |
| T.C. | Turkiye Cumhuriyeti |
| ± | Nîşaneya Dulayenî |
| X | Nîşaneya Hevdijyê |
| + | Nîşaneya Nêrzayê |
| _ | Nîşaneya Mêza yê |
| Htd | Heta dewîyê |

## PÊŞGOTIN

Nav û Nîşanê Lêkolînê

Ev vekolîn li jêr nav û nîşanê “Deq û Wate Xwendineka Pragmatîkî, Wek Mînak Pexşana “Lawikê Min” hatiye encamdan. Ku li ser sê beşan parve dibe : Beşa yekem, li jêr nav û nîşanê “Pêkhate û Taybetmendîyên Deqî” ku van babetan bi xwe ve digire : Pênaseyên deqî, naverok û ruxsara deqî, cûreyên deqî, deqê girtî û deqê vekirî, deq û dewrûber û vegerandina dewrûberî bo deqî. Herwiha beşa duyem li jêr nav û nîşanê “Wateya Deqî” hatiye encamdan ku van babetan bi xwe ve digire : Cûreyên wateya deqî, wateya semantîkî ya deqî û wateya pragmatîkî ya deqî, qonaxên şirovekirina wateya deqî, astên şirovekirina rehendên pragmatîkî. Herwiha beşa sêyem li jêr navê “Mebesta Nivîserî û Têgihîştina Xwendevanî ji Deqî” hatiye encamdan ku van babetan bi xwe ve digire : Deq û mebesta nivîserî, deq û têgihîştina xwendevanî, qonaxên xwendina pragmatîkî ya deqî, tijîkirina valatîya deqî, kurtkirina wateya deqî, pratîzekirina pexşana “Lawikê Min”.

Armanca Lêkolînê

Armanca me ji vê lêkolînê şirovekirina wateya pragmatîkî ya deqî bû. Yekgirtin û yeknegirtina mebesta nivîserî û têgihîştina xwendevanî bû. Herwiha paşxaneya rewşenbîrî û şarezaya ravekerî bo vedîtina mebesta nivîserî rola xwe heye yan ne? Ronkirina çawanîya şirovekirina deqên edebî j alyê pragmatîkî ve.

Rê û Rêbaza Lêkolînê

Ev vekolîne li jer ronahîya rêbaza şîkarî (wesfî) hatiye encamdan. Ji ber ku babet giringîyê dide wesfkirina wateyê û şirovekirina mebesta nivîserî.

Sinorê Lêkolînê

Ev vekolîne di Sinorê pragmatîkê da wergirtina wateya pexşaneka kurdî dike. ku pragmatêk di cîte di nava zanistên Zimannasyê da û di astê watesaziyê da çî digire.ku sinorê di navbera watesaziyê û pragmatîkê da xuya di ke.

Heta niha li zanîngehên Başûrê Kurdistanê nahê zanîn ku çi xebat li ser nav û nîşanê “ Deq û Wate Xwendineka Pragmatîkî ” hatibine encamdan. Lê belê bi awayekî gelemperî çendîn xebatên cuda cuda li dûr zanista pragmatîkê hatine encamdan û du kesên herî dîyar di biwarên pragmatîkê da xebatên berçav hene li zanîngehên herêmê. Ew jî Prof. Ebdulwahid Mişîr Dizeyî li zanîngeha Selahedîn û Prof. Şêrzad Sebrî Elî li zanîngeha Dihokê ne. Helbet pragmatîk zanisteka nû ye di nava zimanvanîya zanîngehên Herêma Kurdistanê. Wek pêdivî xebatên wiha nehatine encamdan. Hindek ji wan çavkanîyên sereke yên min mifa jê wergirtî wek bingeh bo avakirina têza xwe yên xwarê ne:


1- Zanistî Pragmatîk, Ebdulwahid Mişîr Dizeyî,
2- Pragmatîkî Deq û Gotar, Ebdulwahid Mişîr Dizeyî,
3- Deq, Nîşane, Wate, Ebdulwahid Mişîr Dizeyî,
4- Pragmatîk, Şêrzad Sebrî Elî,
5- Zimanvanîya Têkstî, Şoreşvan Adil,
6- Pragmatîkî Ristey Pisyarî û Ferman le Zimanî Kurdî da, Avêsta Kemal Mehmûd.

Spas bo Yezdanê pak û dilovan ku delîva jîyanê daye min ez şiyam vê vekolînê bi dawî bînim. Spas bo Zanîngeha Wan Yüzüncü Yılê Enstîtuya Zimanên Zindî ji bo ku delîveya xwendinê daye min. Spas bo Doç. Dr. Nesim Sönmezî ku şêwermendîya vê tezê bi stûyê xwe ve girt. Spas bo pirofîsor Dr. Ebdulwahid Mişîr Dizeyî mamostayê Zanîngeha Selaheddîn li beşa Ziman û Edeba Kurdî wek şêwermendê duyemê nefermî harîkarîya min kiriye. Spas bo mamosta Miradxan Şemzînî bi erka rastvekirina zimanî rabûye. Spas bo hemû mamostayên beşa Zimanê Kurdî li Zanîngeha Dihokê li Kolêja Perwerdeya Binyat. Spas bo her hevalekî ku bi pîtek jî harîkarîya min kiribe. Spas bo tevaya endamên malbata min dayîk û babên min ên xoştivî û xwîşk û birayên min, bi taybet heval û hevjîna min ji bo hevkarîya wê digel min da.

Bakhtiar Ismael Abdulrahman
VAN -2020

# DESTPÊK

Mirov di jîyana rojane da li dû hez û arezûya xwe zimanî bi kar tîne ji bo gihîştina armanc û berjewendîya xwe. Ziman wekî amûreka dûrû ye. Tu dikarî bo karê çak, baş û bi hêzkirina peywendîyên komelayetî, xweşî û asodeyî bi kar bînî. Di heman demê da mirov dişê wek çek û teqemenîyeka metirsîdar bi kar bîne û bibe egerê şer, alozî, nexweşî û jinavçûna sedan hezar kesan ji egerê bikarînana zimanê tund û tûjîyê çi di navbera kesan da be yan di navbera hoz û eşîretan da be yan di navbera dewletan da be.Zanista zimanî li ser çend astan parve dibe û em di vî wêneyî da dê bidine xuyakirin :




Ku wate ziman ji dengî dest pê dike ta bigêhe semantîk û pragmatîkê. Lêkolîna me jî li ser asta pragmatîkê ye ku dibe asta şeşê ya zimanî. Pragmatîk zanisteka wateyî ya nû ye û giringîyê bikarînana zimanî dide. Di van salên dûmahîkê da giringî pê hatiye dan, ku semantîk neşiyaye çareserîya hindek kêşeyên wateyê bike. Ev zanista wateyê di çarçoveya boçûnên bikarhatî wateyê lêk didet. Ji ber hindê hindek caran bi zanista bikarînan tê binavkirin. Ev zanista zimanî li hember zanistên peyvsazî, ristesazî û watesazî kêm lêkolîn li serhatine encamdan. Her ji ber vê çendê ev babet min hilbijart.

Pragmatîk erka ser milên semantîkê kem dike û rave û şirovekirinên guncav bo derbirînên neasayî û xerîb dike, dewrûberekî guncav bo vedibîne û bersiveka razîker berhem tine. Ta ku wê derbirînê bixe di qalibekî guncav da. Bi vî rengî di şiyandiye hemû derbirînên asayî û neasayî şirove bike û mebestê berceste bike yan nêzîk bike. Pragmatîk zanisteka aloz e. Çunke têkelî çendîn zanistên cuda cuda bûye û karîgerîyeka berçav heye di biwarê siyaset, edeb, ragihandin û dîyarkirina tawawan û destnîşankirina

nexweşîyên derûnî, axivtina rojane û hwd. Çunke wan hemû kirdeyên zimanî dide ber tîşkên lêkolînê ku ziman niwandina wan dike. Çi livîn û serederîyên bi agah bin yan livîn û serederîyên bêagah bin. Çunke wate di çarçoveya mebestê da tê lêkdan û şirovekirin.

Pragmatîk niha wek asteka nû ya zimanî tê hijmartin. Lê mêjûya vê peyvê bo serdemên kevn dizîvire. Di latînî da peyva “pragmaticus” û di grêkî da peyva “pragmaticos” dihate bikaranîn ku bi wateya karekî yan pragtîkê tê. Di hinek çavkanîyan da peyva pragmatîk ji peyva “pragma” ya grêkî hatiye wergirtin, ku bi wateya karkirin yan pragtîkê dide. Paşî vî zaravayî amaje bi her tiştekî peywendî bi karkirinê yan cîbicîkirina praktîkê ve hebe dida (Ebdulwahid Mişîr Dizeyî, 1999: 1). Pragmatîk wek zanist di nav rewşenbîrîya rojava da bo feylesofê emrîkî Çarlz Sandirs (1839-1979) vedigere dema du gotarên xwe li kovara metafîzîkîya di salên 1978-1979an belav kirin, bi nav û nîşanê çawa em dikarin wiha bikin hizir da ron û aşkera be ? Çawa dê şiyan da be bûçon bê selimandin? Ku cext li ser hindê kir hizir di siruştê Xweda da anîne bo nerîtên rasteqîne ku ew jî girêdayî du buhayan e. Yekem: Kengî kar tê encamdan? Duyem: Çawa kar cî bi cî dibe? Ku di haletê yekê da girê daye bi dirkkirinê ve û di haletê duyê da kar bo encamekê berceste dibe, da ku bigêhe hindê bê cîbicîkrin. Bikaranîna zaravayê pragmatîkî di serdema nû da bo yekem car ji layê feylesofê emrîkî Carliz Murîsî vedigere û di felsefa zimanî da hatiye bikaranîn bo sala 1938an vedigere, ku yekem kes e di serdema nû da ev zarava wek asteka zimanî bi kar anîye. Ew jî di dema pirtûka xwe da ya bi navê “Hêmalojî” ku zanista hêmayan li ser sê astan da parve dike. Ew jî ev bûn :

1- Sentaks: Ev ast lêkolînê li peywendîya hêmayên zimanî li gel hev dike.
2- Semantîk: Ev ast radibe bi lêkolîna hêmayên zimanî li gel wan tiştên amajeyê pê dikin.
3- Pragmatîk: Ev ast radibe bi lêkolîna peywendîya hêmayên zimanî bi kesî ve û li gel berçav wergirtina dem, cih û dîyardeyên heman cureyên peywendîyên bi van hêmayan ve hene (Şêrzad Sebrî Elî, 2014: 9). Herwisa di pragmatîkê da hêmayên nezimanî roleka giring di dîyarkirina wateyê da dibîne. Îca çi ew hêmayên nezimanî wêne, nîşane, amaje

bi tenê bi kar bên yan digel hêmayên zimanî bi kar bên herwekî digel axiftinê çavniqandin yan lêvguvaştin hebe. Bo mînak:

**To çend ciwan î!**

Eger çavniqandin digel vê gotinê hebe, li wê demê ev riste dê wateya xwe berovajî bigêhîne.

Giring e ku em amajeyê bi wê yekê bidin ku pragmatîk di salên heftêyan da li sedê bîstê li ser destê her sê feylesofên zimanî Sîrîl , Ustin û Graysî pêşkevtin bi xwe ve digire. Ev her sê zana ser bi Qutabxaneya Felsefeya Zimanî ya Siruştî bûn û ji bilî vê qutabxaneyê qutabxaneyeka dî hebû bi navê Qutabxaneya Felsefeya Zimanî ya Formî yan Şêweyî tê binavkrin û Karnayî nûneratîya vê qutabxaneyê kir. Belê van hemû feylesofan giringî bi rêya gihandina wateya siruştî ya zimanê mirovî dida. Ew jî dema axivtinker peyamê arasteyî guhdarî dike û guhdar wê peyamê rave dide.

Pragmatîk diçe di nav gelek zanistan da ku wate têkilî gelek zanistan dibe. Herwekî Dafîd Krîstal dibîne gelek zanistên zimanî û nezimanî dema lêkolîn li şirovekirina pragmatîkê tê kirin, pişikdarîyê digel yek dikin. Wek:

1- Watesazî,

2- Zanista Şêwazî,

3- Zimanvanîya Civakî,

4- Zimanvanîya Derûnî,

5- Şirovekirina Gotarê (Elî, 2014: 10).

Bêguman buwarê pragmatîkê buwareka berfireh e û berbelav e ku em dikarin bibêjin: Çend cureyên pragmatîkê hene. Wek pragmatîka zimanvanan, pragmatîka zanayên rewanbêjîyê, pragmatîka zanayên lojîkî, pragmatîka feylesofan û hwd. Ev çend dibe egera hindê pirosesa sinordarkirin û destnîşankirina vê zanistê bi hûrî bi sanahî nabe. Çunke Franiswaz Ermînku dibêje: Pragmatîk wek lêkolîn di kubîtka werarbûnê da ye, ku di rastî da hêj nehatiye destnîşankirin. Ku wate dibe gorankarî di têgeh û pênaseyên wê da bê kirin û lewra heta niha pênaseyeka destnîşankirî û cîgir bo nehatiye kirin.

## Beşa Yekem

### 1. **Pêkhate û Taybetimendîyên Deqî**

#### 1.1. Pênaseyên Deqî

Deq, bîyaveka berfireh di nav zanistên epîstimolojîyê da bi xwe ve digire û hemû biwarên merîfî beşek in ji deqî. Deq cîhaneka firehlayen e ku hemû bîroke, çemk û bîyavên dirkkirinê û hest, soz, derûn, kirdeyên axivtin û nivîsînê bi xwe ve digire. Deq dînamîkîya berdewama jîyanê ye.Ew a digel hebûna mirovayetîyê ji dayîk bûye û berdewam di geşekirin û livînê da ye. Ji bo tomarkirina hemû kirdar û reftarên mirovan li goreyî serdem û cihê xwe ku verêja hizr û bîrên mirovî û rengvedana komelgeha mirovayetîyê bûye û rêgeha derbirîna êş û azar û xweşî û pêdivîyên mirovî û alogorkirina bîr û boçûn û pêkvegirêdana takekesên komelgehê û hilgera peyama mirovayetîyê bûye çi peyama zanistî û dirkkirinê be yan ya wijdanî û hest û sozan be. Bi awayekî giştî em dê qala têgeh û pênaseyên deqî bikin.

Zanista deqî zaraveyekî nû nîne, formalîstên ûris di destpêka sedsala nozdehan da bi zaravayên cuda cuda bi kar anîne. Bo mînak Cakopsin zaravayê zanista edebî bi kar anîye, paşî hevalê wî Îxinbawm di gotarekê da bi nav û nîşana teorîya rêbaza formalîstan heman zarava bi kar anîye. Zaravayê deqî bi kar tê bo bihayekî dîyarkirî di zimanvanîyê da, lêkolînê di guncandina rêkeftina di navbera keresteyan da dike, deq gotareka nivîskî ye, ji derveyîî dewrûberê wê yê resen tê belavkirin. Lewma giring e em serederîyeka semantîkî di gel da bikin. Deq girêdayî nîne bi tenê wek berhemhên, lê gelek caran di navbera axivkeran da parve dibe, wekî gelek caran axivkerek qala rûdanekê dike li ser zimanê axivkerekî dî, ev dîyarde dibe egera cudahîya deqan di nav yek deq da. Bi aweyekî dî yê cudahîyê dizîvire bo bikaranîna di nîşan û wêne û nîgarên nav deqî da (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2015: 93). Ku wate deq ji dewrûberî tê veqetandin û dibe gotareka bêdewrûber. Divêt deq bi çavekî semantîkî bê xwendin.Bi şêweyekî giştî çemkê deqî babeteka berfireh e û rehendên cuda bi xwe ve digire.Wekî pênaseyeka aloz û nesade derdikeve û naçe di nav pênaseyeka giştgîr û deqîq da û hewkêşeyeka cêgîr û

dîyar nîne. Ev çend jî, bo komeka hokaran ku ji pêkhatina binyata deqî û rehend û cemserên girêdayî bi deqî ve dizîvire. Bi wateyeka dî derketina prosêsa deqî bi şêwaz û formên cuda û herwisa hebûna binyata hunerî û layenê zimanvanîya deqî û berhemhênan û zindîbûna deqî û berfirehî û lêkeft û geşesendina janrên edebî, layekî dî taybetnebûna berhemhênana deqî bi takekesekî û qonaxeka dîyarkirî ya jîyanê û lênêrînên curbicur li ser siruşta deqî, vê çendê karê pênasekirina deqî gelek zehmettir kiriye û ji ber vê yekê, livîn û gorankarîyan deq nikare pênaseyeka giştgîr û dîyarkirî wergire. Siruşt berdewam bûn û dubarebûn di serdemên cuda cuda da berdewam gorankarî bi ser da tê û di livîn û geşekirineka rêjeyî da ye. Ev çend jî me berev wê bîrdozîya fîzîkî dibe ku ew madeyê gorankarî bi ser da bê naçe li jêr pênaseyeka reha û yekgirtî. Çunke di doxê livînê da şêwe û taybetmendîyên madeyî tê guherîn, lewra di doxê gorankarîyê da her livînek pênaseyeka berhem tîne, ev bîrdoz jî digel deqî digunce û çemkê deqî jî girêdayî heman binemayê fîzîkî ye.

Deq sûd û giringîya xwe wek alîyekî teorî ji zanista deqî û teorîya deqî û şirovekirina deqî werdigire, pênase û têgehîştinên cîyawazên deqî ji layê komelayetî û ziman û rewşenbîr û mêjû û hizrî da di rojevê da ye (Helmet Bayîz, 2013: 74). Eger em lê binêrin em dê bibînin ku lênêrînên kevn cudahî heye digel lênêrînên nûxwazan bo çemkê deqî, herwisa pênaseya felsefeyê bo deqî ji pênaseyên dî cudahî heye, wekî her yek ji biwarîyên dî (wek zimanvanî, edebî, hunerî û ayînî) pênaseya xwe bo çemkê deqî heye, heta di nav yek biwar da jî araste û têgehîştinên cuda hene. Deq xwedîyê siruşteka gorankarî ye. Ji ber vê yekê guherîn û livîn û pêkhateyên asta deqî binyata deqî pêk tînin. Li ser wî binemayî deq wek çemkekî edebî, felsefî û zimanvanî serederî digel da têgirin, her ji ber vê yekê ye li çendîn kujîyên cuda cuda û her yek li goreyî pisporî û taybetmendîya xwe pênaseya deqî kiriye. Bo mînak hindek deqî bi cemserê bikerî û berhemanîna deqî bi jîngeha deqî ve girê didin û hindekên dî ji layenê zimanî, hunerî û îstatîkîya deqî dinêrin û herwisa hindekên dî giringîya deqî ji alîyê naverokê û peyama deqî û radeyê karîgerîya deqî li ser xwendevanî dibînin û hindekên dî ji alîyê form û qebareyê deqî ve deqî pênase dikin (Newzad Weqas, Rêbiwar Mihemed, 2019: 12). Herwisa rexnegir yan şa'ir yan her edîbek dûrî dîtineka zanistî li jêr karîgerîya hunerî, edebî û îstatîkî pênase deqî dike û komelnas bihayê deqî bi komelgehê ve girê dide.

Derûnnas jî layenê derûnî yê nivîser ê deqî di pênasekirina deqî da berçav werdigirin, zimanvan deqî bi ast û keresteyên zimanî ve girê didin û her yek ji van li gorî hizir, îdeolojî û pisporîya xwe li siruşta deqî nêrîye. Hinekên dî berfirehwantir û ji çendîn rehendan ve pênaseya deqî kiriye. Bo mînak, Hîlmîslîf dibêje: “Deqî wateyeka gelek berfireh wergirtî ye, deq hemû komkirinekê bi xwe ve digire, çi nivîsî be yan gotineka zarakî be, dirêj be yan kurt be, kevn be yan nû be.” (Ednan Bin Zerîl, 2000: 54 ). Li goreyî vê pênaseyê deqî sinorekî berfireh bi xwe ve digire û dibe hilgirê komeka nasnameyên cuda, ji belku deq bi arasteyeka dîyarkirî û serdem û formeka taybet ve ne girê daye û çi sinor û merc bo dîyar nekirine, anko deq jî wekî her zanisteka dî yê mirovayetîyê bi asan nayê pênasekirin. Çunke di biyaveka epistimî yê firerehend di nava zanistên mirovayetî da rehendên cuda bi xwe ve digire. Herwiha Pol Rîkur dibêje: “Deq ew gotar e, ya bi nivîsînê hatiye cêgîrkirin.” (Seîd Yeqtîn, 1989 : 5). Di vê pênaseyê da Pol Rîkor deqî pêwîst dike bi prosesa nivîsînê ve, di vir da forma nivîsînê bo deqî dirust dibe û çemkê deqî sinordar û mercdar dibe, lê merc nîne deq bi tenê girêdayî nivîsînê be. Her deqek bi tenê nivîsînê bi xwe ve nagire, belku guftûgoya di navbera du kesan da jî her bi deq tê hejmartin (Mohemed Merûf Fetah, 2011: 206). Wate nivîsîn bi tenê bi deq nahê hejmartin.

Herwisa hindek kesên dî behsa pişikdarîya rêjeya çemkên deqî di daneyên zimanî da dikin. Di prosesa berhemanîna deqî da, anko derketina deqî ji layê qebareyê rêjeya bikaranîna peyv û risteyan û wê wateya digel xwe hilgirtî, yan em dikarin bibêjin qebareyê deqî dibe peyvek be yan risteyek, peregrafek yan berhem û kitêbeka temam yan jî nîv dêrehozanek yan qesîde û xezalek yan romanek be, hindek qebareyê deqî ji risteyê mezintir dibînin. Deq wê dana zimanî bi xwe ve digire, ya ku bi ser risteyê da pêk tê (Salîk Rafêl, 2009: 43 ). Anko deq yekeyeka zimanî ye, ji risteyê dest pê dike û berev serî diçe. Herwiha deq pêkhateyeka serbixwe û girtî ye, ji komelayeka risteyan pêk hatiye û wateyeka ron û aşkira heye (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2014: 47). Di vir da deq wek yekeyeka serbixwe û girtî tê qelemdan. Bi dîtina Rolan Bart, deq pêkhateyeka aloz e, wekî tevnçinînê ye. Ji komeka peyv û risteyan yek li dû yekê hemû pêkve wêneyekî watedar dirust dikin (Monzîr Eyaşî, 2002: 122). Ji bilî wê yekê ku Rolan Bart

amajeyî qebareyê deqî dike, wekî tevnekî aloz pêk tê, ku çendîn peyv û riste bi xwe ve digire û amajeyî bi wê çendê jî dike ku ev pêkvegirêdana risteyan yek li dû yekê bi hev ra biguncin û wêneyekî watedar berhem bihênin. Hin kesên dî bo berhemanîna deqî yan bo dirustkirina wêneyekî watedar di deqî da pîver û rêjeya beşdarîya peyv û risteyan dananin û bi dîtina wan binemayê çendayetî bo deqî giring nîne, dibe ku deq negihêje rêjeya risteyeka temam û di yek peyv da berceste bibe. Bo mînak li dû boçûna Hîlmisîlîfî, kurtî û dirêjî bo deqî merc nîne, li gorî boçûna wî peyva , raweste, ew bi xwe bi tenê deqek e û çi cudahî digel romanekê nîne. Çunke bi dîtina navbirî hemû berhemhênanên zimanî birîtî ne ji deqekî temam (Arî Osman Xeyat, 2011: 8). Çunke her peyvek yekeyeka zimanî ye û hilgira peyamekê ye û dikare ji alîyê wateyê ve armanca xwe bibigêhîne. Bo deqî pîvera çendayetîyê pêdivî nîne. Dibe ku deq peyvek be, yan risteyek be yan berhemeka edebî be, deq yekeyeka wateyî ye û formeka dîyarkirî nîne. (Seîd Yeqtîn, 1989: 18), çunke, zorbeyî deqên berbelav ji yek risteyê kêmtir pêk hatine. Wekî: agahdarî lafîte, bo firotin, girtî ye, wate kurtî û dirêj ber çav nayê wergirtin (Qeîs Kakil Tewfîq, 2002: 32). Di rastî da bikaranîna forma peyvekê bo deqekî biçûk e, ev form bi vî qebareyê heye bê hevpêç û veqetîyayî ji dewrûberî û ew wateyên girêdayî bi wê peyvê ve amanca deqî pêk naîne. Ew peyva wekî deqî serederî digel da tê kirin di rastî da proseyaka netemam e. Çunke bi tenê peyvek derketîye û alîyê dî yê proseyê derneketî ye. Wekî dewrûber, dem û zanyarên hevpişk di navbera xwendevan û nivîserî da, deq bê wan dê bibe daneyeka ferhengî ya biçûk, di vê daneya ferhengîya biçûk da deq xuya nabe. Wekî dîyarkirî deq daneyeka zimanî ye û ji risteyê mezintir e. Anko pitir ji risteyekê pêk tê, divêt ev riste bi rêyên cûrbicûr ên rêzimanê pêkve bên girêdan, da ku hemû kes wekî daneyeka temam wergirin (Salîk Rafêl, 2009: 43). Ku wate di deqî da çendîn peyv û riste beşdar dibin û hemû pêkve yekeyeka zimanî ya serbixwe pêk tînin. Herwisa deq parçeyeka zimanî ye, bi gotin yan bi nivîsîn, di her radeyekê da be, ku yekeyeka serbixwe pêk tê (Rehîm Surxî, 2012:11). Di vê pênaseyê da çendîn taybetmendîyên deqî xuya dibin: Deq yek parçe ye, yekeyeka zimanî ye , şîyanên şirovekirinê hene , eger di her radeyekê da be, çi kurt be yan dirêj be , nivîsîn be yan dirkandî be, kevn be yan nû be , ya giring wî deqî komeka derbirîna heye û yekeyeka zimanî û şiyanên şirovekirinê hene di her barûdoxekî da be..

Herwisa Halîday dibêje: Deq yekeyeka semantîkî ye, peywendî bi wateyê ve heye çi ew deq e yê nivîsî be yan yê dirkandî be, pexşan be yan şi'ir be, guftûgo be yan menelog, herwisa agahdarî, nav û nîşan, dirûşm , gotinên mezinan, bi deq têne hejmartin (Sacîde Ebdulla, 2008: 182). Ku wate deq yekeyeka veqetandî ye ji dewrûberî , her parçeyekî nivîskî be yan dirkandî be û xwedan wate be bi deq tê hejmartin. Anko wisa dîyar dibe ku deq ji risteyê mezintir e û dibe risteyek be yan parçe pexşanek yan şi'irek yan her parçe nivîsînek yan gotinek be. Herwisa Pul Rîkur giringîyê bi nivîsînê dide û bi pêdivî yeka mezin dibîne û ji vî rehendî ve pênase dike û dibêje: “Bila her gotûbêjekê bi deq danin, dema bi nivîsînê tê çespandin û bercestekirin (Muhsin Arif Salih, 2012: 28). Ev çend jî rûdana nivîsînê ji rûdana axivtinê cuda dike û her yek ji wan ber bi serbixweya xwe dibe. Herwisa di pênaseyeka dî da hatiye: Deq pêkhateyeka zimanî ye yan şêweyê axivtinê ye , ji zincîreka risteyên di dû hev da hatî, ku di nav wan risteyan da hevgirtinek û pêkvegirêdanek heye, ew riste bi rêya firêkerî (şandiyar) bo wergirî tên veguhestin, wergir wan risteyan deqa û deq werdigire. Çunke di nav deqî da ew barûdox û mebestên heyî li berçav nahêne wergirtin (Ebdulselam Necmedîn û Şêrzad Sebrî, 2011:76). Di vê pênaseyê da dîyar dibe her şêwazekî axivtinê bi deq tê hejmartin. Herwisa deq çend riste pêkve girêdane, anko deq ji risteyê mezintir e. Wergir wan risteyan deqa û deq werdigire. Ku wate giringî bi dewrûberên deqî nahê dan. Wergir bi tenê layenê semantîkîya deqî werdigire û mebest û barûdoxê deq têra derbaz bûyî berçav nahê wergirtin ku mebest dewrûberên deqî ye.

Herwisa di pênaseyeka dî da hatiye, deq ew şêweyê rût e (tazî ye) ew ê ku tê da takekes yan dem yan cih, mebest nebe û pitirîya caran ji layê sentaksê û ferhengsazîyê ve, lêkolîn tê kirin (Mehmûd Kaşe, 2005: 45). Ku wate, danerê deqî û dem û cih tên firamoşkirin bi tenê xwedîyê deqî giring e, ku di nav bazneya sîstema zimanî da dimîne. Deq yekeyeka semantîkî ye, ji ber ku wate peyv û risteyan tê da bi rêya peyv û risteyên dî yên wî deqî bi dest ve tê. Ev çend dibe eger ku ew peyv û riste hemû pêkve wekî yekeyeka wateyê serederîyê digel bê kirin û bi navê deqî bê binavkirin. Belê ya giring di nav deqî da dewrûber li berçav nahê wergirtin. Ev çend dibe eger kes, dem, cih, barûdox û mebestên tê da heyî, bên piştguhavêtin (Şêrzad Sebrî Elî, 2011: 123). Ku

wate, deq yekeyeka semantîkî ye û dabiriye ji dewrûberî û tenha wekî ferheng tê şirovekirin, eger dewrûber çû di nav deqî da dê bibe gotar.

Herwisa Todurof dibêje: "Dibe deq risteyek be yan pirtûkeka temam be, tê nasîn bi serbixwe û daxistî." û dibêje: "Nakeve di nav sîstema zimanî da, belê em dikarin bixin peywendîyeka lêkçiwandin û nêzîkbûnê da." (Muhsin Arif Salih, 2012 :23). Dibe ku deq risteyek be yan pirtûkek be, ku wate, hemû beşên deqî pêkve girêdayî ne, çi ya mezin be yan ya biçûk be wekî yekeyeka wateyê tê hejmartin, nakeve bin yasayên sentaks û rêzimanê ve, lê belê wekî yekeyeka zimanî serederî digel da tê kirin. Herwisa deq ji alîyê pêkhatinê ve ji komekan peyvan pêk tê, girtî û serbixweya xwe heye û xwedan naverok û wate ye û parçeyên wê hevdû temam dikin û derbirîneka rûn e û bo xwendevanî tê nivîsandin û di hemû deman da tê xwendin (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2012 : 103). Anko deq ji çendîn peyv û risteyan pêk têgirtî û serbixwe ye, anko hemûyan pêkve yek wate heye, ku wate, eger deq ji çendîn parçeyên cuda jî pêkhatî be wekî yekeyeka wateyê û serbixwe tê hejmartin û hejmara parçeyan nabe egerê wateyên cîyawaz.

Herwisa hindek zimanvan li dor pênaseya deqî dibêjin: Deq li ser risteyê ye, anko ji risteyê mezintir e. Herwisa hin kesên dî wisa dibînin ku deq zimanê nivîsînê ye, herwisa Van Dayk derbareyî deqî da dibêje: "Beşeka teorî yê rût e ji zimanî, ku çi peywendî digel dewrûberên nezimanî nîne, ew tê da tê bikaranîn." Brawin û Îwil dibêjin: "Deq tomara mêjî ye bo kirdeya gihandinê." Sikîfîrun li dûr pênaseya deqî dibêje: "Deq ji naveroka zimanî yan pêkhateya zimanî bo gotinê, anko wateyên semantîkên cîgir bo peyv û derbirîn û risteyên deqî dirust dikin." (Şêrzad Sebrî Elî, 2015 :193). Herwisa hindek zimanvanên dî di pênasekirina deqî da cextê li ser alîyê rêziman û cihê wê dikin, ku yekeyeka rêzimanîya mezintir e ji risteyê. Haws di pênaseya deqî da dibêje: "Deq ji dirêjbûneka zimanî ye, ku tê da regez û pêkanînên zimanî hemû pêkve tên girêdan û yekeyeka tevgira pêkve girêdayî dirust dike." Bi dîtina Nekadî deq pêkvegirêdana risteyan e di yekeyên mezintir da. Herwisa deq riste ne di pêkvegirêdanê da. Bîlî dibêje: "Deq ji zincîreka lêkdayî ji derbirînên zimanî yên yekeyeka tevgir û giştî dirust dikin. Ezîz û Letêwş dibêjin: "Deq yekeyeka zimanî ye, mezintir e ji risteyên nivîsî yan gotî û

ji risteyekê yan çend risteyan pêk tê.” Halîday û Rûqîye dibêjin: “Deq yekeyeka zimanî ye di karanînê da ne ku yekeyeka rêzimanî ye wek laristeyê û risteyê li dû qebareyê pênaseya deqî nahê kirin” (Şêrzad Sebrî Elî, 2015, 193). Anko deq yekeyeka zimanî ya serbixwe ye û daneyaka ferhengî ye. Herwisa Rolan Part deqî pênase dike û dibêje: “Deq tevnekî ji têhilkêş û veguhestin û dengvedana ziman û rewşenbîrîyên kevn û yên hevçerx ku derbazî deqî dibin, bi dîtina wî deq jeolojîya nivîsînê ye.”

Her wekî Kristîva deqî pênase dike, ku bi dîtina wê deq bi çend alîyan tê avakirin û pêkhata deqî ya siruştî ji deqên hevdem û kevn pêk tê (https://xedeng.uoz.edu.kird) û ev pênase me berev têgeheka nû di zimanê rexneya hevçerx da dibe, ew jî hevdeqî ye, ku hevdeqî yek ji taybetmendîyên deqî û di nav taybetmendîyan da em dê bi awayekî berfireh behsa hevdeqîyê bikin.

Deq di nav bazina ziman û prosesa zimanvanîyê da lêkolîn li ser tên kirin, çunke ziman desthilat e bo berhemanîna her deqekî yan her berhemeka edebî, anko hebûn û nasnameya deqî bi zimanî ve girêdayî ye. Rolan Part dupatîyê li ser zimanî dike ne bi tenê bo deqî, belku bi nasnameya mirovî dizane û dibêje: “Mirovî bê ziman çi hebûn nînin” (Yasîn Qadir Berzincî, 2009: 23). Nivîser bi rêya bikaranîna zimanî û têgehîştin û dîtin û barê psîklojî di formekê da berceste dike û ev bercestebûn xwe di deqî da dibîne. Bi dîtina Şilayir Maxir, deq navendeka zimanî û fikrî ye û nivîser vediguhêze bo xwendevanî, ziman jî ew çarçove û jîngeh e ku nivîser tê da kar dike da ku bîr, hizir û boçûnên xwe veguhêze bo wergirî (Nesir Hamid Ebu Zeîd, 1999: 21). Anko prosesa veguhestin û bercestekirin û wênekirina bîr û hizrên nivîserî bi rêya zimanî. Ku wate, deq yekeyeka mezin a zimanî ye û daneyeka semantîkî ye çi ya mezin be yan ya biçûk be. Bi wateyeka dî deqî wate û mebesteka berfirehwan heye, dibe bi tenê peyvek be yan çendîn riste bin yan pirtûkeka serbxwe be, yan nav û nîşanek be yan hêma û amajeyek be (Foad Reşîd, 2007: 55). Anko her parçeyekî zimanî be û wateyeka serbixwe bigêhîne bi deq tê hejmartin. Bi dîtina min ev hemû pênaseyên bo çemkê deqî hatine kirin, hindek girêdayî layenê teorî û hindek jî girêdayî layenê pratîkîya deqî, hindek girêdayî binemayên deqî ne, hindekên dî girêdayî mêjûya deqî û babetbûna deqî û layenê komelayetî û derûnîya deqî, ev hemû pêkve têgehiştin û ronkirineka berfireh li ser

çemkê deqî berceste û xuya dibe ku deqî rûberekî firewan di nav zanistên merîfî heye û taybet zanistên mirovayetî da bi xwe ve digire. Bi şêweyekî giştî deq wek kereste û yekeyeka mezin a zimanî tê qelamdan, em dikarin bibêjin: Deq ew xwedîk e ya mirov hizr û bîrên xwe tê da dibîne û hez û arezûyên xwe tê da berceste dike. Herwisa deq ew gorepan e ya ku hizr û bîroke tê da têne nimayîşkirin bo arastekirina mirovan berev wê mebesta nivîserî pê heye çi arasteyên çep bin yan yên rast bin, anko deq rengvedana komelgeha mirovayetîyê ye û hilgira pirsên civakî, ramyarî, kulturî, edebî, hunerî, mêjûyî, ayînî, derûnî, rewşenbîrî, zanistî, perwerdeyî û hwd. Anko deq tomara zanyarîyan e ji firêkerî bo wergirî.

### 1.2. Taybetimendîyên Deqî

Her janreka edebî yan her çemk û têgeheka zimanvanî xwedîyên xwe çendîn taybetmendî û saxletên cuda û serbixwe ne. Bêguman deq jî xwedan hindek sîmayên dîyar e, çend pîverek bo deqî hatine danan ku deq ji tiştê dî bê cudakirin, divê li ser zimanvanîya deqî wesf û şirovekirinek bo hemû sîmayên hevbeş û cîyawaz ên di nav deqan da hene xuya bike. Ew pîverên di deqî da têne bikaranîn piştbestinê li ser çar faktoran dikin. Ew jî: Faktorên zimanî, faktorên derûnî, faktorên civakî û faktorên mêjîyî ne (Şoreşvan Adil, 2012: 57) . Wekî ku dîyar e di pênaseyên deqî da gelek pîverên deqî hatine behslêkirin, ji wan pênaseyên amaje bi yek ji pîverên deqî kirî ew jî Dîbugrand û Dirêsler dema gotî: Deq rûdaneka gihandinê ye. Li gorî boçûna Dîbugrandî heta nivîsîn bibe deq, divê heft pîveran bi cih binê. Ew jî :

#### 1.2.1. Likandin

Pabendbûna deqî bi yasayên lêksîkî, rêzimanî û pêkhateyên peyvsazî bi rêya peywendîyên asoyî, bi wateyeka dî em dikarin bibêjin: rêkeftina yekeyên biçûk e di nav deqî da, wekî peyv digel peyveka dî bo yekeyeka ji xwe mezintir wekî girê û riste li gorî yasayên rêzimanê bi şêweyekî asoyî ev peywendî tê rêxistin. (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2015: 96). Anko likandin komeka peywendîyên dirkandî ye di navbera beşên deqî da. Ev beş bi hev ra tên girêdan û yek ya dî digire û bi awayekî eger ev likandin nema, deq dê bê jêkvekirin. Likandin xwedî erkeka giring e di kiryara gihandinê da. Likandin ya

taybet e  bi rûyê serve yê deqî  û pêk hatiye  ji komeka rêya  yên xesleta berdewamîyê didin rûyê serve. Ku wate ew rûdanên zimanî ne yên di rêzbendîyaka demî da em di dirikênin yan me guh lê dibe yên têne dîtin li ser laperekê. Ev rûdan bi şêweyekî  taybet li dû binemayên rêzimanê  digel hev li ser asta asoyê têne rêxistin. Ev çend dibe di nav risteyê bi xwe dabe yan di navbera risteyan da yan parçeyekî da yan di navbera parçeyan da yan di her cihekî deqî da be (Şoreşvan Adil, 2012 : 90).

Li dev zanayên deqnasîyê likandin giringtirîn pîvera deqî ye, çunke regezeka cewherî ye di avakirin û şirovekirina deqî da. Eger likandin di axivtin  û nivîsînê da nebe dê şûlî û mijdar be, giringîya wê di wê çendê daye axivtinê ron dike û şûlîtîyê nahêle û risteyan pêkve girê dide û deqî pêkve girê dide ku axivtineka mifadar û yekgirtî berhem tine ( Hisam Ehmed Ferec, 2007 : 83). Herwisa roleka giring di rêxistina binyata pêzanînan da  di nava deqî da dibîne û berdewamîyê dide rûdanên deqî ku dibine harîkar bo xwendevanî û pirkirina boşayî yên deqî. Herwisa giringîya likandinê dîyar dibe ku her risteyekê hindek  şêwênên girêdanê hene bi risteyên berî û piştî wê ve têne girêdan û nivîsînê dikine yek parçe û deqî berhem tînin . Anko likandinê  roleka berçav heye di girêdana parçeyên deqî û berhemanîna yekeyeka wateyê ya serbixwe.

### 1.2.2.Vehandin

Pêkvegirêdana deqî ne bi tenê bi rêya likandinê bi dest ve tê belku ji yasayên rêzimanî û lêksîkî û fonolojî dibore û derbazî astên bilindtir diçe wekî watesazî û pragmatîk, her nivîsîneka vehandin tê da nebe nikare bi erka gihandinê rabe yan nikare wê nameya merem jê  bigêhîne xwendevanî. Çunke deq li wê demê yekgirtî ye. Eger xwendevan bi asanî bikare ji risteyekê berev risteyeka dî biçe û deqî  wekî yekûyek bixwîne, ne wek komeka risteyên jêkcuda. Ku vehandin pêk hatiye  ji çawanîya şiyanan dide xwendevanî û ji bo zanîna wateyê  ew ji rêxistina deqî peyda dibe, wate deq bi vehandinê dibe yekeyeka gihandinê ya yekgirtî (Şoreşvan Adil, 2012 : 110).

Vehandin girêdayî bi wan peywendîyên wateyê ve ye, wê rêyê didin têgîhiştina deqî, ev peywendîyên wateyê  ruxsar û yekgirtinê didin deqî. Çunke yekgirtina wî bi dest ve nahê, eger  berçav wergirtina binyata wateyê nebe, rêyên  rûnanên likandinê

rêxweşker in bo wergirî ji bo zanîna çawanîya avakirina binyata wateyê di deqî da, ev hindê digêhîne ku vehandin girê daye bi likandina wateyê ve li ser asta rûyê ji nav da derdikeve û ew likandinên di navbera pêkhateyan da li ser asta rûyê serve dîyar dike. Ku wate, vehandin di deqî da binyata rûyê ji nav da yê wateyê û amrazên likandinê rûyê serve ne (Adil, 110). Anko vehandin peywendîya deqî bi xwe ve digire ji layê hizr û wateyê ve, ku wate peywendîya çemkan di navbera peyv û risteyan da digire, divêt peywendîyeka temam bi deqî ve hebe, bi hev ra girêdana van peywendîyan ji çend alîyan ve xuya dibe :

1- Binemayên lojîkî: Wekî hoyên (sedem) giştî û taybet,
2- Zanyarî derbareyî rêxistina rûdan, kar, babet û helwestan,
3- Hewldan bo mukimkirinê bi rêya serborîyên mirovayetîyê. (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2015 : 96).

Vehandin binemayekî herî giring ya avakirina deqî ye. Taybetî di deqê edebî da, vehandin anko hunera pêkvegirêdana rûdanan bi awayekî hostakarî û rêxistina parçeyên cuda cuda di nava deqî da, ku hemû pêkve wênekeyekî xuya bike, wekî parçeyên leşî (pê, dest, çav, ser û hwd.) hemû bi hev ra parçeyeka mezintir dirust dikin ku mirov e, bi vî rengî vehandin binemayê yekparçebûna deqî ye ku yekeyeka wateya yekgirtî dide xwendevanî. Anko mirov dikare bibêje: Vehandin huner, şarezayî û zanist e. Eger deq li ser binyateka rêkûpêk nehê vehandin û ristin dê wateyeka şûlî û aloz bide û peyam bi dirustî nagihê xwendevanê deqî. Herwisa zanayên zimanî giringîyeka zor daye vehandinê dîyar dikin ku vehandin pêk hatiye ji taybetmendîyeka wateya deqî û piştbestinê li ser hemû risteyên pêkanînên deqî dike û dirustkirina peywendîya di navbera risteyan da dibe egera têgêhîştina hemû risteyên deqî (Selah Feysel, 1992: 340). Anko vehandin bi rêya amrazên likandinê di nav baristeyan û parçeyên deqî da tê encamdan, di asta peyvsazî û ristesazîyê bi xwe ve digire, herwiha ji alîyê wate û pêkvegirêdana bîrokeyên deqî û hizrên sereke û layekî bi xwe ve digire. Bi awayekî giştî divêt vehandin hemû parçeyên deqî pêkve girê bide û yekêtîya babetê biafirîne û peyameka yekgirtî û temam pêşkêşî xwendevanî bike, ta ku bi deq bê hejmartin.

### 1.2.3. Mebest

Mebestayetî anko merema danerê deqî bo pêkanîna deqekî likandî û vehandî, di wateyeka berfirehtir da mebestayetî amaje ye bo rêyên danerê deqî bi cih tîne ji bo bikaranîna deqî bo bidestveanîna meremên xwe. Girays têgihê mebestayetî dîyar dike ku, her rûdanek çi ya zimanî be yan ne zimanî, xwedîyê nîyeteka wateyî be yan ne xwedîyê înyeteka wateyê be. Bo mînak,  ewr nîşana baranê ne, sorbûn anko şermkirin, ev her du kiryar xwedî wate ne, lê belê çi mebest li pişt nînin. Lê belê eger tu bibêjiye kesekî, “Bixwîne!” yan “Dergehî bigire!” mebesteka kontrolê li ser dike (Şoreşvan Adil, 2012: 60- 70 ). Dibe her kirdeyeka axivtinê pitir ji mebestekê li pişt be. Bo mînak; “Dergehî bigire!” Eger em vê risteyê bêxine di nav dewrûberekî da, dê gelek mebest û raman jê biçin. Dibe mebesta axivtinkerî ji girtina dergehî, “Dinya sar e.”, “Deng tên.” yan jî “Da kes me nebîne.” û hwd. Anko mebestayetî hatiye dîyarkirin ku ew tiştê danerê deqî bi rêya derbirînê bigêhîne wî yê armanc jê heye (Seîd Hesen Behrî, 2004: 146), yan pêkhatiye  ji helwestê danerê deqî  ji çêkirina wêneyekî ji wêneyên zimanî, mebest jê deqekî xwedî likandin û vehandin, bi planeka destnîşankirî û bo gehîştina mebesteka taybet, mebesta deqî ne bi tenê di wateya di nav deqî da ye, belku pêk hatiye  ji niyeta danerê deqî ku vê wateyê bigêhîne wergirî. Ev mebest dibe veşartî bibin yan aşkera bibin, mebesta aşkira ew e ya ku bi wate yekser bi peyv û risteyan ve tê girêdan. Lê belê mebesta veşartî bi merem bikaranîna karekî ve tê girêdan. Wekî amajeyeka dîyar bo kiryarên axivtinê. Em dikarin bibêjin ev çend girêdayî bi danerê deqî ve, ka mebest û armancên wî ji deqî çi ne. Divêt hemû rûdanên deqî  temamkerên hevdu bin bo berhemanîna deqî (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2015: 97). Herwisa em dikarin mebestê, dabeşî du cûreyan bikin. Ew jî, mebesta yekser û mebesta neyekser in. Firêker dikare bi rêya karê daxwazî mebesta rastew xwe bigêhîne. Herwisa bi rêya derencam yan ragihandinê mebesta neyekser bigêhîne. Bo mînak:

1- “ Pêyên xwe paqij bike. ”
   Di rêjeya karê daxwazî da bi şêweyekî yekser hatiye arastekirin ku pêwist e tu pêyên xwe paqij bikî.
2- “ Min nuke (niha) jûr paqij kir.”

Merem hatiye arastekirin bi şêweyekî neyekser, ku pêwîst e li ser guhdarî pêyên xwe paqij bike, çunke pêyên te di pîs in, ew jûra min paqij kirî dê pîs bikî (Hisan Ehmed Ferec, 2009 : 49 ). Ku wate li vir dewrûberî yan barê axivtinê roleka berçav heye di zelalkirina axivtinê da ji derencamê şêwazên kirdeyên axivtinê tem û mijdarî û şûlîyatî dikeve axivtinê da bo vê çendê û dîyarkirina merema axivtinkerî pragmatîk roleka giring dibîne di zelalkirin û dîyarkirina mebestên neyekser da. Bo mînak; “Dergehî bigire.” Wateyeka yekser wate semantîk, eger firêker bibêje: “Ba tê.” li vir diçe di sinorê pragmatîkê da bi alîkarîya dewrûberî dê bizanî mebesta firêkerî girtina dergehî ye. Anko pragmatîk tiştek e ji derveyîî zimanî bi pêçewanîya semantîkê ku semantîk wateya peyvê xuya dike û pragmatîk mebesta firêkerî.

### 1.2.4. Pesendkirin

Ev pîver bi şêweyekî giştî li dû helwestê wergirî hatiye dîyarkirin. Anko pesendayetî pêk hatiye ji helwestê wergirî ji bo pesendikirin û nepesendkirina deqî, yan helwestê wergirê deqî bi xwe ve digire ji bo dirustkirina wêneyekî ji wêneyên zimanî yên pesendkirî ji layê ku deqekî xwedî vehandin û likandî ye. Anko girê daye bi komela wateyên deq pêşkêş dike bi mercê likandin û vehandinê (Şoreşvan Adil, 2012: 66- 67 ). Ev çend girê daye bi xwendevanê deqî ve û helwestên wî beramberî deqî, aya ev deq ji layê xwendevanî ve dê bê pesendikirin yan ne? Ev çend jî li ser rê û pêkiya deqî, guncandin û pêkvegirêdana keresteyan dimîne ka ta çi radeyê dahênerê deqî şiyaye wan keresteyan bi şêweyekî hostakarî û hunerî bixe ber yek, ku bibe cihê sûdwergirtin û çêjwergirtinê (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2015 : 97). Anko xwendevanê deqî beşdarî avakirina deqî dibe û wî sê kuçikî temam dike ew pêkhatî ji danerî, deqî, wergirî. Anko eger wergir, deqî pesend neke li wê demê nahê wergirtin wekî deqî. Çunke mercên deqbûnê cî bi cî nekirine. Taybetî likandin û vehandin ku ev jî girêdayî yasayên rêzimanî û guncandina peyvê ne bi awayekî hostakarî. Eger vehandin û likandin li gorî rêzimanê pêkvegirêdaneka dirust hebe û wateyeka yekgirtî û temam da wergirî, bêguman dê bê pesendikirin. Anko pesendayetî girêdayî bi helwesta wergirî ve wê dîyar dike ku ta çi radeyê firêkerî deqekî likandî û vehandî berhem anîye (Seîd Hesen Behrî, 2004: 127). Anko vehandin û likandin du binemayên sereke ne bo pesendayetîya deqî. Herwisa

pesendayetî girêdayî ye bi çêker û wergirê deqî ve. Lê belê ew kawdanên girêdayî pê ve roleka giring digirin wek dewrûber yan helwestên zimanî û nezimanî. Çunke ew in yên harîkar (alîkar) li ser dana biryara pesendkirinê yan pesendnekirinê, bi rêya komeka yasayên desthilatdar yên Conlaynzî amaje danîyê di teorîya dewrûberî da, li dev wî dîyar dike, ku riste ne temam in ji layê wateyê ve, eger li dû yasayên rêzimanî nehên darêtin û girêdana peyv û risteyan li berçav nehê wergirtin takekes pesend nake di dema şirovekirin û helsengandinê da (Ehmed Mixtar Emir, 1998: 77). Anko ew dewrûberê dibe egerê pesendayetîyê divêt van xalan berçav wergire:

1- Yasayên rêzimanê, ku li asta peyvsazî û ristesazîyê bi xwe ve digire,
2- Rêkeftin û pêkvegirêdana risteyan.

Bi vî rengî dê bigêhe encameka pêdivî bo pesendkirina wergirî, her ev e dîyar dike, ku pesendkirinê li ser asta risteyê û asta deqî bi dest ve binê. Le belê di risteyê da pêş dikeve. Çunke riste destpêkê tê li ser asta pêkvegirêdanê û yasayên rêzimanê û paşî wateya deqî tê ya pêkve likandî û vehandî (Şoreşvan Adil, 2012: 69). Wate pesendî biryareka li gorî yasa û rêsayên şirovekirinê û ew pîver û binemayên deqî li ser tê avakirin tê dan, pesendkirin yek ji binemayên giring e ku deqî ji nedeqî cuda bike. Wate, hemû deq nivîsîn in, lê belê hemû nivîsîn ne deq in.

### 1.2.5. Ragihandin

Ragihandin birîtî ye ji wê prosêsa alûgorkirina pêzanîn, hest, hizir, bîr û boçûnan di navbera mirovan da. Îca ew gihandine zimanî bi wate, bi rêya zimanê gotin û nivîsînê be yan nezimanî be, ev gihandin jî birîtî ye ji zimanê amajeyê û derbirîna ser û çavan (Şêrzad Sebrî, 2014: 118). Ku gihandina pêzanînên deqî bi rêya nivîsînê têne bercestekirin. Gihandina deqî wan zanyarîyan bi xwe ve digire yên deq pêşkêşî xwendevanî dike ji layê çendî û çendayetîyê ve. Giringîya ragihandinê bo hindê dizîvire ku proseseka derûnî û civakî ye, arezûya mirovî di gihandinê da bi cih tê, ji bo cîbicîkirina armanca xwe (Ebdalwahîd Mişîr Dizeyî, 2015: 97). Haruld Laswîl dibêje: Prosesa gihandinê birîtî ye ji vekolîna axivtinker, guhdar û gotinê yan peyam, rê û pêkîya karîgerîya gotinê û ev diçe bin bikaranîna zimanî û mebestê da, ew jî dema

vekolîn li ziman û peywendîya wî bi deq û wergirî ve tê kirin. Herwisa gihandin û pragmatîkê peywendîyeka bihêz bi hevdu ve heye. Çunke ev her du zanist vekolînê li prosesa gihandin û binemayên wê dikin, rêvebirina prosesa gihandinê bi kêmî ve girêdayî dû binemayan e, ew jî axivtinker û guhdar e (Şêrzad Sebrî ,2014: 118 - 119 ). Anko gihandin mebesta firêkerî digêhîne û wergir jî dixe di nav şirovekirinên cuda da ji bo zanîna mebest û merema firêkerî.

Ragihandinayetî pêk hatiye ji radeya pêşkêşkirina rûdanên pêşkêşkirî di deqî da beramber ne pêşkêşkirina wan yan yên dîyar beramber yên nedîyar. Anko ev pîver girêdayî ye bi pêzanînên deqî da tên ji layê pêşkêşkirina wan yan ne pêşkêşkirina wan ve, ev jî tiştekî rêjeyî û cîyawaz e li dû cîyawazîya wergirî û kiryarên wergirtina wî bo deqî û li gel hişyarî û berçav wergirtinê ku nebin egerê metirsîyê li ser gihandinê, dibe lawazîya ragihandinayetîyê bi şêweyekî taybet bibe egerê dudilî û bêzarî û dûr nîne bibe egerê redkirina deqî jî. Anko ragihandinayetî faktoreka karîger e bo nedana hukmekî vebirî li ser rûdanên deqî yan rûdana di cîhana deqî da li beramber pêkguherînên şiyanan da. Çunke ragihandinayetî ne bi tenê pêk hatiye ji wan pêzanînên deq bi xwe ve digire, belku pêk hatiye ji rijdîya van pêzanîn, cûrecûrîya wan (Şoreşvan Adil, 2012: 74). Anko pêdivî ye her deqek ragihandinekê pêşkêş bike, da ku heza nivîserî bi cih bîne, ku meremeka sereke ya nivîserî ye, ew hizra her deq pêşkêş dike hevrikîyeka beramberî hizr û rêbazên pêçewan (berûvajî) e, li vê derê rol û giringîya ragihandinayetîyê dîyar dibe di gihandin û belavkirina bîr û boçûnên firêkerî da yên bi rêya deqî pêşkêş kirin bo wergirî. Herwisa zanista gihandinê giringîyê bi wan regezan dide yên beşdarîyê di encamdana zimanî da dikin ji pêxemet kontrolkirina wan binemayên beşdarîyê di serkeftina prosesa gihandinê da dike bo dîyarkirina mebesta axivtinkerî (Şêrzad Sebrî, 2014: 121). Bi şêweyekî giştî ev pîver li ser naverok û girêdana di navbera rûdanên deqî da tê pratîkkirin. Herwisa giringîya gihandinê bo hindê dizîvire ku proseseka derûnî û civakî ye, arezûya mirovî di gihandinê da bi cih tê ji bo cîbicîkirina armanca kesî.

### 1.2.6. Helwest

Helwest yek e ji pîverên deqî û pêk hatiye ji wan faktorên deqî yên ku deqî bi barekî ve girê dide û şiyan daye bê zîvirandin bo dewrûberî, barêtî (rewş) hemû alavên deqî yên merema deqî û wateyê dîyar dikin bi xwe ve digire. Herwisa hatiye girêdan bi egerê deq ji berhatiye berhemanîn li dû barî, çunke ew eger merema deqî ron dike, ev pîver girêdayî bi dewrûberê bar û civakê deqî ve, divêt deq arastekirî be bi şêweyekî guncav digel doxekî dîyarkirî bi merema vedîtina wê yan guherîna wê û dibe ew barê deq hildigire yekser be ku di şiyan daye bi şêweyekî asanî hest pê bê kirin yan ne yekser divêt bê şirovekirin Ev alav pêdivî hebûna firêkerî û wergirî ye (Şoreşvan Adil , 2012: 77- 78 ). Bo mînak :

- **Hişyar be! Zarok li ser cadeyê ne.**

Ev bar amajeyê dide lafîteyeka (lewha) ku li ser cadeyê hatiye danan digel hebûna tîrekî arastekirî bo yek ji cadeyên lawekî, ji vê lafîtê tê têgihîştin ku hindek zarok nêzîkî wê cadeyê yarîyan dikin yan qutabxaneyeka (xwendegeheka) zarokan li wir dibe yek bê ser cadeyê, mebest jê ragihandina şoferî ye ku pêdivî ye lezatîyê kêm bike ji bo parastina zarokan ji metirsîya lêdanê. Anko helwest li ser binemayê wê yekê tê danan ka heta çi radeyê deq guncav e digel pêdivîya xwendevanî û dewrûberê giştî. Em dikarin bibêjin: Ev binema taybet e bi rûdanan ve û wisa deqî dike ku peywendîyeka mikum bi helwestan ve hebe. Ev giringtirîn binema ye; çunke deqî dixe çarçoveya gihandinê da (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2015: 97). Bi şêweyekî giştî helwest navekî giştî ye bo faktorên girêdanekê di navbera deq û barê rûdanekê da peyda dikin çi barekî nûke be yan barek be di şiyan da be bê zîvirandin, kêm caran kartêkirinên barî dewrûberekî destnîşankirî bi cih tên bê peydabûna helwestekê. Anko radeya hilgirtina kesî bo hizr û bîrên xwe û armancên taybet ên mînakya ew hildisengîne bo barê gihandê yê nûke. Helwest hemû alavên deqî yên merema deqî wateya wî dîyar dikin bi xwe ve digire û hatiye girêdan bi egerê deq ji ber hatiye berhemanîn li dû barî. Çunke ew eger mebesta deqî ron dike, anko girê daye bi barî ve û mebesta berhemanîna deqî ve (Şoreşvan Adil, 2012: 78). Ku wate, helwest di dem û cîyekî destnîşankirî da tê bicîanîn

taybetî li ser deqên siyasî û aborî ku yekser girêdayî jîyana xelkî ne. Her deqek ji wan bê arastekirin ne di berjewendîya giştî da be dê rengvedana wî deqî di nav komelgehê da xuya be û dê tûşî helwestên cemawerî yên cûrbicûr be. Bo mînak gelek cara berpirsekî welatî di nav torên komelayetîyê da, dê kumêntekê binivîse ne di xizmeta xelkî da be dê rastî çendîn rexneyan be ji layê hevwelatîyan ve. Anko her karekî dê karvedan hebin, îca çi ew helwest rexnegirtin be yan destxweşî lêkirin be.

### 1.2.7. Hevdeqî

Hevdeqî ji zaravayê întertextule hatiye wergirtin, ku ji du peyvan pêk tê. Ew jî înter, bi wate çûna jûr û textule, bi ramana deqî tê; anko çûna di nav deqî da (Şoreşvan Adil, 2012: 82). Zaravayê hevdeqî vedigere bo feylesof û nivîserê rûsî Mîkaîl Baxtîn, bo yekem car di pirtûka "Markîsyet û Felsefeya Zimanî" da ji layê teorî behsa binyata têkilîya di navbera deqan da dike û cextê li ser guftûgoyê dike û herwiha yekem kes e ku gotarê ji layê zimanvanîyê ve dabeşî sê cûreyan dike (yekser, neyekser, yekserya azad) (Rêzan Salih, Senger Nazim, 2017: 128). Di mêjûya rexneya edebî da zaravayê hevdeqîyê tiştekî nû ye. Mêjûya vî zaravayî wek zanist bo naverasta salên şêstan vedigere, ku di vekolînên cuda da rexnegir Culîya Kristîva di kovarên Kîl û Grîtik da li Fransayê belav kirine. Herwiha diktor Şica Elanî dibêje: Şiklovskî yekem kes bû amaje bi hevdeqîyê kirî dema gotî "Berhema hunerî bi peywendîyê digel berhemên dî yên hunerî berceste dibe" (hitt:\\xedeng.com). Wate hevdeqî ji encamê tevlihevîya deqan dirust dibe.

Bi şêweyekî giştî di nav rexnegir û zimanvanan da gelek pênase bo hevdeqî hatinekirin. Belê, hemû karlêkirin, peywendî, pêkvegirêdan, dinavyekdaçûna rêzimanî û wateyê di navbera deqekî û hindek deqên hevdem yan berî wî dîyar dikin ku deqî vekolîn li ser hatine kirin û mifa jê wergirtî ye. Wisa hevdeqî pêk hatiye ji kiryara pêkguherînê ji hindek deqên dîtir (Şoreşvan Adil, 2012: 82). Anko ev binema dakokîyê li ser hevgirtin û têkilîya deqan dike bo sûdwergirtin ji rabirdûyê, ku wate mebest pê ew geş û hewa ye, ku deq tê da hevdu digirin. Lewma li ser xwendevanî giring e agahî ji wan deqan hebe yên borî û yên hevdem in digel wî. Ku hevdeqî çendîn rûyan bi xwe ve

digire wekî deqên borî û deqên niha cîgirtina deqî û dewrûber û wergir, (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2015: 101). Herwiha Rolan Bart amajeyê pê dide û dibêje: Her deqekî nû tevnekî nû ji hindek wergirtina deqên berê dîyar dike, ku hevdeqî di navbera deqekî û çend deqên berî wî da peyda dibe û pêk hatiye ji gotinên veşartî û amaje û rengvedanên zimanên dîtir û rewşenbîrên cîyawaz. Anko her deqek tevnek e ji wergirtin û amaje û rengvedanê (Rolan Bart, 1993: 63). Herwiha di pênaseyeka dî da hatiye hevdeqî birîtî ye ji hindê ku deqek, deqekî yan hindek deqan yan hizrên berî xwe bi rêya wergirtinê yan amajedana navgirtinê di nav xwe da digire. Bi vê çendê ev deq têkilî deqê resen dibe û di nav da diçe xwarê. Ta ku deqekî nû peyda dibe (Ehmed El Ze'ebî, 2000 : 11). Herwiha Rîkur dibêje: Çi deq bê veguhestin nîne û erka xwendinê dê ravekirina wan bûyeran be yên hatine veguhestin. Rîkor azadîyê dide qelemê xwe ku li dû peywendîyên di navbera deq û deqî da bikeve û dibe egerê peydabûna hevdeqîyê, her wekî zana dibêjin. Li jêr fişara hizrên xwendingeha şirovekirina derûnî bi şêwirmendîya Firoydî, li destpêka çerxa bîstê, Blomî dubare mêjûya edebî nivîsî û di çarçoveya girêya derûnî da. Bi dîtina wî helbestvan ji karîgerî û tirsa helbestvanekî binavûdeng ku berî wî helbest nivîsîbûn, wê ku xelk pê ve hatibûne girêdan û karîgerîya xwe li ser wan kiribû. Lewra hewl didin ku helbestê binivîsin da ji wê karîgerîyê rizgar bin û hevrikîya wî bikin yan bidin alîyekî û cihê wî bigirin. Bi vê dîtinê em dikarin bibêjin ku hemû helbest dubare nivîsîna helbestên berê van helbestan e. Ji ber ku hevdeqî di rastîya xwe da û di çarçoveya dîtinên taybet da, komeleka alavan e ji bo berhemanîna nivîsîna her deqekî û bi rêya kartêkirina deqên berî van deqan hatin nivîsîn yan yên digel hevdem (hitt:\\xedeng.com). Herwiha Mark Encînu dibêje: Her deqek bi rêyekê ji rêyan digel deqekî dî dijî, wisa dibe deqek di deqekî da. Herwisa têgeha wate hevdeqîyê pêk hatiye ji birîn û karlêkirinê di navbera deqên cîyawaz da ji bo peydakirina deqekî nû yê xwedî rehendên wateyê û derbirînên cuda, herwisa Rubrit Şliz dupat dike ku wate hevdeqî ji vekolerekî bo yekî dî tê guherîn, lê belê binemayê giştî tê da ew e ku deqek amajeyê dide deqekî dîtir (Şoreşvan Adil, 2012: 83).

Herwisa Dr. Moherr Miftah dibêje : Van pênaseyan neşiyan pênaseyeka yekgirtî derbareyî hevdeqîyê bikin. Berî Colya Kristîvanê, Baxtîn di hindek nivîsînên xwe da

amaje bi vê têgehê dabû. Lê bi şêweyekî dî li dema hewl daye çareserîya forma dîyalogê bike, ku bi dîtina wî, babeteka axivtinê çêdibe. Ev babet pêştir bi şêweyekî ji şêweyan hatiye azirandin. Bi dîtina Tudurofî hevdeqî bi boçûna Baxtînî giringîyeka gewherî di hemû gotar, hevpeyvîna rojane, yasa, ayîn û zanistên mirovayetî da heye. Anko berhemên edebî li ser berhemên dî yên edebî tên avakirin û ji çi keresteyên dî yên needebî nahên avakirin. Bi dîtina wî, her wekî Tîrî Eygiltin amaje bo dike, zivirîneka girtî ye di jîngeha deqan da. Ev pênase yan ev têgeh bo hevdeqîyê me pal dide ku wisa serederîyê bikin ku hevdeqî di mêjûya edebî da dîyardeyeka kevn e yan bi wateyeka dî hevdeq bûye yasayeka siruştî ku çi deq li paşerojê jî jê rizgar nabin û yek e ji mercên berhemanîn edebî ku em dê zaravayê hevdeqîyê pê bibexşin (hitt:\\xedeng.com). Dr. Ebdulmelik Mirtaz hevdeqîyê pênase dike û dibêje: Alûgor û peywendîya di navbera deqan da û edeba erebî ev hizr e yan ev kar e wek dizîya edebî bi nav kiriye. Hevdeqî bi dîtina wî peydabûna peywendîya kartêkirinê ye di navbera deqekî amade û deqekî pêştir ji bo berhemînana berhemeka nû (hitt:\\www.m.Aherar.org). Herwiha rexneya hevçerx bi tenê li ser zaravayê nû û dîyardeya kevnarîyê ranewesta. Lê belê kar ji bo hindê kir, ku pêngaveka zanistî biavêjin ji bo pênasandina hevdeqîyê wek metodek yan rêbaz e ku alavên xwe yên şirovekirinê hebe da alîkarîya rexnegir û xwendevanî bike, ji bo çûna di nav naveroka deqan da. Bi dîtina hindek rexnegiran, hevdeqî kilîla xwendina deqan e, ji bo têgihîştin, şirovekirin, helweşandin û dubare avakirin û berhemanîna gotareka nû.

Rexnegirên hevçerx pêdagirîyê li ser dahênanê di hevdeqîyê da dikin û dahênan merc e bo hevdeqîyê. Çunke ji bê agahîya dahênerî dest pê dike. Li dû dîtina xwendgeha şirovekirina derûnî ku rijdîyê li wê çendê dike ku dahênan berhemê bê agahîya mirovî ye, di vê derbareyê da saxletê dahênanê ji hevdeqîya bi hişyarî bi xwe ve nagire û bi tenê dahênan hevdeqîya nehişî vedigire. Eger em hemû deqan bi hevdeq li qelemî bidin, her wekî piranîya vekoleran dibêjin, pirsyarek peyda dibe, ew jî: Erê edeb hemû yan hemû tekst tên hejmartin dahênan? Bi dîtina piranîya rexnegiran, dahênan yan resenayetî ne di afrandina hizrên nû da ye, lê belê dahênan di girêdana di navbera hizrên kevn, nû, rastvekirin û pêşxistina hizran da ye ji çarçoveyeka kevn bo arasteyeka nû û mifadar. Dahênan bi dîtina Landî ew e ku mirov keresteyekê berhem bîne ku bi şêweyê xwe nû

be û merc nîne ku pêkhateyên wî berî niha hebin (hitt:\\xedeng.com). Anko mirov dikare bibêje: Hevdeqî hemû deqan bi xwe ve digire, her deqek hevdeq e, ji ber ku deqê nû li ser têgihîştin, lêkçiwandin û veguhestina deqên kevntir tê avakirin, herwisa deq nikare xwe ji pirsa xwendin û nivîsînê rizgar bike, ku jêderê berhemhênana deqî ye û peywendîya deqê nû bi yên kevn ve û kartêkirina wan deqan  destnîşan dike û em nikarin  siruştê vê peywendîyê bê hevdeqî dîyar bikin. Bi dîtina Tudurofî ji wan kiryarên pêdivî ku mirov li dema xwendina her deqekî encamê bide, amadebûn yan ne amadebûna veguhestina deqî pêştir, ji ber ku ev cûre kiryar alîkarîya me bo kontrolkirina xwendinê dike û proseyên  di nav tevnê deqî  da nahên piştguhxistin. Veguhestin teknîkeka di pêkhateya deqê nû da berceste dibe û ev teknîk li dû kiryarên nivîserî berçav dibe. Bi şêweyekî giştî ev hemû pênase ye li ser yek xal hevrabûn, ew xal jî girêdayî berhemanîna deqî û peywendîya deqan bi deqên  pêştir ve ji bo avakirina deqekî nû çi bi awayekî yekser yan neyekser.

### 1.2.7.1. Cûreyên Hevdeqîyê

Hev deqî bi wê wateyê tê ku deqek di hindrê xwe da çend deqên dî hel digire.Bi şêweyekî giştî hevdeqî dibin du cure :

#### 1.2.7.1.1. Hevdeqîya Yekser

Ew e ku deq bi heman zimanê pê hatiye  nivîsîn yan afirandin bê wergirtin yan navgirtin bo mînak ayetên Qurana Pîroz yan fermûdeyên pêxemberî (s.X.l.), hozan, çîrok û hwd. (Şêrzad Sebrî, 2014: 143). Bi wateyeka dî pêk hatiye  ji birîna  parçeyekî ji deqekî û danana wê di deqekî nû da, ku bi şêweyekî wisa guncav be digel helwesta gihandinê ya nû û babeta deqî bigunce.

#### 1.2.7.1.2. Hevdeqîya Neyekser

Derxistina ramanên veşartî û winda ji  deqekî bo nav deqekî dî, anko pêkatî ye ji înana hizran ji deqekî yan ji bîrdanka mêjûyê ew a  bi giyan û wate xwe hevdeqîyê peyda dike ne bi form û zimanê xwe, belku bi rêya amaje, livîn, kod, û hêmayên deqî têne zanîn. Hevdeqî ne kiryareka sade ye bi rêya wê  di şiyan daye karê berê  ji karê nû

bê cudakirin. Çunke deq dikeve bin karê avakirinê, anko yekeya dubarekirî ne wekî xwe ye, belku diçe nav tevnê deqî da dibe xwedî wateyên girêdayî bi deqî û dewrûberê berhemanînê da (Sebrî, 88). Ku wate em dişên bibêjin hevdeqîya yekser erk e ku veguhestin tê da berçav dibe, lê belê hevdeqîya neyekser bi şêweyê herêmekî ye, ku veguhestin tê da berçav nabe.

Ku wate ev pîverên Dîbugrandî bo avakirina deqî dan xuyakirin, pîverên giştî û hemû layen in û nasnameya deqînî pêk tînin û sinorî di navbera deq û nadeqî da dikêşin. Ev pîver hemû cemser û xasiyetên girêdayî bi deqî bi xwe ve digire. Rehendên derekî yên deqî û prosesa berhemanîna deqî û ast û binyata pêkhateya deqî û karîgerîya dewrûberî li ser deqî, ev pîver bi şêweyekî giştî deqekî bi rêk û pêk berhem tîne. Em dikarin van heft pîveran li ser sê astan parve bikin:

1- Asta yekê wan pîveran bi xwe ve digire ku girêdayî xwedîyê deqî ne ew jî likandin û vehandin e, ku peywendîya asoyî bi xwe ve digire. Wekî: Yasayên ferhengî, rêzimanî, peyvsazî û bo dirustkirina peyvên lêkdayî û girê û risteyên rêzimanê, herwisa pêwîstbûna deqî bi binemayên wateyê, wekî nasname, naveroka deqî, zanyarî û parastina binemayên lojîkî.

2- Asta duyê pîverê (mebest û pesend) bi xwe ve digire, ku ji bazneyê ji nav da deqî dûr dikevin, berev armanca berhemîna deqî ve diçin, herwekî Mîkaîl Baxtin dibêje: Deq bi rêya dû hokarên giring di be deq, ew jî: Mebest û bicihanîna mebestê ye. Ev her du layan bi şêweyekî yekser kartêkirinê li hevdu dikin û ev çend jî rengvedanê li ser prosesa deqî dike. Herwisa pîvera pesendayetî girê daye bi wergirî ve. Wate li ser helwestê wergirî yan xwendevanî dimîne li dema xwendinê û hokar û rêjeya kartêkirinê li ser xwendevanî û têkilbûna wî digel deqî û hizr û bîr û boçûnên wergirî li ser deqî, deqênî yan nedeqênî dê biselimîne.

3- Asta sêyê pîverên ragihandin, helwest û hevdeqîyê bi xwe ve digire. Her yek ji wan ji çendîn rehendên girêdayî siruştê deqî pêk tên. Ragihandin rêjeya wan zanyarîyên dîyarkirî yên deqî dide xwendevanî û çawanîya bercestebûnîya zanyarî ya di deqî da, pîverê helwestî jî li ser binemayê guncavdina deqî digel barûdox û pêdivîyên

xwendevan û serdema xwendevanî radiweste. Herwisa erka deqî û peywendîyên deqî bi rûdanên di nav komelgehê ve û digel babeta wergirtin û yekgirtina deqên berî xwe di deqekî dî da, bi hevdeqîyê tê binavkirin. Bi dîtina min merc nîne her deqek van pîveran hemûyan bi cih bîne bo deqbûnê. Kêmî û zêdehîya pîveran li dû deqî dimîne.

### 1.3. Ruxsar û Naveroka Deqî

Hêma (sign) dabeşî ser du beşan dibe ew jî, form-Signifier û wate –Signified. Form di zimanî da peyv e, bi dîtina Dî Susêrî (1857- 1913) peyv ji du regezan pêk tê: Yek: Wêneyê dengî - Sound image ev wêneyê dengî ji “dal”ê pêk tê, ku şêweyê komkirin û derbirîna peyvan e. Du: Çemk û wate ku ji “medlul”ê pêk tê û medlul jî niwandina hêmayê dike (Selam Xoşnaw, 2005: 35).

Form û wate di nava zimanvanîyê da peywendî û girêdaneka bi hêz û mukim bi yekûdu ve heye û her yek bi ya duyê girêdaye. Eger bi çavekî akademîk û lêkdaneka zanistî temaşeyî bikine “ruxsar û naverokê” dê bibînin peywendîyeka tund di navbera wan da heye, bi hîç şêweyekî dirust nîne hewla cudakirina wan bê dan. Çunke herdu çemk temamkerên hevdû ne (Çinar Sedîq Xazî, 2008: 15). Anko hizirkirin di her yek ji wan da daxwaza ya dî dike û çi form nabe form eger wate nebe û çi axivtin jî li ser wateyê nabe eger form nebe. Form bê wate bi tenê wekî tiştekî bêbiha tê hejmartin. Wate jî bê form nahê hizirkirn û bi cih anîn. Ji ber wê pêkvegirêdana bihêz ew di navbera ruxsar û naverokê di heye. Dî Susêr dibêje: Ew peywendîya di navbera form û wateyê da heye wekî her du rûyên pareyekî kaxizê ye ku nahên jêk cudakirin (Şêrzad Elî Sebrî, 2011: 18). Ku wate deq ji du binemayên sereke pêk tê. Ew jî form û wate ye, ne wate bê form û ne form bê wate her du temamkerên yektir in. Eger form bê wate be wekî glopa (ampûl) bêkareb (bêceyran) ronahîyê nade û eger glop jî nebe, bêguman kareb nikare ronahîyê bide. Herçend zanayan li ser naverok û ruxsara deqî boçûnên cuda hene. Bo mînak yên cextê li ser ruxsara deqî dikin:

1- Brînkir: Deq peywendîyeka dû yekhatina di navbera risteyan e.
2- Harug : Deq peywendîyaka dû yekhatina asoyî ye ku peywendîya ristesazîyê dîyar dike.

3- Halîday : Deq hemû dû yekhatina risteyan bi xwe ve digire ku peywendyeka pêkve girê dide.
4- Todorov : Deq pêkhateyeka serbixweyî girtî ye ji komeka risteyan pêk hatiye wateyeka ron heye (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2015: 94).

Ew zanayên cextê li ser naveroka deqî dikin:

1- Rolan Bart : Deq çandinek e ji komela yekeyeka watedar û xwedî çemk û pêkhatî ye.
2- Bul Rîkor : Deq gotareka çespandî ye bi nivîsînê.
3- Binifnîst : Deq komeleka dahênana bêpênase, cûrbicûr û bê sinor e.
4- Dîbucrand : Deq hemû yekeyeka axivtinê ye ku xizmeta mebestekê dike.
5- Şmît: Deq beşek e û babetekê tewerî dîyar dike û erka raperandinê digire stûyê xwe.
6- Hartman : Deq peywendîyeka zimanvanîya resen e layenê gihandin û sîmalojîyê dîyar dike (Dizeyî, 94).

Ku wate dabeşa ruxsarî û naverokê di vekolînên cîyawazên edebî û zimanvanî da cihê gengeşeyê ne, bi taybetî di serdema nû da piştî ji dayîkbûna ciwannasîyê û çûna wê di nav ruxsarî û naverokê da, di şiyan da nîne ruxsar ji naverokê bê cudakirin. Anko dema dibêjin naverok wate merem jê naxê deqî ye ji wêneyê hunerî ji hunereka dîyarkirî da, ruxsar pêkhateyeka madî ye yan binyata wî formî ye yê wateya deqekî sinordar dike di nav çarçoveya wî yan sinorê wî da, peywendîya di navbera naverok û ruxsarê da mîna pêkhateya peyvê û ramana wê ye. (Emîn Ebdulqadir, 2007: 25- 26). Anko naverok bê ruxsar nikare hebe her tiştekî hebe tûkilkek heye ji bo hilgirtina naverokê. Ruxsar jî rengvedana wê naverokê ye. Anko bê morfolojî wate nabe û bê wate jî morfolojî nabe. Ciwanî û hebûna her deqekî ya di ruxsarî û naverokê da, bêguman naverokeka ciwan û baş rengvedana ruxsareka ciwan û baş e û berûvajî (ruxsar û naverok wekî leş û giyanî ne, jêk nahên cudakirin; eger gorankarî di şêwazê her yek ji ruxsarî yan naverokê da rû bide, dê bibe egerê guherîna ya dî ). (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2012 : 26). Anko em dişên bibêjin: Bo binyatdanana her deqekî giring e cext li

ser du tewerên sereke yên zimanî bê kirin. Ew jî tewerê stûnî û tewerê asoyî ye. Tewerê stûnî layenê semantîk û delalîyeta deqî bi xwe ve digire. Tewerê asoyî layenê morfolojî û sentaks û rêzimanê bi giştî bi xwe ve digire û nerêyî, alozî û têkçûna peywendîya di navbera her du tewerên stûnî û asoyî dê bi ladan bê qelemdan. Anko asta formî û asta delalî peywendîyeka kûr û kartêkirineka bihêz li hevdu dikin (Azad Ehmed Mihemed, 2009: 41-42). Em dikarin bibêjin: Deq ji rûyê serve û ji rûyê ji nav da pêk tê. Rûyê serveyê deqî, fonolojî û morfolojî, sentaksê bi xwe ve digirin û rûyê ji nav da yê deqî wateya semantîkî bi xwe ve digire. Bi wateyeka dî, giringîya pêkhateya zimanî di pêkhatina binyata derbirîna deqî da nîne, belku di pêkhateya naverokê da ye, ku ev çend binemayê teorîya qutabxaneya berhemhênanê ya Çomskî ye, ku ya sayên rêzimanê bo rêxistin û damezirandina binyata pêkhateya delalîyeta deqî kar dikin (Mihemed: 51). Anko rêkeftin û guncandin di navbera rêziman û delalîyeta deqî da du pîverên sereke ne ji bo avakirina deqekî birêkûpêk û ruxsareka ciwan û naverokeka serincrakêş. Ku wate em dikarin bibêjin deq:

1- Tomareka axivtinê ye: Anko wêneyekî fotografî yan nîgarî nine. Her çend nivîser wêneyê nivîsîn û endazeyê piştguh diavêj li dema şirovekirinê.
2- Rûdan e: Wate li demekî û cihekî rû dide û xwe dubare nake wek mêjûyê.
3- Gihandin e: Armanc jê gihandina zanyarî, zanist û serborîya bo wergirî.
4- Têkilbûn e: Peywendîya di navbera takekesên komeleyê dirust dike û diparêze.
5- Girtî ye : Anko destpêk û dûmahîk hene.
6- Berhemhêner e: Siruştî nine, belku berhema rûdanên mêjûyî, derûnî, zimanî û hid. Ev giringtirîn binemayên deqî bûn ji layê ronan û pêkhatinê ve.

Ku wate deq rengvedana kultura komelgehê ye bi hemû torên alozî ve bi rêya mêjû, cografya û peywendîyên di navbera takekesan da û bîrdankeka kurtkirî ya komelgehê ye. Deq komeleka peywendîyên zimanî ye, ku xizmeta bîrokeyekê yan çend bîrokeyan yan çemkekî dike, di şiyan daye ron bikin, lêk bidin û ev çend jî rêyê xweş dike, ta ku xwendinên nû bo bêne kirin. Wate; ruxsar û naveroka deqî her du di xizmeta gihandina peyama mirovayetîyê da ne, eger em deqî bi çavê “hunerê bo jîyanê”

bixwînin. Lê eger bi hizra “huner bo hunerê” bixwînîn, li wê demê ruxsar û naverok dê bikevine di xizmeta îstatîkê û çêjwergirtinê da.

## 1.4. Cûreyên Deqî

Her pêkhateyeka zimanî  heta bibe deq divêt hilgira hindek taybetmendîyan be. Her wekî di pênase û pîverên deqî da hatiye xuyakirin, li wê demê bi tenê nabe deq, belku dê bibe cûreyekî deqî yê dîyarkirî. Cûreyên deqan yekeyên sereke ne li dema ragihandina hevpeyvînê, pêk hatine ji hindek deqên destnîşankirî û xwedî erkeka gihandinê ya dîyar, wesfa wan tê kirin ku xwedîyê hindek deqên destnîşankirî ne û taybetmendîyên hevpişk di navbera wan da hene û bi egerê hindek kiryarên hevpişk hatine navkirin bi cûreyên deqan .Her çend ta niha zimanvan li ser destnîşankirin û vavartina cûreyên deqan bi hev ra nebûne û çend boçûnên cuda xuya bûne. Anko kiryara vavartinê ji kêşeyan xilas nabe. Ji ber du egeran :

1- Hebûna hejmara gelek deqên serederîkirinê di nav civakî da,
2- Eger her deqekî cûreyê wê bê destnîşankirin, zor hindek e ku guncav be, belku ji gelek parçeyên cîyawaz pêk tê di navbera vegêran, saloxdan û şirovekirinê da (Muhsin Arif Salih, 2012 : 29).

Ji ber hindê çend dabeşkirin û boçûnên cîyawaz hatine holê.

Yekem hewl bo destnîşankirina  cûreyên deqan ji layê Pîtir Hartman (Peter Hartman) bû, wî dîyar kir ku pêk hatine ji komeka deqên xwedî sîmayên hevpişk yan komeka deqên têne şirovekirin bi rêya sîmayên hevpişkên wan û cudahîya wan digel deqên dî. Hartman dibêje: Ew sîmayên hevpişk in dibine egerê dîyarkirina cûreyên deqan pêkhatine ji erka deqî, barê deqî, babet, wek yekeyeka lêkdanê (Şoreşvan Adil, 2012 : 37). Herwiha gelek zanayan polîna cûreyên deqan kirine bi şêweyên cuda cuda. Bo mînak; Dî Bîw Grand yek ji wan çendên cûreyên deq in dîyar kirine. Wek; deqên wesfî, deqên çîrokan,  deqên hevrikî, deqên edebî, deqên şî'rî, deqên zanistî, deqên fêrkirinê, deqên hevpeyvînê, deqên romanê, deqên zimanî. Herwisa parvekirineka dî ya cûreyên deqî: Deqên yasayî, deqên siyasî, deqên ayînî, deqên edebî, deqên felsefî, deqên

mêjûyî, deqên reklamî û hwd.  Ne bi tenê deq bo xwendin û jiberkirinê ye, belku her yek ji van roleka çalak heye di livîn û jîyana civakî da. Deqê edebî kartêkirinê li edîbvan û gencan dikin û deqên ayînî desthilata siruştê ye û ji bo cîbicîkirina fermanên pêxemberan, deqên mêjûyî derbirînê ji giyanê netewayetîyê dikin, deqên yasayî binemayê dewletê ye û piştgirîya sazîyên wê dike (Mohemed El Exizer El Sebîhî, 2008: 13). Herwiha Klaws Birînkir ji alîyê pratîkkirina erkên deqî, deqî dabeşî pênc cûreyan dike:

1- Deqên Ragihandinê: Dengûbas, raport, pirtûkên taybetmend, rexne û hwd.
2- Deqên Bersivdanê: Reklam, kumênt, yasa, daxwazname û hwd.
3- Deqên Pêgirîkirinê: Girêbest, belgename, soz û peyman û hwd.
4- Deqên Gihandinê: Spasî, gotarên serxweşîyê,  bilêtên wênedar û hwd.
5- Deqên Reklaman: Wesîyet, damezirandin û hwd. (Kilaws Rînkir, 2010: 193).

Ev dabeşkirin û çendîn dabeşkirinên dî bo cûreyên deqan hatine kirin; lê bi şêweyekî giştî Sitanlî Fîş û Embirto Îko deqî dabeşî du cûreyan dikin, ku em dişên bibêjin piranîya wan cûreyên deqan diçine jêr yek ji van her du cûreyên deqan ve ew jî “deqê girtî” û “deqê vekirî ne:

### 1.4.1. Deqê Girtî

Deqê girtî ew cûreyê deqî ye ku di bineret da hilgirê  yek wateyê ye. Anko nivîser mebesta xwe bi şêweyekî aşkira derdibire. Ev cûre deqe ne dewlemend e; çunke bi tenê yek wate bi xwe ve digire û delîvê nade wergirî ku çend wateyan jê bibe û her hewldanek  ji bo şirovekirina wî deqî dûr ji wateya wê ya sereke  dê bibe egerê berzebûnê (Mesûd Cemîl Reşîd, 2016 : 122-123). Anko deqê girtî encamekê rasterast dide xwendevanî bê guftûgo li ser bê kirin. Bi wateyeka dî deqê girtî rûbereka berfireh nade xwendevanî bo livîna hizra wî; çunke bi tenê yek xwendin bo tê kirin, lê belê bi dîtina Falîrî wateya rasteqîna deqî nine. Wateya deqî pêwîst e bi xwendevanî ve çi bi rast yan xelet, vêca eger xwendina wî xelet bû, deqî digire û cihê pisyarkirinê nahêle. Lê eger rast bû, ew bi ciwanî deqî berceste û şirovedike û xwendinên cîyawaz bo tenê kirin (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2015 : 99). Anko em dikarin bibêjin li dû layenê

epîstemolojîya xwendevanî dimîne ser têgihîştna wî ya dirust bo deqî û ew pencereya xwendevan têra deqî dixwîne. Herwisa bi dîtina Rolan Bart xwendina deqî bi dest ve nahê, ta ku bi rêk û pêkî û guncanidna hêma û nîşanan encam nedin ku kontrola wateyê dikin. Anko têgihîştina xwendevanî û şêwazê dahênerî biryarê didin kîjan deq vekirî ye û kîjan girtî ye. Herwisa deqê girtî, deqekî sinordarkirî ye û qalibekî dîyarkirî heye û pêwîst e bi yekîtîya babet, organ û stratejîya pêgirîbûna komeka yasa û rêsayan her ji form û naverok û şêwazê dariştinê (www.xebat.net).

### 1.4.2. Deqê Vekirî

Deqê vekirî zaraveyekî edebî yê nû ye. Komeleka bîrûboçûn û saxletên firehboçûnê bi xwe ve girtî ye. Lê belê heta niha bi şêweyekî sîstemkirî rehendên wê dîyar nekirine û wêneyekî berceste nîne, ku wate delalîyeta deqê vekirî xwe di firehrehend û şiyanên cîyawazên hunerî, merîfî û xeyalî da dibîne (www.emrro.com). Her deqekî nirxê taybet bi xwe ve heye û deq niwandineka neguhêr û çespandî nîne, belku kar, çalakî û berhemeka livîn û tijî ye ji dînamîkîyetê. Ji hizr û bîreka pitir digêhîne û karîgerîya deqî li ser xwendevanekî dibe karîgerîya heman deq li ser xwendevanekî dî cudahî hebe, çunke deqê vekirî firehwate ye û gelek xwendinên cuda hildigire û babeteka sinordar nîne ku bi yek wate bi dûmahî bê yan ji sinorê yek bîr û boçûn derneçe, belku her xwendevanek wateyeka taze û layekî delalî yê nû dirust dike û xwendevan wekî dahênerî beşdarî dirustkirina deqî dibe (Azad Ehmed Mehmûd, 2009 : 47- 48). Anko xwendevanî mafê wê çendê heye ku deqî hilweşîne û bi şêwazek û wêneyekî dî deqekî nû bi afirîne. Bi wateyeka dî ev cûre deq di binyatê da hilgirê çendîn wateyan e. Anko wergir dikare bi çendîn mebestan şirove bike û çendîn wateyan bide. Bi gotineka dî cextê li ser layenê amajeya zimanî tê kirin bi mebesta encamdana karîgerîyê li ser wergirî, ku ew jî rola xwe di şirovekirinê da dibîne (Mesûd Cemîl Reşîd, 2016: 123). Eger deqê vekirî û deqê girtî ji hevdu cuda bikin, ku wate hîç deqekî edebî deqên girtî nine. Çunke deqê edebî di şiyan daye bikeve ber guftûgo, ravekirin, dubare lêkdan û dariştinên cîyawaz, ku deqê vekirî azad û bê dûmahîk e. Lê belê em dikarin bibêjin deqên zanistî deqên girtî ne û yek wate û yek encam hene.

## 1.5. Deq û Dewrûber

Dahênerê zaravayê dewrûberî Malînovskî ye (Ebdulhadî Binzafir El-şehrî, 2004 : 40). Malînovskî (1884- 1942) şarezayekî antropolojîyê bû. Piştî Cengê Yekê yê Cîhanê diçe gizîrteyên (girav) dewrûberên Awustralyayê bo encamdana vekolînên meydanî li ser rûniştvanên gizîrteya Trubrîyandê (Trobriand). Dema tomarkirina têbînîyên xwe, bo wî dîyar bû, ew peyv, riste û destewajeyên ku xelkê vê gizîrteyê bi kar tînin eger wergêre ser zimanê îngilîzî bi wergêraneka tîpî gelek bi zehmet e ku dab û nerîtên xelkê wê gizîrteyê wekî heyî wergêre. Malînovskî bo vê çareserkirina vê arîşeyê têbînîyên xwe di pirtûkekê da darêştin bi navê “Coral Gardenis and Their Magico” û belav kirin û bo egerê danana binemayeka teorî “barî dewrûber” di wesifkirina wateyê da, bîr û boçûnên Malînovskî derbareyî vê babetê birîtî ye ku wate risteyê di dewrûbereka dîyarkirî û jîngeha riste tê da ji dayîk bûyî bi dest ve tê, mebest jê jîngeha siruştî ya waqiî û rewşenbîrîya civakî ye (Sacîde Ebdula Ferhadî, 2008 : 28). Herwisa bi wateyeka dî bi karîna risteyan di dewrûberî da bo lêkdana dîyardeyan û gihandina wê wateyê ya axivtinkerî mebest jê (Avêsta Kemal Mehmûd, 2009: 11). Lê belê Malînovskî bi berfirehî behsa dewrûberî û çawanîya bi destveanînê di çarçoveya teorîyeka şirovekirina wateyê da nekiriye. Çunke Malînovskî zimannas nebû, ji ber hindê giringî bi dariştineka teorîya zimanvanîyê nedaye.

Bi şêweyekî giştî bîr û boçûnên dewrûberî di salên 30an da peyda bûne, li dema giringî bi komeleyê hatiye dan û peywendîyên komelayet ku mirov bi rêya zimanî dikare di endamên komeleyê bigêhe û wan jî têbigêhîne (Şoreşvan Adil, 2012: 51) û taybetî li serdema Malînovskî û Fêrsî ku vê rêbazê pitir pê ve çûn bi xwe ve dît û giringî pê hate dan. Herwisa piştî wan dewrûber bo giringî pêdana çendîn zimanvanên dî, wekî Halîday, Rubînz, Bazl û Katizvudir, ku berhem li ser vê babetê tomar kirin (Sacîde Ebdula Ferhadî, 2008: 28). Herwisa zimanvanên nû giringî da dewrûberî û rola wî di destnîşankirina wateyê da dîyar kir. Bo mînak; Dî Susêr dibêje: Dema peyv di dewrûberekî da tê, bihayê wê dîyar nabe bê alîkarîya peyvên berî û piştî wê yan her duyan pêkve. Anko dewrûber beşek e ji deqî bi xwe. Dewrûber binemayeka giring e bo şirovekirin û zelalkirina wateyên veşartî û mijdar. Ev giringî jî li wê demê dîyar dibe

dema axivtin di nav dewrûberî da tê bikaranîn. Anko dewrûber wan hemû tiştan bi xwe ve digire yên kartêkirin li ser axivtin û wateyê hebe (Yehîy Ehmed, 1989: 84). Peyv bi tenê bê dewrûber wateya duyem ya li pişt wateya ferhengî nahê zanîn eger dewrûber nebe. Lewma pêdivî ye deq di nav dewrûberî da bê şirovekirin da ku mebesta firêker û têgihîştina wergirî hevdu bigirin. Peywendîyeka mukim di navbera deq û dewrûberî da heye. Deq ew gorepan e ku dahênerê deqî û xwendevanî bigêhîne hev. Halîday, dewrûberî wekî deqekî temamkirina deqî dibîne. Herwiha dibêje: Dewrûber pirek e bo girêdana ziman û jîngeha dewrûberî ve, berhemhênerê deqî desthilata li ser hilbijartina peyv û pêkhateyên deqî heye di nav komeka peyv, ronan, wate û wêneyî da heye. Li gorî layenê derûnî û hunerî, paşî wergir ji quncikekî cîyawaz û taybet li dû dewrûberên deqî û xwendinên cuda cuda bo deqî dike (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2015 : 99). Herwiha bi dîtina Layunî, zaravayê dewrûberî pêk hatiye ji hebûna zanyarîyan derbareyî yasayên barê taybet yên dest bi ser axivtinê da digirin, ew yasayên komelayetî ne ku komelgehê bi rê ve dibin (Avêsta Kemal Mehmûd, 2009: 11-12). Dewrûber zaravayekî deqî ye û xwedîyê livîneka avakirinê ye di nav deqî da ji layekî ve û di navbera peyv û risteyan da ji layekê dîtir ve, ev livîn komeka peywendîyên erkî peyda dike di navbera dewrûber û pêkanînên wî. Ev pênase dewrûberî bi deqî ve girê dide û avakirina wî û ew yekeyên dibine hokar bo pêkanîna wî. Çunke ew peywendîyên di navbera wan da dîyar dike. Bi wateyeka dî, dewrûber pêk hatiye ji her zanyarîyeka pêşîneya hevbeş di navbera axivtinker û guhdarî da, alîkarîya guhdarî dike ji bo têgihîştina mebestên axivtinkerî di her gotineka dîyarkirî da, li dû vê boçûnê dewrûber wan zanyarîyan bi xwe ve digire yên axivtinker û guhdar berî wê demê li ser rêkeftin, dibe hokar bo yarmetîdana guhdarî, sebareta wan wate û mebestên axivtinkerî divêt di gotinên xwe yên dîyarkirî da bigêhîne.

Ziman dema bo mebesteka dîyarkirî di navbera firêker û wergirî da tê bikaranîn bi dewrûberekî ve tê girêdan. Ji bo hindê da ku şiyanên hindê hebe, ku wate mijdarî, ya babet bi xwe ve digire, ya aşkira û dîyar be û ew tem û mijdarî tê da nemîne. Îcar eger dewrûber li berçav nehê wergirtin, mebesta firêkerî cem wergirî dîyar nabe û wê demê ew babet dê hilgirê çend wateyan be (Şêrzad Sebrî 'Elî, 2011: 106). li vê derê dîyar dibe

ku xwendevan nikare bi rêya semantîkê bi tenê bi wateya ferhengî bê dewrûber û pragmatîk bigêhe mebesta temama firêkerî. Çunke ew wateya mijdarî pêdivî dewrûberê ziman û dewrûberê bar e heta ku ew wate bê  zelalkirin. Li dû qutabxaneya îngilîzî bi serkêşîya Fêrsî li sala 1957ê dupatî li ser giringîya dewrûberî kir di destnîşankirina wateyê da û giringî da pêkhateyên zimanî di nav çarçoveya barê axivtinê da û ew yekeyên bar bi xwe ve digire. Digotine vî dewrûberî dewrûberê barî, wate vê rêbazê ne bi tenê giringî da  bi dewrûberê zimanî bo deqê wateyê belku giringî da dewrûberê nezimanî (Şoreşvan Adil, 2012 : 51). Dewrûber çarçoveyeka alavên deqî tê da tên rêxistin. Pîverek e bi rêya wê risteyê digêhine hev û pêkve tên girêdan. Jîngeheka zimanvanî û pragmatîkî ye hemû faktorên zanyarîyan  yên deqî pêşkêşî xwendevanî dike bi xwe ve digire. deq girêdayî dewrûberê xwe ye û her deqek bizaveka zimanî ye di binyateka civaka xwedî erkên cîyawaz da tê bikaranîn (Adil, 51). Anko em dikarin bibêjin her deqek ji rengvedana serdem û jîngeha xwe ye. Heta bi dirustî li deqî bigêhîne divêt me agahî  ji serdem û jîngeha deq tê da ji dayîkbûyî hebe. Çunke dem û cih  du binemayên giringên têgihîştina deqî ne. Lewra dewrûberê nezimanî roleka giring dibîne bo zelalkirina wateya mijdar. Eger dewrûberê zimanî wateya ferhengî bi de me, dewrûberê nezimanî  dê mebesta nivîserî bide me, ku armanca wergirî zanîna mebesta nivîserî ye. Herwisa dewrûber çemkekî berfireh e û hemû  wan tiştan bi xwe ve digire yên ku karîgerî li ser zimanî hebe di niha û dahatî da ku  her dewrûberekî dabe  cûre wateyekê dide. Çunke dewrûberî wateyeka giring heye bo lêkdana wateyê. Herwekî Laynz dibêje:  Wî dewrûberî bide min wê ew peyv tê da hatiye  bikaranîn dê wate wê peyvê  bidim te. Dewrûber take rê ye wateya ferhengî û wateya mebest ron û aşkera bike. Lê belê di asta semantîkê da  dewrûber tê piştguhavêtin. Ji ber hindê wateya semantîkê tem û mijawî dibe. Çomskî yekem kes bû digot: Heta riste bi kêr vekolînê bê, divêt bibe tiştekî mînakî û ji dewrûberî bê wergirtin. Çunke girêdana peyvê bi dewrûberî ve wateyên cuda dide ku di ferhengê da nine (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî,2014 :52).

Çemkê deqî bîroke ye û wate û wêneyê  hoşekî bi xwe ve digire, ku deq bi rêya deng, peyv û risteyê  di çarçoveya dewrûberê zimanî û dewrûberê  bar da tê çinîn û tevnkirin. Lêkolîn li ser xwedîyê deqî me nagêhîne derencameka temam. Bi tenê ew

lêkolîn nebin yên deqî di nav dewrûberî da werdigirin û her çar dewrûberên deqî lêkolînê lê dikin. Bi ramaneka dî, lêkolîn di wê jîngehê da ya ku deq tê da ji dayîkbûye, ew jî sîngê dahênerê xwedîyê deqî ye. Çunke wateya deqî girêdayî bi barûdox, jîyan, hizirkirin û îdeolojîya xwedîyê deqî ve, ji ber hindê ziman dîyardeyeka komelayetî ye û têgihîştina wî jî li ser vê çarçoveya giştî radiweste ( Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2015 : 100). Anko dewrûber çarçoveyeka giştî ye ku binemayên deqî tê da têne rêxistin. Lê belê dewrûberê zimanî bikaranîna deqî da komeleka binema û zanyarên giring dide xwendevanî ku birîtî ne ji wêneyên giştî ku ji komeka parçe û wêneyên rêxistî pêk hatiye û em nikarin wateya çi parçeyan bizanin, heta ku cihê wê di nav parçeyên giştî da nezanin. Ji ber hindê şarezabûn di taybetmendîyên di nav deqî da me nagêhîne wateya mebest, ku wate bi destveanîna wateya temama deqî bi rêya girêdana deqî ye di dewrûberî ve. Bi wateyeka dî heta em sinorê peywendîya di navbera deq û dewrûberî da nezanin, em nikarin wateya kûr a deqî bizanin (Dizeyî, 100). Di babeta zimanî da dewrûberî roleka karîger heye ji bo dîyarkirina wateya deqî di navbera hevpişkên axivtinê da, ku mebest ji dewrûberî ew helwesta deqî ye yan çarçoveya civakî giştî ye, wê ku pişikdarîyê di kiryara têgihîştinê ya di navbera firêker û wergirî da dike û herwisa dûrkirina wê axivtinê radibe ya tê gotin ji layê dem û cihî ve û ev destnîşankirina watayê û helkefta wî barûdoxî ku dewrûber pê radibe û daxwaza hindê dike ku firêkerî şarezayî li ser pêzanînên civakî hebin, yên di nav wê axivtinê da tenê gotin (Mihabad Haşim Îbrahîm, 2006: 16). Ji vê çenda borî xuya dibe ku dewrûber hemû wan pêzanînên borî û niha û yên girêdayî kultur, civakî, rewşenbîrî, dem, cih jîngeh, barûdox, geş û hewayê deq tê da ji dayîk bûye bi xwe ve digire. Bi rêya wan şarezayî yan wergir dikare pitir di mebesta firêkerî bigêhe, eger wergirî agahî li dor dewrûberê deqî nebin, bêguman nikare di mebesta firêkerî bigêhe li wê demê bi tenê dê çarçoveya semantîkê da bizîvire wek ferheng û nikare bigêhe wateya veşartî ya deqî. Dibe gelek caran wateya ferhengî di nav dewrûberî da wateyeka pêçewane bide wergirî. Bo mînak; peyva "ciwan", dibe ev peyv di nav dewrûberî da mebest jê "kirêt" be. Li vir rolê dewrûberî dîyar dibe bo şirovekirina her deqekî. Anko dewrûber xala cîyawazîyê ye di navbera semantîk û pragmatîkê da.


### 1.6. Cûreyên Dewrûberî

Cûreyên dewrûberî bi gelek rengan hatine parvekirin. Bo mînak, Van Dayk di gotarekê da bi navê “Ronan û Binyatên Deqî” dewrûberî dabeşî çend cûreyan dike: Dewrûberê pragmatîkî, dewrûberê dirkpêkirinê, dewrûberê derûnî, dewrûberê komelayetî, dewrûberê kulturî (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2015: 101- 103). Herwisa Perîtparret dewrûberî dabeşî pênc cûreyan dike: Dewrûberê deqî, dewrûberê hebûnê, dewrûberê karî, dewrûberê barî, dewrûberê derûnî (Ebdilhadî bin Vafir Alişehrî, 2004: 42-44). Herwisa dabeşkirineka dî bi vî rengî ye: Dewrûberê fîzîkî, dewrûberê zimanvanî, dewrûberê komelayetî, dewrûberê epîstîmî, dewrûberê derûnî (Avêsta Kemal Mehmûd, 2009: 13). Herwisa Malînovskî du cûreyên dewrûberî dest nîşan kirine: Dewrûberê barî, dewrûberê rewşenbîrî (Şoreşvan Adil, 2012: 54). Herwisa Firês serkêşê teorîya dewrûberî tê nasîn û dewrûber dabeşî çar cûreyên kiriye: Dewrûberê zimanî, dewrûberê helwestî, dewrûberê rewşenbîrî, dewrûberê hest û sozan (Efaf Binbut, 2004: 23-25). Herwisa gelek zimanvanan bi rengên cuda behsa dewrûberî û rola dewrûberî kirine bo ronkirina wateyên tem û mijdar. Firês bi şêweyekî giştî dewrûberî dabeşî du cûreyên sereke dike (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 20014 :113). Dewrûberê zimanî, dewrûberê nezimanî, ku ew hemû dewrûberên me li serî behs kirin diçine li bin yek ji van her du cûreyên ve, li vir dê bi şêweyekî berfirehtir behsa van her dû cûreyan bikin:

#### 1.6.1. Dewrûberê Zimanî

Dewrûberê zimanî wan hemû yekeyên zimanî bi xwe ve digire ku ji birg, peyv, girê û risteyê ta digêhe paragraf û deqî, ku wate peyv, karîgerîya rêziman û peywendîya di navbera peyvan da bi xwe ve digire, dibêjine vî cûre dewrûberî dewrûberê biçûk, ku behsa kartêkirina peyvan dike û hevdu dîyar dikin û kartêkirinê li hevdu dikin, dewrûberê zimanî bara pitir keresteyên zimanî û form û erkan bi xwe ve digire (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2014: 113). Dewrûberê zimanî bi şêweyekî giştî, asta dengî (fonolojî), asta peyvên zimanî, asta rêzimanê (morfolojî û sentaksê), asta wateyê (semantîk) (Sacîde Ebdula Ferhadî, 208: 34-36), anko rûyê ji derveyî deqî ji fonolojî, morfolojî û sentaksê bi xwe ve digire. Herwisa rûyê ji nav da yê deqî watesazîyê bi xwe

ve digire û rûyê ji nav da û yê ji derve her du pêkve dewrûberê zimanî dirust dikin. Bi vî rengê xwarê :




### 1.6.2. Dewrûberê Nezimanî

Ev dewrûber deq û gotarê bi xwe ve digire û bi dewrûberê mezin tê binavkirin. Pêk hatiye ji hemû wan rehendên kartêkirinê li ser deqî dikin. Wek: Mêjû, siyaset, aborî, komelayetî, derûnî û hwd. Wekî jêdereka piştbest li ser tê kirin bo ronkirina wateyan di nav deqî da (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2014 : 113). Anko tiştekî ji derveyî zimanî bo me wateya di nav zimanî da ron û dîyar dike. Derbareyî dewrûberê nezimanî çend boçûnên cîyawaz bi xwe ve digire. Ji wan Galîson û Kost: Bi dîtina wan dewrûber komeleka barûdoxê berhemê axivtinê ye û ev barûdox jî ji derveyî xwedîyê axivtin û gotinê ye û berhemê mebesteka dîyarkirî ye û hebûna wî girê daye bi kesên axivtinker û guhdar li dem cihekî rû dide. Herwisa Brawn û Yol dibêjin: Dewrûber pêk tê ji firêker, wergir, dem û cih. Çunke karîgerîya wan li ser lêkdana deqî heye (Dizeyî, 113). Bi dîtina min li vir xala herî giring dem û cih in. Çunke serdem û cih du faktorên sereke ne bo guherîna wateya her deqekî heta deqên pîroz jî wateyên cuda hildigirin li pey dem û cihan. Bo mînak Qurana Pîroz, bi dîtina hindek zanayan her deqekî di nav Quranê da pitir ji % 92 wateyên cuda bi xwe ve digirin, heta ku digel dem û cihan biguncin. Anko li vir deq pîroz e, lê belê wate ne pîroz e. Wate qabilî jêbirin û guherînê ye li gorî mekan û zemanî. Herwisa Haymiz dewrûberê nezimanî dabeşî çendîn cûreyan dike :

1- **Axivtinker :** Mebest bi nivîserîyan berhemhênerê deqî. Ev çend jî îdeolojîyên wî û bîr û bawerîyên wî bi xwe ve digire û herwisa ew jîngeha tê da perwede bûye û dîtina wî ya taybet bo jîyanê.

2- **Wergir** Xwendevan yan ew kesê peyam bo tê arastekirin. Ev çend jî li dû asta rewşenbîran wergirî dimîne û layenê wî yê epîstîmolojî.

3- **Berhevbûn** Wan guhdaran bi xwe ve digire, ku amadeyî guftûgokirinê ne û hebûna wan karîgerî li ser kirdeyên axivtinê heye. Anko em dikarin bibêjin: Bîr û boçûnên cuda yên amadebûyan bi xwe ve digire.

4- **Babet** Peyam û naveroka nameya nivîserî bi xwe ve digire wek kirdeyên axivtinê û ew mebest û meremên firêkerî divêt bigêhîne wergirî.

5- **Meqam** Dem û cihê kirdeya axivtinê bi xwe ve digire digel peywendîya fîzyayî di navbera axivtinker, nîşan, livîn, amaje û barê dev, çavan û hwd. Wate ew dem û cihê axivtin lê hatiye kirin gelek giring e. Dibe nefsî axivtinê di dem û cihên cuda da wateyên cuda bide.


6- **Kenal** Peywendîya axivtinê bi xwe ve digire, gelo nivîsîn yan axivtin e yan zimanê leşî ye yan jî amajeyên zimanî ne.

7- **Sîstem** Cûreyê ziman û dîyalektan û şêwazê zimanî yê bikarhatî dîyar dike.

8- **Şêweyê Peyamê** Cûreyê peyamê bi xwe ve digire, ragihandin e yan nameya evîndarîyê ye yan her babetek e.

9- **Kilîl** Hilsengandin û nirxandinê bi xwe ve digire, gelo ev peyam baş e yan xirab e, kurt e yan dirêj e.


1- **Armanc** Armanca naveroka peyamê bi xwe ve digire, ecêba bo azirandin û serdabirinê ye yan hestderbirîn e yan jî bo rastvekirina arasteyan e. Herwisa bi dîtina Fêrisî dewrûberê nezimanî pêk tê ji :



Ku wate dewrûberê bar hemû wan tiştên ji derveyî zimanî bi xwe ve digire yên kartêkirinê li wateyê dikin, ku ji derveyî ferhengê ne ji bo zelalkirin û wateya veşartî. Herwisa Lîvîsî jî çend taybetmendî dîyar kirine bo dewrûberî:

1- Cîhana Şiyanan : Cîhana ketwarî û girîmaneyên lojîkî bi xwe ve digire.
2- Dem: Risteyên dem û hevalkaran bi xwe ve digire. Wekî duh, îro, şemî û hwd.
3- Cih: Riste û hevalkarên cihî bi xwe ve dagirin. Wekî bin banî, ser mêzeyê, li vir û hwd.
4- Axivtinker : Cînavên pêvebestî bi xwe ve digire.
5- Beşdarvan: Cînavên taybet bi wergirî ve bi xwe ve digire.
6- Tiştên Amajepêkirî: Wan risteyan bi xwe ve digire yên amraza amajeyê tê da. Wek: ev, van û hwd.
7- Gotara Borî: Wan risteyan bi xwe ve digire, yên tiştên borî tê da hebin.
8- Taybetbûn : Komeleka tiştên bêsinor, yên yek li dû yek bi xwe ve digirin.

Herwisa Halîday dibêje: Giring e ev her du zarava berçav bên wergirtin, wateya peyvê (ferheng) û wateya barûdoxê navekî (semantîk) bo şirovekirina çemkên barûdoxê derekî (dewrûber) dê me pêdivî cudakirina sê çemkan bike. Ew jî : (Sacîda Abdullah Ferhadî , 2008 : 32-33) :




1- **Şêwaz** Wan şêwazan bi xwe ve digire ku girêdayî ne bi axivtinkerî ve.
2- **Armanc** Wan tiştan digire yên girêdayî axivtinkerî ku wergir armanca wî dîyar bike.
3- **Babet** Ew rê ku axivtinker kirdeyên axivtinê pê encam dide, ecêba axivtineka asayî ye, gotar e yan guftûgo ye.

Ji ber wê peywendîya mukima di navbera dewrûber û deqî da heye Van Daykî pirtûkeka jêrnavê “Text and Context” dana û herwisa Halîday û Riqyeyê bi heman

şêweyî pirtûkeka bi navê “Ziman, Dewrûber û Deq” dana. Conlayinz dupatîyê li ser vê peywendîyê dike û dibêje: Dewrûber û deq temamkerên hevdu ne û hevdu ron dikin. Anko ne deq bê dewrûber û ne dewrûber bê deq. Firêsî jî heman boçûn heye û dibêje wate nahê dîyarkirin, heta yekeyên zimanî li dewrûberê cûrbicûr nedanin. Herwisa Ûlman dibêje: Eger dewrûber bi hûrî berçav bê wergirtin dê bikarin xwe rizgar bikin ji gelek wergirtin û wergêran û lêkdanên nedirust. Herwisa dewrûber ji bilî zanistên zimanî û edebî  bûye cihê giringîya pêdana zanistên dî. Wekî; derûnnasî, komelenasî, felsefe, antropolojî, zanista yasa, mêjû û hwd. Heta ku mifa ji taybetmendîya dewrûberê derûnî û komelayetî wergirin, ji bo wê yekê Ulman dibêje: Eger teorîya dewrûberî bi temamî pratîk bikin ew dê bibe berê binaxeyê zanista wateyê. Dewrûberî karîgerîyeka zor heye bo zelalkirina wate û nehêlana tem û mijdarîyê. Çunke wateya peyv û risteyan  heta nehê girêdan bi dewrûberî ve, bi temamî li wate wan nagêhîne. .( Avêsta Kemal Mehmûd, 2009 : 12-15). Li vir  em dê hewl bidin  kurteya rola dewrûberî  bi deqî ve  di çend xalan da bidine xuyakirin :

1- Herwekî Vîndirîs dibêje : Dewrûberê hoşekî firehwateyê nahêle û binemayeka yekalîker e bo wateya mebestê.
2- Peywendîya dewrûberê bar bi kesayetîya firêker, wergir û  hemû wan tiştên peywendî bi barûdoxê axivtinê ve heye zelal û dîyar dike.
3- Dewrûber cûreyê erka  axivtinê dîyar dike. Wekî; fermandan, razîkirin, serdabirin, nerazîbûn û derbirîn.
4- Dewrûber karîgerîya axivtinê ron dike. Wekî; pêkenîn, gelte, erênî, nerênî û hwd.
5- Dewrûberê barê komelayetî, aborî,  derûnî û rewşenbîrîyê ron dike.

Bi şêweyekî giştî dewrûberê nezimanî dabeşî çend cûreyan dibe :

1- Dewrûberê Pragmatîkî (Deq Wek Kirdeyeka Axivtinê) :

Di vê xalê da dewrûber vekolînê li ser erka deqî dike. Bi wateyeka dî, vekolîn li ser her deqekî bi tenê bo zanîna ruxsar û naverokê nîne. Belku bo hindê ye da ku em bizanin armanc ji vî deqî çi ye? Dewrûberê pragmatîkê lêkdana deqî piştguh ve diavêje wek kirdeyeka zimanî ku sozdan, hereşekirin, cextkirin û hwd. Erka pragmatîkê di vê

navendê da  dîyarkirina mercan e, bo her kirdeyeka zimanî heta  ku digel dewrûberî bigunce. Dewrûberê pragmatîkê pêk tê ji hemû binemayên derûnî û komelayetî ku dibine kirdeyên zimanî. Wek; zanîn, hez û arezû, sererayî (ji bilî) wê çendê wan mercan dîyar dike, ku divêt di risteyê da hebin. Herwisa dewrûberê pragmatîkê behsa wan rêyan dike yên risteyan bi deqî ve girê dide (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî,2015 : 101). Peywendîkirin bi rêya zimanî  piştbestîna xwe bi hêmayên têne gotin dibeste. Lê belê gelek caran di axivtinê da hin hêmayên dî beşdarîyê dikin. Wekî; birû rakirin, hejandina milan, serrakirin û serhejandin bo xwarê. Anko ew amajeyên leşî yên digel zimanî bi kar tên dibine temamker bo wateya axivtinê. Ku wate harîkarên axivtinê wan derbirînên rûyên mirov û amajeyên dest, ser û hemû livînên dî yên leşî  ve digire yên dibine temamker bo peyvên firêkerî. Herwisa di nav babeta nezimanî da, anko di nav zimanê îşaretan da, dewrûber roleka berçav dibîne ji bo dîyarkirina mebesta firêkerî, bi rêya wan livînên endamên leşê xwe (ser, dest, çav …) derbirînê jê dike. Anko bê ku biaxive yan jî binivîse, ew livîn û hereketên leşî diçine di nav hêmayên nezimanî da, ku bi rêya wan livîn û hejandin firêker dikare di dewrûberekî destnîşankirî û guncav da, di navbera xwe û wergirî da rabe bi niqandina çavê xwe yan hejandina serê xwe li dû rêkeftina wan bi mebesta bicihanîna kiryareka terorî yan bo her mebesteka dî be, ev çend jî ji layê firêker û wergirî ve berî hingê yan jî li dû  wî dewrûberê ew tê da  rêkeftin li ser tê kirin. Lewra zimanê îşaretan jî mil bi milê zimanê siruştî ve beşdarîyê di kiryara peywendîkirinê di navbera firêker û wergirî da dike (Şêrzad Sebrî Elî, 2011 : 109).

2- Dewrûberê Dirkpêkirinê yan Zanîn (Têgihîştin ji Deqî) :

Bi boçûna Van Dayk têgihîştin ji deqî, bikaranîna zimanî bi pileya yekê ji peyv, riste û zincîra risteyan pêk tê. Piştra bikaranîna zimanî bo vedîtina peywendîyan û divêt piştbestinê li ser zanyarîyên bîrdankê da hatine tomarkirin bike. Têgihîştina karîgerîya deqî bi rêya bîrdanka demkî dibe, ku zanyarî tê da hatine tomarkirin. Lê belê bîrdanka demkî ya mirovî şiyanên wê sinordar in û piştî tijî dibe zanyarî di bîrdanka mayînde da têne tomarkirin. Bo hilsengandina deqî heta ku em bizanin rêk û pêk û guncav e. Pêdivî ye hindek ji pêzanînan di bîrdanka demê da bên tomarkirin. Herçend bihayê wan pêzanînan mezintir be dê bi asan wan bizîvirînin, bo her deqekî jî komeleka binema heye

heta wek xwendevan bikare çareserîya deqî bike û paşî lêk bide (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2015: 101) Anko zanyarîyên xwendevanî û pilebilindîya asta rewşenbîrîya xwendevanî dewrûberekî giring e bo şirovekirin û têgihîştina deqî.

3 - Dewrûberê Derûnî (Karîgerîya Deqî)

Mebest ji wê karîgerîyê ew e ku deq bike ser bikarhênerê zimanî, îcar tak (tek) be yan komel be, di vî cûre dewrûberî da binemayên komelayetî roleka karîger heye bo têgihîştina deqî (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2015: 102). Herwisa di vî dewrûberî da pileya hêz û bêhêzîya hilçûnê destnîşan dike (Ehmed Mixtar Emir, 2006: 71). Ev yek jî girêdayî wan cûre peyv û risteyan e yên hilçûn tê da xuya dibe. Ev yek jî bo wî dewrûberî dizîvir, wê deq tê da hatiye afirandin, yan ew barûdoxê firêkerî deq tê da nivîsandî. Çunke barûdoxê civakî, siyasî, aborî, îdeolojî û dewrûberî rengvedan û kartêkirin li ser deqî heye. Bi wateyeka dî, dewrûberê derûnî hemû wan hilçûnan bi xwe ve digire ku axivtinker tê da gotin û risteyan derdibire û di beramber da jî wergir datayan şirove dike û mebestên firêkerî jêk cuda dike li goreyî ew barê derûnî yê nivîser tê da axivtinê dike (Avêsta Kemal Mehmûd, 2009: 17). Anko derûnîya mirovî ne cigar e û gorankarî bi ser da tên û ev çend jî di deqî da reng vedide.

4- Dewrûberê Komelayetî (Têkilbûna Deqî)

Giringî dan bi peywendîya di navbera bikaranîna ziman û dewrûberê komelayetî da. Çunke barê komelayetî berhemhênerên deqê bê sinor in. Lê belê di gel hindê jî dewrûberî taybetmendî yên giştî hene û pabend in bi pîver û berdewam dubare dibin, ji dewrûberê giştî û taybet peyv bihayê kirdeya axivtinê werdigire. Deq wekî kirdeyeka axivtinê bi tenê dewrûberê komelayetî dîyar nake; belku dewrûberê komelayetî bi xwe çawanîya bikaranîna zimanî dîyar dike (Ebdulwahîd Mişîr Dizeyî, 2015: 102). Halîday pragmatîkê bi alîyê komelayetîyê ve girê dide û bi binaxeyê geşekirinê dizane, ji belku dewrûberê komelayetîyê bi egerê ew yasayên rê pê hatiye dan û hindek axivtin bi merc û qeydîya xwe ve derdibirin û ev çend dibe egerê têgihîştina çendîn cûreyên kirdeyên axivtinê (Avêsta Kemal Mehmûd, 2009: 15). Wate mirov bûnewerekî komelayetî ye û bi

tenê najî, têkîlî civaka mirovayetîyê dibe û bi dehan bîr û boçûn  têne alûgorkirin û ev çend jî  di nav deqî da rengvedana wê heye.


5- Dewrûberê Kulturî (Deq Wekî Dîyardeyeka Kulturî)

Deq bi dîyardeyeka kulturî tê hejmartin. Çunke bi rêya kulturî giringî bi hin alîyên kulturî û binyata komelayetî dide. Herwisa em dikarin guftûgoya bikarhatî ji dewrûberê taybet bînin û rola endamên komelgeh, erk û mafên wan dest nîşan bikin. Anko ew wateya ku xwendevan li dû digerê ji dewrûberî tê vedîtin. Ev yek jî careka dî deq ji alîyê xwendevanî ve  tê hilweşandin û dariştin (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2015 : 103). Anko xwendevan deqekî nû diafirîne û beşdarîyê di avakirina deqî da dike. Bi  vî rengê li xwarê ku deqê duyê bi pişkdarîya xwendevan di hîte afirandin bo mînak :

**Deq 1** ⟶ **Dewrûber** ⟶ **Deq 2**

Anko deqê  yekê digel dewrûberî, dibe egerê berhemanîna deqê duyê, anko rola dewrûberî  roleka giring e di şirovekirina gotar û deqî da. Herwisa divêt dewrûberê rewşenbîrî û civakî bêne destnîşankirin û ew peyv tê da têne bikaranîn. Bo mînak; peyvên “hevjîn” û “jin” di nav civaka kurdî da, ku her yek ji wan amajeyê bi çîneka dîyarkirî dike, ku peyva “hevjîn” amaje ye bo çîneka berz, lê belê peyva “jin” di nav çîneka nizm da bi kar tê (Şêrzad Sebrî, 2015: 303). Anko dewrûberê kulturî bo ronkirina wateyê roleka karîger heye. Helbet kultur jî ji civakekê bo civakeka dî tê guherîn. Helbet guherîn jî bandora xwe li forma peyvê û wateya peyvê dike û dibe egerê guherîna wateyê û çemk û formên cuda dê bibe egerê wateyên cuda. Anko deq bi çi rengan bo dewrûberê resen nahê vegerandin, ew dewrûberê tê vedîtin dewrûberekî girêmanî, tem û mijdarî ye. Çunke deq yekeyeka semantîkî ye ne ku pragmatîkî ye. Lê belê girêdana deqî bi dewrûberî ve dibe egerê wê yekê ku serederîya gotarê digel deqî bê kirîn. Ev çend jî, bo  çûna hindek zimanvanan e, ku deq û gotarê bi hevwate didanin, ji wan yek Coliyan Girîmas e. Çunke di zimanvanîya  ewrûpî da deq û gotar bo bikarînana gotarên nezimanî bi kar tên. Wekî; fîlm, rêûresmên cîyawaz, çîrok, wêne.... Ku heman  boçûna

Gîlbirt û Mulika ye dibêjin : Gotar hemû şêweyên nivîsîn û axivtinê bi xwe ve digirin. Dewrûber di  vî wêneyê li xwarê da xuya di be :




## 1.7. Vegerandina Dewrûberî bo Deqî

Wekî me  amaje pê daye, dewrûber binemayekî giring e  bo şirovekirina deq  û vedîtina wateyên veşartî yên deqî û bo gihîştina mebesta nivîserî, helbet me behsa du cûreyên dewrûberî kir, ew jî dewrûberê zimanî û dewrûberê nezimanî bûn, ku dewrûberê zimanî  pêkvegirêdana peywendîya yekeyên zimanî ji ser ve û ji nav da ya deqî anko ruxsar û naverok, ku wateya semantîkê dibexşe. Herwisa dewrûberê nezimanî mebest jê wê jîngeha deq tê da ji dayîkbûye, wekî dem, cih û psîkolojîya nivîser û dîyardeyên kulturî, komelayetî, ayînî û hwd. bi xwe ve digire. Ku wateya pragmatîkî dibexşe ji mebesta nivîserî pêk tê. Anko vegerandina van her du binemayan bo deqî dê karê şirovekirinê asantir bike  û pitir dê xwendevan li deqî bigêhe.

Peywendîyên dewrûberên deqî hêzeka ku ruxsar û naveroka deqî bi rê dixe û hewl dide têgihîştina deqî bi temamî bi dest ve bîne û bîroke û wateyên cîyawaz bi rê bixe û deqî bi havkêşeya gihandinê ve girê dide (wek; firêker, wergir û kenal).  Bi dîtina Kîlerî dewrûber wateya risteyê  dîyar dike û bi tenê risteyên dî yên  deqî bi xwe ve nagire. Belku pêkhateyeka zanîn û wateyî ye û bi pileyên cîyawaz ji dîyarkirinê wek şiyanên lêkdana wateyê ye (Wilîm Rayî, 1987 : 129). Ku wate, dewrûber ew hêz e  ku deqî bi cîhana pêkhateyên dî ve girê dide û mebest ji pêkhateyên dî, ew  zanyarî ne yên ku

beşek in ji pêkhateya deqî, anko ew peywendî ye ku lêkdanê bo layenê peywendîyên deqî dike. Anko deq bi zanyarîyên dewrûberî ve tê girêdan wateyên dewrûber û peywendîyên gihandinê ji kirdeyên dîyarkirina deq û erka firêker, wergir û layenên havkêşeya gihandin û têgihîştina deqî, dubaredanana binyat û avakirina deqî ye. Anko deqî binyateka vekirî heye. Beramberî dewrûber û gihandinê, wate li dû yekhatina risteyan li nav deqî da bi wê sîstemê ya ku dewrûber dîyar dike. Peywendîyên dewrûberên deqî binçîneyên (binemayên) kirdeyên binyatên deqî ne. Çunke pesendîyê dide deqî. Proseya serkeftina zimanî girê daye bi pesendîya deqî ji layê wergirî ve. Herwisa dewrûber deqî dike toreka çandinî ku peyv, wate û hemû beşên deqî bi hev ra girê dide û bi hêsanî jêk cuda nabin û ev çend xizmeta pragmatîkîya deqî dike û sedemek e bo serkeftin berdewambûnê. Ku peywendîya dewrûberî her ji fonolojîyê pêk tê heta digêhe girê û riste, destewajeyan û hemû deqî bi xwe ve digire. Peywendîyên dewrûberên deqî dabeşî çend cûreyan dibin :

### 1.7.1. Peywendîyên Hokarî

Peywendîyeka wateyî ya giring e bo binyatdanana deqî û ev peywendîya gehandina hoyî (sedemî) di nav bariste û pêkhateyan bi dirêjîya deqî behs lê dike. Anko ew peywendî ye ya parçeyên deqî bi hevdu ve girê dide, ku ew amraz û bîroke ne yên deqî dikin yek parçe bi du rêyan:

**Yekem** : Bi rêya amrazên dîyarkirî. Wek; çunke, ji ber, belku, anko û hwd. Ev amraz parçeyên deqî bi pêkve girê didin û deqî dikine parçeyekî yekgirtî û yekeyeka serbixwe (Cankohn, 1986: 46).

**Duyem** : Bi rêya wateyê, şiyanên lêkdan û destnîşankirina hoyan (sedeman) bi rêya derencamên lojîkî û girêdana nîşan û bîrokeyan. Kohîn gelek giringîyê bi rola wergirî nade bo vedîtina peywendîya hoyî û lojîkî. Berûvajî Birawn, Dîbegrand, Vandayk ev, cextê li ser rola wergirî dikin. Bi dîtina wan, wergir bi tenê peywendîyên dewrûberê zimanî şirove nake, belku têkilî binemayê zanîn û peywendîyên dî dibe. Wek koda ziman û barûdoxê berhemanîn û barê wergirî. Eger parçeyên deqî bi rêya amrazan nehên girêdan, deq çi wateyan nabexşe (El Ezhir El Zinad, 1997: 42). Anko likandin û

vehandin her du binemayên gelek giring in bo avakirin û yekparçekirina deq û bexşîna wateyeka yekgirtî.

### 1.7.2. Peywendîyên Ferhengî

Di dewrûberên deqî da komeleka peywendîyên peyvê hene ku pêkhateyên wan bi hevdu ve girê didin û zimanvan van peywendîyan bi "bûbare" bi nav dike. Bi dîtina Dîbugrandî ev dubarebûn girê daye bi cîgirkirin û aborîya ziman û peywendîya yekser heye bi ferhengê ve ku pêngaveka sereke ye bo binyatdanana riste û hemû deqî û vegerandin bi vî şêweyê xwarê ye :

1- Dubarebûna heman peyvê,
2- Dubarebûna hevwateya peyva berê,
3- Dubarebûna nîvco ya hevwateya peyva berê,
4- Dubarebûna regezeka reha,
5- Dubarebûna navekî giştî (Ebdilwahid Mişîr Dizeyî, 2014: 17).

### 1.7.3. Peywendîya Niwandina Şêwazî

Niwandina şêwazî karîgerîyeka zor heye bo têgihîştina deq, hest û sozan dibexşe bi şêweyê bîrkirin û binyata hoşekî ya deqî, peywendîya şêwazî di nav dewrûberê deqî da meseleya wateya şêwazê ziman û îdeolojîyan derbaz dike. Çunke di binyatê da amanc şêwaz nîne, belku ji bo karîgerîya şêwazên zimanî yê deqî ye bo gihandina dewrûberî û ne qutkirin û karakirina vî şêwazî bo binyata deqî. Çunke cîhana şêwazî dikeve beramberî pêkhateya deqî ku pêdivî ronkirin û lêkdanê heye. Her vê çendê jî wiha Faynrîşî kir, ku dibêje: Wate bi rêya yek risteyê dîyar nabe, belku lêgerîyan e di navbera komeka risteyan da. Lê eger wate bi dû yekhatina risteyan ve girê bidî û ew riste mînakîya şêwazî bin dê karîgerîya wan pitir be û bi şêweyekî karîger beşdarîyê di gihandin û têgihîştin ji deqî bike (Seîd El Behrî, 1997: 140). Ev têgihîştin giringtirîn destkefta dewrûberî ye û ev çend, diselimîne ku şêwazê hevwate hewlek e bo gihandina karîgerkirinê li ser derûnîya wergirî.

### 1.7.4. Peywendîya Hevdeqî

Hevdeqî peywendîya di navbera deqê berdest û deqekî dî yê neamade ye, ku peywendî bi hevdu ve hebe, çi peywendîya yekser be yan ne yekser be, ji ber giringîya hevdeqîyê tê hejmartin yek ji mercên serkeftina deqî. Anko pêdivî ye her deqekî peywendî bi deqekî dî ve hebe heta bibe deq. Ev binema gelek giringî pê hatiye dan ji layê Culiya Kiristîvan û Rolan Bartî ve. Ku wate her deqekî tê nivîsandin pêşwext ew bîroke heye û deq li ser tê berhemanîn.

### 1.7.5. Peywendîya Hêla Wateyê

Li dû yekhatina peywendîyên wateyê beşek e ji peywendîyên dewrûberî ku dikeve jêr binemayê bi dû yekhatinê wek pêkvegirêdana deman û lêkdana wateyê û dû yekhatina wateya palpişt. Mebest ji dû yekhatina wateyê tewerê asoyî ku pêkvegirêdana risteyan e bi bîroke û amrazên zimanî. Vandayk û Halîday cextê li ser peywendîyên demê di nav rûdanên deqî dikin û peywendîyeka rêkeftî ye di navbera kar û ew tiştên amajeyê bo demê dikin berhem tînin (Ebdulwahîd Mişîr Dizeyî, 2014: 123). Ev tewerê asoyî risteyan bi hevdu ve girê didin û peywendê di navbera wan da dirust dikin û deqî berev wateyeka yekgirtî û dîyarkirî ve dibe. Ku wate dewrûber ew jîngeh e ya ku mebesta nivîserî tê da xuya dibe. Vegerandina dewrûberî bo deqî vegerandina zanyarîyên berzeyên deqî ne, yên veşartî yên xwendevanî agahî lê ne. Anko dewrûber cihê gihîştina mebesta nivîser û têgihîştina xwendevanî ye. Bi tenê dewrûber e me digêhîne mebesta nivîserî ne ku ferheng. Eger ferheng wateya semantîkê bide me, dewrûber wateya pragmatîkê dide me, ya hatiye gotin, eger tu dewrûberê deqî bidî min, ez dê mebesta nivîserî bidim te. Herwisa dewrûber deqî li ser binyateka rêkûpêk bi rê dixe û ji nedeqîyê berev deqbûnê dibe û bi şêweyekî endazeyî ji nav da û serveya deqî ava dike û dike avahîyeka temam û yekgirtî û yekeyeka serbixweya wateyê dibexşe.

## Beşa Duyem

## 2. Wateya Deqî

### 2.1. Cûreyên Wateya Deqî

Xuya ye ku wate dîyardeyeka gelek aloz û tevlihev e di nav zanista zimanvanîyê da. Çunke têkilî hemû babetên zimanî, edebî, felsefî, civakî, lojîkî, merîfî û hwd. dibe. Lewma bûye cihê giringîpêdana qutabxaneyên zimanvanîyê û zanayên zimanî. Her ji ber vê çendê bûye, ku wate bikeve ber danûstandinên dirêj û hûr û kûr. Derencam çendîn bîr û boçûnên cuda derbareyî polînkirina cûreyên wateyê dirust bûne. Em dê hewl bidin ku çendîn boçûnan derbareyîî cûreyên wateyê dîyar bikin. Zanayê zimanvanîyê Lîc wateyê, dabeşî heft cûreyan dike :


1- Wateya Çemkî

Vê cûre wateyê çendîn navên dî hene. Wekî; wateya dirkkirinê, wateya hoşekî û wateya bineretî. Ev wate hokareka sereke di prosesa gihandina zimanî da. Herwisa wateyeka giştîgir e li ser rehendên temam bo erka bineretîya zimanî (Şêrzad Sebrî, 2015: 230). Anko ev wate ji layê komelgehê ve rêkeftin li ser hatiye kirin û wateyeka giştî, rêxistî û aşkera ye li dev bikaranînên zimanî. Ev wate li qonaxên perwerde û fêrkirinê mirov werdigire û di nav mîyêjê mirovî da diçespe û gorankarî di ser da nahê ku wateyeka bineret e. Bo mînak; peyva “jin” xwedîyên sîmayên +mirov, -nêr, +şûkirî, +pêgihîştî ev wateyên hoşekî yên peyva “jin” anko wateya ferhengê ya resen e bê ku mebestek li pişt hebe.

2- Wateya Barkirî

Wateya barkirî bi wateya lawekî tê nasîn û formeka dî li ser wateya hoşekî zêde dike. Wateya lawekî li goreyî komelgeh, mêjû û têgihîştina takekesî tê guherîn (Muhemed Merûf Fetah, 2011: 161). Anko wateya barkirî li gorî kes û şêwazê wî yê gotin û darîştinê tê guhertin û taybetî asta rewşenbîrîya kesî dimîne ka heta çi radeyê

dikare peyvê di nav dewrûberî da şirove bike û wateyên cuda lê derbixe. Anko zêdekirina wateyê li ser peyvê, ew wateya veşartî ya ji derveyî î ferhengê tê zêdekirin ku axivtinkerî mebest jê. Bo mînak;  em peyva “rûvî “ dê cudahîya di navbera wateya hoşekî û wateya barkirî da bidine dîyarkirin. Bo mînak ;




3 - Wateya Şêwazî

Wateya şêwazî li dû pile, asta rewşenbîrî, komelayetî û axivtinkerî tê guherîn (Xazî Hesen, 2020: 76). Anko şêwazê vegotinê û di biwarên cuda da dibe egerê peydabûna cûreyên wateyê. Bêguman şêwazê derbirînê roleka kartêker heye li ser wateyê û şêwaz jî di ast û qonaxên cuda da tê polînkirin. Bo mînak; zarok dibêje “be'ê”, lê belê mezin dibêje “bizin”. Herwisa asta rewşenbîrî li şêwazê wateyê diguhêre. Bo mînak;

| <u>Xwendevan</u> | <u>Nexwendevan</u> |
|---|---|
| Erd | 'Erd |
| Cigare | Kicare |
| Befr | Berf |

4 - Wateya Derûnî û Karîgerî

Vê cûre wateyê girê daye bi barê derûnî yê takekes bi kar tîne û ev çend pitir ji wateyekê bi xwe ve digire ku ji layê takekesî ve dirust dibe (Hesen, 76). Anko barê derûnî yê takekesî dibe egerê xuyabûna wateyên cûrebicûr û zorbeya caran jî axivtinker li dû hez û arezuyên xwe xeber dide li jêr bandora hest û sozan. Anko hest û

soz li ser axivtinê dizalin. Bo mînak; li ser herêma Kurdistanê eger kurdek yan erebek navê wê bibêje:

A - Kurd: Ez çûme herêma Kurdistanê.

B - Ereb: Ez çûme bakurê Îraqê.

5 - Wateya Rengvedanê

Ew wate ye ya ji encama hebûna du wateyan bo têgeha yek peyvê bi dest ve tê ku yek ji wateyên peyva rengvedanê ji wateya dî dike ya derbirînê jê dike yan ya amajê pê dike (Şêrzad Sebrî, 2015: 238). Bo mînak; dema me guh li peyva “mar” dibe, ji bilî ku bi wateya bûnewerekî dîyarkirî tê, di heman demê da rengvedana tirsê dike di nav zimanê rojane da dema me guh li peyva “mar” dibe bîra me bi gezandinê tê berî hizrê di hebûna bûnewerekî da bikin ku navê wî mar e.

6 - Wateya Pêkvehatinê

Wateya pêkvehatinê ew hevalînî ye ya di navbera du peyvan da dirust dibe û yek yekê bo layê xwe radikêşîne (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2010: 100). Bo mînak; peyva “zer”:

Zer → Çav / Çiya / Pirç

Ku wate, eger ev hevalînî hate bezandin dê bibe egerê neasayîya wateyê. Bo mînak ;

A - Êvarî baş.

B - Êvarî xweş.

Rast e ku peyva “baş” û “xweş” nêzîkî hevdu ne, lê hevalînîya di navbera “êvar” û “baş” da hevalînîyeka temam û dirust e. Belê, hevalînîya “êvar” û “xweş” ne pesend û guncav e û ji binemayên hevalînîyê hatine bezandin.

7 – Wateya Babetî

Wateya babetê ew wate ye ya ku axivtinker yan nivîser bi şêweyê rêxistina mebesta xwe digêhîne. Li dû xwesta wî dimîne çi keresteyeka zimanî pêş bixe yan bibe dûmahiyê ka çi tişt li dev wî giring e û çi giring nîne. Anko bi tenê li ser peywendîya pêkhateyên zimanî ranaweste, belku hilbijartina pêkhateya di nav hemû zincîra risteyê da giring e bo gihandina mebesta xwe (Muhemed Merûf Fetah, 2011: 165). Anko ev wate, bi rêxistina hêzê li ser yekeya zimanî dirust dibe, ka axivtinker yan nivîser stresê dixe ser kîjan peyva risteyê ku mebest jê ew peyv pitir ji yên dî li dev wî giringtir e. Bo mînak;

A- **Min xezal li çiyayî dît**.

B- **Min li çiyayî xezal dît**.

Di risteya yekê da mebesta axivitinkerî “xezal” e ku hêz êxisitiye li ser peyva “xezal”ê, lê di risteya duyê da mebest jê peyva “çiya” ye. Li dev axivtinkerî giringtir e ji peyva xezal, ji ber ku hêza gotinê li ser peyva çiya pitir rawestiyaye ji peyvên dî. Anko li dû şêwaz û mebesta axivtinkerî û yan nivîserî wate tê guherîn.

Herwisa dabeşkirineka dî ya wateyê bi vî rengî bo cûreyên wateyê hatiye kirin :

1- Wateya Sereke,

2- Wateya Lawekî,

3- Wateya Şêwazî,

4- Wateya Amajeyî (Menqur Ebdulcelîl, 2001: 68).

Eger em sehî bikine vî cûreyê dabeşkirinê digel dabeşkirina lîcî ku xala yekê, duyê û sêyê wekhev in digel hindek ji wan xalên lîcî behs kirîn. Belê bi tenê digel xala çarê cudahî heye, ew jî wateya “amajeyî” ye, mebest ji vê wateyê amajekirina peyvên tak bi rûdan yan tiştên dîyarkirî ve. Bo mînak; peyva “metirsî” amajeyê bo nexweşîyekê dike yan peyva “xwaringeh” amaje ye bo xwarinê. Hindek peyvên dî hene ku nahên dirkandin, wekî peyvên asayî amajê bi hindek tiştan dikin ku mirov tê digêhe. Bo mînak; tilîlîyên jinan amaje ye bo xweşîyê yan fîtika şivanî amaje ye bo gazîkirina pezî. Herwisa zimanvanê kurd Ewrehman Hacî Merif bi tenê du cûreyên wateyê dest nîşan dike:

1- Wateya Rasteqîne,

2- Wateya Mecazî (Ewrehman Hacî Merif, 1975: 10- 11).

1- Wateya Rasteqîne

Ev cûreyê wateyê her bi wateya hoşekî yan sereke yan ferhengî tê hejmartin ku wateyeka dîyar û berçav e û rêkeftina komelgehê li ser heye û em bi rêya qutabxane û perwerdeyê fêrî vê wateyê dibin û wateyeka çespayî û neguhor e ku bi wateya semantîkê tê navbirin. Bo mînak; gul, dar, çiya, ber û hwd. ev peyv derbirînê ji wateya rastûrast wî tiştî dikin yê ji derveyî zimanî.

2 - Wateya Mecazî

Wateya mecazî ew wate ye ya ku tu tiştekî bibêjî mebesta te pê tiştekî dî ye. Anko wateyeka veşartî û kûr e û hemû kes tênagêhin. Ev cûreyê wateyê bara pitir di nav deqên edebî da tê bikaranîn û taybetî di nav deqê şiirê da roleka berçav heye. Bo mînak; dema tu bibêjî keçekê "Tu gul î", ew bi xwe mirov e, lê belê mebest jê ciwanî ye, ku gulê sifetê ciwanîyê heye û keçik bi gulê hatiye şibandî. Mînakeka din dema tu dibêjî kesekî "ziman dirêj" vê ji wateya rasteqîne la daye û bo mebesteka menewî hatiye bikaranîn ku zimanê wî wekî qebare ne dirêj e, belku mebesta wî gotinên neciwan û kirêt in. Herwisa Dr. El Seîd El Erebî wateyê dabeşî pênc cûreyan dike:

1- Wateya fonolojî,

2- Wateya morfolojî,

3- Wateya ferhengî,

4- Wateya sentaksî,

5- Wateya komelayetî (El Seîd El Erebî Yusif, 2016: 3).


Eger em boçûna Seîd Erebî polîn bikin dê bibînin qala dû cûreyên sereke kiriye ku ew herdu cûr mijara lêkolîna me ne bi vî şêweyî:

1 - Wateya fonolojî, morfolojî, ferhengî, sentaksî ev her çar cûre wateya semantîkê bi xwe ve digirin ku di nav zimanî da ne, ku di beşa yekê da me bi wateya dewrûberê zimanî bi nav kiribû. Anko ji tîpê dest pê dike heta bigêhe risteyê, wek rêziman û erka

pêkhateya yekeya zimanî di nav zincîra risteyê da. Herwisa behsa ferhengê kiriye, wekî cûreyekî wateyê, anko ferheng û yasayên rêzimanê wateya semantîkî pêk tînin.

2- Herwisa behsa wateya komelayetîyê kiriye ku di beşa yekê da yek ji cûreyên wateya nezimanî hatibû destnîşankirin, mebest ji wateya komelayetî ew hemû tiştên ji derveyî zimanî bi xwe ve dagirin û wateya deqî temam dikin bo gihîştina mebesta nivîserî. Anko dewrûberê ziman û nezimanî wateya pragmatîkî bi xwe ve digire.

Ev, hindek boçûnên zanayan bûn derbareyîî dabeşkirina wateyê da. Anko ev cudahî û nebûna polîneka yekgirtî bo cûreyên wateyê, ji ber alozî û nav yek da çûna babeta wateyê ye. Çunke wate bîyaveka berfireha merîfî bi xwe ve digire û berdewam di geşekirin û pêşveçûnê da ye. Lê bi şêweyekî giştî em dê qala du cûreyên sereke yên wateya deqî bikin, ew jî: Wateya semantîkî ya deqî û wateya pragmatîkî ya deqî ne, ku her yek ji wan jî dabeşî du cûreyên dî dibe bi vî rengî :




### 2.1.1. Wateya Semantîkî Ya Deqî

Wateya semantîkê bi wateya bineretî ya deqî tê hejmartin û li gorî ferhengê serederî digel da tê kirin û ew peyva di nava risteyê da û bi harîkarîya peyvên dewrûberên wê û yasayên rêzimana wateyê dibexşe, ku wateyeka cêgir û neguhêre. Çunke rêkeftina civakî li ser wê peywendîya di navbera form û wateyê da hatiye kirin û bi yasayên sentaksê hatiye rêxistin. Anko wateya semantîkê ew cûre wate ye, ya girêdayî peyv û wateya hoşekî û ferhengî, ku bi rêya sîmayên wateyê dirust dibe (Sefiye Mitehrî, 2003: 13). Wek peyva “zilam” ku xwedanê van sîmayên wateyê ye :

Zilam
+ Mirov
+ Nêr
+ Xêzandar
+ Pêgihîştî

Herwisa peyva “kur” xwedanê çendîn sîmayên cuda û hevbeş e digel peyva “zilam”î. Bo mînak ;

Kur
+ Mirov
+ Nêr
+ Zigurd
± Pêgihîştî

Anko hoşekîya peyvê wateyeka dîyar û ferhengî û asan heye, ku hemû takên civakî li ser wê wateyê rêkeftine, ya tê bikaranîn wateyeka xwedîyî û taybetî nîne, ku rêkeftina du kesan yan çend kesên dîyarkirî li ser hebe, belku wateyeka giştî û berbelav e di nav civakî da û hemû agahdar in li ser wê wateyê. Anko wateya semantikê girêdayî wateya peywendîyê ye, ku watepeyva bi rêya peyvên berî wê û piştî wê bi dest ve tê li jêr karîgerîya yasayên rêzimanê (Şêrzad Sebrî, 2011: 75). Bo mînak; wekî van risteyên xwarê:

1 - Min ciwan dît.

2 - Ciwanê ez dîtim.

3 - Min pirtûk bo ciwanê anî.

4 - Ew keç ciwan e.

5 - Ew ciwan dinivîse. Anko ferheng + yasayên rêzimanê = wateya semantîkî.

Anko wateya semantîkî bi harîkarîya ferheng û rêzimanê bi dest ve tê ku ji van her du astan derbaz nabe, ew jî:

### 2.1.1.1 . Wateya Erkî

Mebest ji wateya erkî wateya rêzimanî ye, ew wateya peyv ji peyvên dî yên dewrûberên nêzîkî xwe werdigire yan ji cihê xwe werdigire (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2014 : 104). Anko bikaranîna peyvê di nava risteyê da û pêkvegirêdana wê bi yasayên rêzimanî (fonolojî û sentaksê) anko “form û digel “semantîk”ê anko “naverok”, wateya semantîkê pêk tînin, ku wateya rasterasta peyvê û risteyê ye li cihê xwe yê rêzimanî û peywendîya wan digel peyv û risteyên berî û pêşî xwe heye. Anko li vir her ladaneka di forma rêzimanê da dirust bibe, dê bibe egerê guherîna wateyê û berûvajî. Bo mînak;

A- Min pirtuk xwend.

B- Xwend pirtûk min.

Di vê risteyê da yasaya sentaksê hatiye binpêkirin, her çend em di wateya wê digêhin, lê belê ji layê rêzimanê ve ne pesend e. Ya dirust.

2- Pirtûkê ez xwendim: Di vê risteyê da yasaya semantîkê hatiye binpêkirin, ku ne dirust e pirtûk mirovî bixwîne, lê belê ji layê rêzimanê ve pesend e.

Anko binpêkirin her yek ji astên sentaks û semantîkê dê bibe egerê ladana wateyê.

### 2.1.1.2. Wateya Ferhengî

Wateya ferhengî ew wate ye, ya ku em rasterast ji ferhengê werdigirin û li gorî yasayên lêksîkî hatiye rêxistin, ku wateya peyvê bi xwe ve digire û wateyeka bineretî û çespandî û neguhor e. (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2015 : 120). Bo mînak; gul = gul riwek, şêr = şêr giyanewer, wate çi şûlîyatî û mebestan bi xwe ve nagire. Di şirovekirina semantîkî ya deqî da van biwarên xwarê bi xwe ve digire:

1- Firehwate û hevbêjî. Bo mînak; Şîr ⟶ ( Yek peyv, du wate)

Şîrê vexwarinê. şîrê şerî pê dikin

2- Hevwate. Bo mînak ; Ciwan = Rind ⟶ (du peyv yek wate)

3- Dijwate. Bo mînak; nêr x mê. sar x germ ⟶ (tiştên berûvajî yek).

4- Dubarebûn. Bo mînak; Hêdî hêdî , zor zor ⟶ (dupatkirdin).

Anko jêdera wateya semantîkî ji ferheng û rêzimanê tê û helbet hizir jêdera sereke ye û bi rêya forma berceste dibe û bi rêkeftina civakî form tên destnîşankirin bo tiştên ji derveyî zimanî mebest pê "ten" e. Herwisa bo şirovekirina wateya semantîkî ya deqî pişt bi rêbaza ronankarî dibeste û bi van pêngavên xwarê deqî şirove dike :

1- Destnîşankirina deq û cûreyên wî,
2- Şirovekirina binyatê ji nav da yê deqî ji layê: deng, lêksîkî, riste, wate û hwd.
3- Deranîna wateya giştî ya deqî,
4- Destnîşankirina şêwazê lêkdan û rêyên guncavdina deqî,
5- Pêkvegirêdana encaman, boçûnên taybet û hilsengandina layenên xirab û başên deqî.(Sehîd Hesen Behrî, 2004 : 160 )

Anko semantîk wateya xwe ji rêxistina yekeyên zimanî û lêkdana yekeyên wateyê werdigire û derbazî cîhana derekî nabe. Ji ber hindê gelek caran wateya semantîkê wateyeka mijdar û şûlî ye, lewra pêdivî bi harîkarîya wateya pragmatîkê ye bo zelalkirina wate û bidestveanîna mebesta firêkerî.

### 2.1.2. Wateya Pragmatîkîya Deqî

Wateya pragmatîkî ne wateya tîp, peyv û ferhengê ye ku hemû civak li ser rêkefti bin. Anko wateyeka berze û veşartî ye û çend kesine dîyarkirî li ser rê dikevin, ku bikaranîna peyvê di nav dewrûberî da wateya pragmatîkî bi dest ve tê. Bi wateyeka dî wateya pragmatîkî ya deqî ji dewrûberî tê wergirtin, dema deqî ji layê pragmatîkê ve şirove dikin divêt bixine di nav dewrûberî da. Şirovekirina gotarê wê yekê dixwaze, ew barûdoxê tê da hatiye nivîsandin bo gotarê biê vegerandin (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2014: 105). Anko dewrûber, şirovekirina gotarê ji sinorê deqî derbaz dibe û hewl dide xwendineka hûr bo bike û hemû hêmayan şirove bike û tiştê negotî û veşartî dîyar û aşkera bike. Herwekî di wateya semantîkê da amaje pê hatiye dan ku çavkanîyên wateya semantîkê ji "karîgerîya rêziman + ferhengê" hatiye wergirtin. Lê pragmatîk wateya xwe ji "wateya zimanî + wateya dewrûberî" werdigire :

### 2.1.2.1. Wateya Zimanî

Wateya zimanî mebest jê wateya semantîkê ye ya me li serî behs lê kirî ku ji rêxistina peywendîyên rêziman û ferhengê wateya semantîkî berhem tê.

### 2.1.2 .2. Wateya Dewrûberî

Dewrûber çavkanîya herî mezin a berhemanîna wateya pragmatîkê ye. Çunke dewrûber bi tenê dikare wateya veşartî û tiştê nehatiye gotin dîyar dike. Mebest ji dewrûberî ew tiştên ji derveyî zimanî kartêkirinê li ser wateyê dikin (wekî; peywendîyên komelayetî, layenê derûnî, asta rewşenbîrî, îdeolojîya nivîserî û hwd.). Me di pişka yekê da bi dirêjî behsa dewrûberî kir. Bo ronkirin û şirovekirina wateyê, me pêdivî bi çar cûreyên dewrûberan hene (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2015 : 123) :

1- Dewrûberê Demî û Cihî: Ku nasnameya axivitinkeran di çarçoveyê dem û cihî dîyar dike. Herwekî Barhêl û Monitak dibêjin: Dewrûber beşdarbûnên axivtinê bi xwe ve digire di cîhana ketwarî (berdest) da.


2- Dewrûberê Pragmatîkî: Rêzbendîya kirdeyên zimanî bi xwe ve digire. Wek: pêşnîyar û redkirin û pratîzekirin.

3- Dewrûberê Karlêkirinê: Mebest jê rêzbendî û kirdeyên zimanî ji parçeyekî têkçûyî ku axivtinkeran li ser binemayê nûkirina axivtinkirîyê bi rê ve diçe. Wek: Pêşnîyar û redkirin.

4- Dewrûberê Derkeftin: Mebest boçûn û bîr û bawerîyên axivtinkeran bi xwe ve digirin. Anko dewrûber wateya semantîkî ron dike û tem û mijdar3iyê nahêle û wateya pragmatîkê temamkera wateya semantîkê ye. Anko “wateya semantîkê + wateya dewrûberî = wateya pragmatîkê”.

### 2.2. Binemayên Wateya Pragmatîkê

Her wekî amaje pê hatiye dan ku pragmatîk wateya xwe ji dewrûberî werdigire, ku dewrûber jêdera bexşîna wateya pragmatîkê ye,  heta ku ev wate bi dest ve bê, pêdivî hindek binemayan e  ku wateya pragmatîkî li ser bê damezirandin. Wateya pragmatîkê li ser çar binemayan hatiye avakirin.  Ew jî (firêker, wergir, babet, dewrûber) bi xwe ve digire (Muhemed Muhemed Yunis, 2007 : 151). Em di vî wêneyê xwarê da dê pitir ron bikin :




## 2.2.1. Şander

Firêker binemayê yekê ye ji wateya pragmatîkî, ku kiryara gihandinê ji wî dest pê dike dema bi firêkirina babeteka dî radibe ji bo wergir yan guhdarî çi bi rêya nivîsandinê be yan axivtinê be.

## 2.2.2. Wergir

Wergir senterê prosesa gihandinê ye ya ku peyama firêker werdigire û şirove dike, ku di gihandina nameyê da wergir armanc e. Herwisa wergir biryarê li ser wateya deq, pesendî û nepesendîya deqî dide.

## 2.2.3. Babet

Naveroka wê peyamê ye, ya firêkerî  bi rêya  hêmayên zimanî  yan ne yên zimanî, arasteyî wergirî dike, ku firêker û wergir dikevine di haletê peywendîkirinê da, çi bi şêweyekî rasterast be yan nerasterast.

## 2.2.4. Dewrûber

Herwekî çendîn cihan me amaje pê daye ku dewrûber lêkolînê li mebesta firêkerî dike, ya di sinorê semantîkê da tem, mijdar û şûlî mayî ku dewrûber bi rêya dewrûberê zimanî û nezimanî wateya mebestdar bi dest ve tine. Bo nimûne: "dîwar bi guh in." Eger em vê gotinê di nav dewrûberî da şirove nekin, em tênagêhin. Çunke binemayê wateyê hatiye bezandin. Lê dema dixine di nav dewrûberî da çendîn wateyan dibexşe. Wekî:

1- Te hay ji axivtinên xwe hebe.
2- Nehênîyan biparêze.
3- Li vir casûs hene.
4- Dengê xwe kêm bike.

Eger dewrûber nebe, em neşên (nikarin) bi rêya semantîkê van wateya hemûyan bizanin. Lewma pragmatîk pêdivî bo wek zanisteka serbixwe peyda be, bo ronkirina wateyên şûlî û dîyarkirina mebesta axivtinkerî.

### 2.3. Şirovekirina Deqî

Şirovekirin û hewla têgihîştinê dîyardeyeka kevnar a mirovayetîyê ye. Her ji kevn da mirovan hewl daye, ku dîyardeyên gerdûnî şirove bikin û têbigêhin, da ku xwe ji metirsîyên siruştî biparêzin. Her digel hebûna mirovayetîyê çendîn pêxember û zana peydabûn ji bo şirovekirin û rêxistina yasayên jîyanê û arastekirina mirovayetîyê berev buhayên bilind û rewişt û kiryarên ciwan. Helbet binaxê zanistî yê şirovekirina deq û gotarê bo du hezar salan berî niha dizîvire. Anko bo serdema belavbûna rewanbêjî û serdema çawanîya dirust axivtinê vedigere. (Ebdilselam û Şêrzad, 2011: 247). Lê şirovekirina deqî wekî yekeyeka wateya mêjûyeka kevnar nine. Belku serdema peydabûna teorî û qutabxaneyên zimanvanîyê vedigere û peydabûna liqên zimanvanîyê bo egerê parçekirina zimanî û peydabûna yekeyên serbixwe, ku deq yek ji wan yekeyan e. Deq yekeyeka semantîkî ye û peywendî bi wateyê ve heye ne bi formê ve (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2005 : 43). Anko şirovekirina deqî yeksan e bi wateyeka

serbixwe û parastina yekîtîya deqî û peywendîya di navbera risteyan da heye ku deqî ji parçebûnê berev yekîtîbûnê dibe.

Herwisa peydabûna çendîn teorîyên şirovekirinê, bo mînak teorîya Hermenutîka, ku ji peyva grekî hatiye wergirtin mebest jê “şirovekirin, aşkerakirin, ravekirin”ê tê û herwisa hermenutîka bi ramana hunerê têgihîştin û ravekirina deqan tê û dîsa rih û rîşalên hermenutîka bo wan ravekerên serdema kevn dizîvire û di gotina “kahin” wek şirovekar û pêşbînîkirina kesên oldar. Paşî vê zanistê hindek biyavên dî bi xwe ve girtin, wekî ravekirina deqên klasîk, yên ayînî û yasayî. Mişîr Basir derbareyî hermenutîka dibêje : navê hermenutîka bi wan vekolîna ve hatiye girêdan, yên ku ji layê ayînê mesîhî û yehodî ve hatine encamdan ji pêxemet şirovekirina deqên ayînî (Ebdî Hacî, 2008 : 83). Paşî ayînê pîroza îslamê hate di gorepanê da û deqên Qurana Pîroz li dû pêşveçûna sentaksê dihatine şirovekirin. Anko raveker egerê pêdivîyatîya van hersê ayînan bû, ji bo şirovekirina deqên ayînî û dîyarkirina wate û mebestên wan bo xelkî.

Herwisa di sedsala 19an da hermenutîka wek teorîyeka zanistîya serbixwe peyda bû bi awayekî giştî giringî da teorîyên şirovekirinê ji pêxemet gihîştina ramana deqan. Di vî biyavî da ev zanist di nav karên çendîn hizirmendên almanî da hate çespandin û ev hizirmend li pêşîya wan tên (Şilayr Maxir, Fîlhim Dîlitay). Herwisa di sedsala 20an da ev zanist di nav berhemên van hizirmendan da hate bercestekirin (Gadamir–Almanya, Baxtîn–Rûsya û Pul Rîkur–Fransa). Şirovekirin di pirtûka “Rêberê Rexna Edebî” da bi ramana destnîşankirina wateya zimanvanî di karên edebî hatiye. Ev çend bi rêya şirovekirin û dubare dariştina peyvan tê kirin (Mîcan Alruylî, Sedî Albazî, 2004 : 88).

Herwisa Şlayr Maxir bi nav û dengtirîn zanayê ayînê mesîhî bû, gelek giringî bi şirovekirinê di da û bi dîtina mêjûnivîsên zanista şirovekirinê zanayê navbirî bi babê zanista ravekirina nû tê hejmartin, ku Şilayr Maxrî têgihîştin kire senter bo hermenutîkayê û navbirî şirovekirina deqên ayînî li dû praktîzekirina deqên neayînî encam dan û yasayên guncav bo têgihîştina deqan danan û giringî bi dû xalan da (Ebdî Hacî, 2008 : 85) :

1- Giringî bi rêzimana deqî bê dan.
2- Jiyannameya nivîserî bê zanîn.

Anko  dewrûberê zimanî ku ji rêziman û semantîkê pêk tê, di nav deqî da û dewrûberê nezimanî  ku jîyana nivîserî bi xwe ve digire  ku ji derveyî deqî ye. Yasayên rêzimanê wateya semantîkê dide me. Jîyana nivîserî  wateya pragmatîkê dide me.

Armanc ji şirovekirin û ravekirina deqî bêguman bo têgihîştina deqî ye. Ew peywendîya di navbera "daner û deq û ravekerî" da têgihîştinê peyda dike. Helbet têgihîştin û ravekirin du qonaxên ji hev cudan e ji layê zimanvanîyê ve "têgihîştin" girêdayî bi gihîştinê ve ye. Anko hêza fikrî û derkkirinê ye. Belê,  "ravekirin"  di pileya duyê tê ku tiştekî dixe ser têgihîştinê. Derbareyî cudahîya di navbera "têgihîştin" û "ravekirin"ê da Kiladînyos dibêje: Dema ku mirov nikare di karê mêjûyê bigêhe di wê demê da dê bi karê ravekirinê rabe (Ebdolmutelîb Ebdullah, 2008: 107). Wate, têgihîştin binyat e û ravekirin çalakîyeka lawekî ye. Herwisa ji bilî  ravekirin û têgihîştinê çemkê lêkdanê jî di navbera têgihîştin û ravekirinê da niwandin û lêkdana derencamî dike. Ku wate, kirdeya şirovekirina deqî  pêdivî  bi erk, dem, şarezayî û lêkdanê ye. Şirovekirin hewla vedîtina tiştên veşartî dide di nav peyama deqî da, çi peyama nivîsî be yan dîtbarî be. Deq bîrdanka sîstema pêzanîna komelgehê ye. Anko rengvedana rewşenbîrîya komelgehê ye bi dirêjîya mêjû û sinorên cografyayê û peywendîya di navbera takekesan da ye. Li ser destnîşankirin, ronkirin, şirovekirin û dîyarkirina parçeyên deqî, rexnegir cextê li ser ziman, şêwaz û peywendîya alûgorkirina di navbera beşê û giştî da dike, heta ku wateya wê ron û kurt bike û bikare pêzanîna bi şêweyekî lojîkî rêxe bo têgihîştinê. Ji ber hindê xwendina bilez bo deqî bi şirovekirin nahê hejmartin. Lê belê eger xwendevan bi hûrî li ser deqî rawestiya û cext li ser peywendîya di navbera risteyan da kir û agehdar bû li ser wateya peyvan û wateya komelayetî û binemayê îstatîkî û layenên baş û xirabên deqî hatine hilsengandin, li wê demê dê biçe jêrxaneya rexnegir û çêjwergirtina edebî (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2012 : 102-103).

Anko du xwendin bo deqî  tenê kirin. Xwendineka bilez û serve û serve, ku wateya wê ya dirust û rasteqîne xuya nabe û di xwendevan nagêhe wate û mebesta sereke. Ya dî xwendineka kûr, hûr û parçekirina deqî, lêkdan û şirovekirina gişt avahîya deqî û gihîştina wateya dûmahîkê. Ev çend jî bi xwendineka asayî nahê bidestveanîn, heke bi çavekî rexnegirane nehê xwendin û şirovekirin. Wate û mebest du tiştên jêk cuda ne. Wate berfirehtir e ji mebestê, ku wate ji wateya ferhengî, peyv, wateya rêzimanî, riste û

wateya deqî bi xwe ve digire di sinorê semantîkî da. Lê belê wateya mebest ew wate ye, ya firêkerî mebest jê, ev çend jî diçe jêr sinorê pragmatîkê ku wateya xwe ya sereke ji dewrûberî werdigire. Takekes cîyawaz in di dirkpêkirin û dîyarkirina sîmayên wateyê da. Her ev çend dibe egerê lêkdan û bîr û boçûnên cîyawaz. Çunke deq firehwate ye û xwendevan jî hevbeş e digel danerî bo formekirina wateyan. Şirovekirina deqî bo armanca gihîştina têrkirina derûnî vedigere.

Armanca me ji lêkdana derûnî dirkpêkirin û gihîştina wê wateyê ya ku nivîserî mebest jê, eger em her deqekî bidin çend kesan bo şirovekirinê, bêguman wate û lêkdanên wan dê jêk cuda bin. Çunke şiyan, şarezayî, hest û sozên xwendevanan cîyawaz in û çi ji van lêkdana jî wateya deqî bi dûmahî naînin. Çunke deq bo xwendevanî hatiye nivîsandin û azad e di şirovekirina wateya deqî da. Bo şirovekirina her deqekî peywendî bi sê rehendên zimanvanîyê ve heye. Ew jî :

1- Rehenda sentaksî : Peywendîya di navbera pêkhateyên risteyê şirove dike.
2- Rehenda semantîkî: Bi lêkdana peywendîya di navbera peyam û cîhana ketwarî da radibe.
3- Rehenda pragmatîkî: Peywendîya di navbera peyam, firêker û wergirî da bi rê dixe. (Muhemed Salim Sedullah, 2007: 26).

Halîda bo şirovekirina deqî behsa sê erkan dike. Ev erk jî bi harîkarîya prosesa pêkvegirêdanê peyda dibin. Bi vî rengî:

1- Erka hizrê: Hizir ji rengvedana ketwarî ye, ku hilgira naveroka axivtinê ye, ku axivtinker behsa ezmûn û hesta xwe li hember cîhana ji derve dike. Wekî dîyarkirî hizir jêdera sereke ya jidayîkbûna deqî ye.

2- Erka kartêkirinê: Ziman bi erka dirustkirina peywendîyê,parastin, cîgirkirin û rêxistina peywendîyên civakî radibe û axivtinker yan nivîser mifayê ji dosyayekê werdigire heta bi harîkarîya wê peywendîyê digel kesên dewrûber yan wergirî da bike. Bi vî rengî zanyarîyekê dide, fermanekê dide, pirsyarekê dike û encamdana xizmetguzarîyekê pêşnîyaz dike.

3- Erka deqî: Ev erk li ser binaxeyê herdu erkan (hizr û kartêkirin) dirust bûye. Bi şêweyê axivtin û nivîsînê yan her şêweyekî din bi rê dixe û bo kesê beramber vediguhêze. Anko li vê derê deq bi erka veguhestina zanyarîyan radibe ji firêkerî bo

guhdarî. Wekî me di pîverên deqî da behs lê kirî ku yek ji pîverên deqî gihandin e ( Ebdilselam û Şêrzad, 201: 253).

Bi dîtina Comskî baştirîn rê bo vekolînên zimanî vekolînên eqlê mirovî ne. Lêkolînên ciwankarîyê bi rêya sîma û wateyan şiyane cûreyek ji peywendîyên axivtinê bînine holê. Di vê yekê da şairî rola axivtinkerî yan hişyarkerî dîtiye bi rêya hunerên rewanbêjîyê. Wek: xwaze, xwestin dirke û hwd. vê yekê jî bargiranî xistiye ser xwendevanê asayî. Bo vê çendê pêdivî kesekî şareza heye bo lêkdana wateya deqî. Şirovekar pêdivî sê mercan e:

A- Zanîna pisporîya taybet mercek e bo ravekerî. Çunke gelek zanyarî pêdivî ne ku zorbeyîya wan peywendî bi paşxaneya pisporîya wî xwe ve hene.

B- Zanyarîyên nav deqî: Wan zanyarîyan bi xwe ve digire yên ji encama şirovekirin û lêkdanên têne nav deqî.

C- Zanyarîyên ji derveyî deqî: Wan zanyarîyan bi xwe ve digire, yên ji encama lêkdan û ravekirina ji derveyî deqî sûd jê tê wergirtin. Wek; ferheng, kitêb, belgename û harîkarîya kesên şareza. (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2015: 126).

Anko şirovekirina deqî kurtkirin, puxtekirin û wateya giran a deqî bo xwendavanî hêsan dike. Çunke zanyarîyên nav deqî giran in û zorbeya caran nerasterast tenê arastekirin. Lew me gelek pêdivî bi zanista pragmatîkê heye bo şirovekirinê. Çunke raveker bo şirovekirina deqî pêdivî ye bo dewrûberê deqî vegere ku deq tê da hatiye gotin. Ev kar jî bê pragmatîk nahê encamdan. Pêngavên şirovekirina wateya pragmatîkî ya deqî:

1- Şêweyê gotarê: Mebest jê pêkhateya zimanê gotarê ye ji layê şêweyê deqî û mercdarên deqî, wekî mikumkirin û pêkvegirêdana parçeyan bi amrazên girêdan, dubarekirin, vegerandin, labirdin û hwd. Herwisa vavartina deqan li gorî serdem, îdeolojî, dab û nerîtên cûrbicûr.

2- Naveroka gotarê: Naveroka gotarê peyama deqî bi xwe ve digire, ka çi wate hilgirtiye û digel berçavkirina kartêkirinên di navbera peyv û risteyan û çûna di hindirê ji nav da ya deqî û deranîna wateya kûr a deqî.

3- Dewrûberê gotarê: Dewrûberê gotarê çarçoveya zanîn, kultur, komelayetî û îdeolojîyan bi xwe ve digire û kartêkirinê li deqî dike û deqekî dî li ser tê ava dikin (Welîd El-Înatî, 94: 2010).

Bo şirovekirina gotarê yan deqî pêdivî ye bersiva van pirsyaran bê dan:

1- Axivtinker kî ye ji deqî?
2- Wergir kî ye?
3- Babet çi ye?
4- Mebest jê çi ye?
5- Em çawa tiştekî bibêjin û mebesta me tiştekî din be?
6- Em çawa tem û mijdarîyê ji kirdeyên peywendîkirinê nehêlin?
7- Axivtin li kû derê ye?

Bo bersivdana van pirsyara li dû boçûna Van Dayk dibêje: Deq yan gotar kirdeyeka axivtinê ye. Li gorî teorîya kirdeya axivtinê herdu zana (Ostin û Sêrêl) amajê pê dikin bo wergirtina wateyeka hûr giring e em ji çarçoveya bertenga dewrûberê zimanî derbiçin bo dewrûberê derûnî, komelayetî, kulturî, endêşeyî û hwd. Anko bo bidestveanîna wateya pragmatîkî dewrûberê nezimanî binemayekî herî giring e bo zanîna mebesta firêkerî, ku dewrûber xala sereke ya cudahîya di navbera semantîk û pragmatîkê ye.

## 2.4 . Qonaxên Şirovekirina Deqî

Şirovekirina deqî kirdeyeka hilweşandinê ye, ku bi agahî û bêagahî tê encamdan di dema şirovekirina deqekî yan gotarekê da. Bi dîtina Halîdayî, dewrûberê deqî dû ketiyê deqê aşkera ye û pirek e bo girêdana zimanî bi jîngeha ji derveyî deqî. Qonaxên şirovekirina deqî lênêrînên cûrbicûr hene. Bo mînak Bucrand û Disilir bo qonaxên berî lêkdanê van pêngavan diavêjn:

1- Destpêkirin ji pêkhateyên serveyên deqî,
2- Şirovekirina peywendîyên asoyî yên di nav deqî da,
3- Çalakkirina boçûn û peywendîyên xezinkirî di nav bîrdankê da. Ku wate qonaxa bîranîn, boçûn û plandananê.
4- Dîyarkirina kar û kardaneveyan (Seîd Hesen Behrî, 2001 : 160).

Deq pêdivî bi şirovekirineka hûr e. Çunke raveker xwe di nav du cîhanan da dibîne. Ew jî cîhana ketwarî û cîhana dahênanê ye. Raveker hevbeş dibe digel danerî bo gihandina wê wateya dîyar dike ku diçe di nav wateya deqî da. Lêkdan û kurtkirin dê bibe egerê têgihîştin û gihîştin bo derencameka dîyar. Guherîna hêmayekî bi hêmayekî rontir di nav deqî da girêdayî bi zanista pragmatîkê ye. Lêkdan, şiyan, têgihîştin û zanînê pêdivî ye bo dîyarkirina wateya risteyê digêhîne. Ev jî girêdayî ye bi paşxaneya rewşenbîrî ve. Anko divêt şiyanên lêkdan û şirovekirina risteyên aloz hebe. Beşek ji şirovekirin û desthilatê dikeve ser cudakirin û dîyarkirina wateya deqî. Pêdivî ye raveker xwedan zanîn be derbareyî rehendên cih,dem, derûnî û komelayetîyê. Erka ravekerî şirovekirin nîne, belku dubarekirina dariştin, dirkpêkirin û boçûna kesî ya xwe bixwe ye. Anko raveker jî beşdar e di avakirina deqekî nû da. Bi awayekî giştî em dikarin qonaxên şirovekirina deqî bi ser çend qonaxan parve bikin:

1- Qonaxa xwendinê,
2- Destnîşankirina hizrên sereke,
3- Zanîna jîyana nivîserî û jîngeha wî,
4- Xwendina hest û sozên nivîserî,
5- Şêwazê nivîserî,
6- Hilsengandin û biryardan (Wikarad.com \\hittp :).

### 2.4.1. Qonaxa Xwendina Deqî

Xwendin pêngava yekê ya şirovekirina deqî ye. Pêdivî ye xwendevan destpêkê bi şêweyekî giştî deqî hemûyê baş bixwîne û hemû kodan bişikêne û pişkinîna hemû parçeyên deqî bike. Bi çend pêngavan:

1- Derbirîn: Derbirîn ji deng û wêneyê dengî û hêmayan bi xwe ve digire. Wek; bêjer û pêşkêşkar ku wateyeka ron bigêhîne.

2- Jiberkirin: Jiberkirin bi girêdayî xwendina çendîn caran yek li dû yekê yan parçe parçe, ku giringîyê dide peywendîyên deng û wateyê heta ku wêneyê wê di bîrdankê da kopî dibe. Wekî xwendina qutabxaneyê, şano, niwandin ...

3- Têgihîştin: Ev çend jî pêdivî xwendineka hêdî û hêdî bi ser xwe heye heta ku wateya peyvan, risteyan, peywendîyên rêzimanî, hunerî û livînên parçeyên deqî û hemûyan pêkve girê bide, şirove bike û dariştineka nû jê wergire, wekî xwendina zankoyê.

4- Tam wergirtin: Xwendineka serxwe û kûr ku tê da ronanên ser û jêrve û risteyan lêk dide û wateyan bi hûrî rêz dike û çespandina bîrokeya sereke û êxistina di nava hindirê deqî da, heta rehendên bîrkirin, derbirîn, wênekêşan û girêdana beşan destnîşan û xuya bikin. Bi dewrûberê zimanî, komelayetî, sîbera wateyên rûdan, hilçûn û karîgerîyên derûnî hest pê bike û ciwanîya wan dîyar bike, ev cûre xwendin e, ji layê rexnegir û şirovekaran xuya dibe (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2012 : 105).

Di vê derê da dîyar dibe, ku xwendevan beşdar e di nivîsîna deqî da. Çunke livîna kirdeya derûnî berpirs e ji vekirina kodan û hilsengandin û berawirdkirina peywendîyan di navbera form û wateyên risteyan û deqî da. Anko xwendin kirdeyeka lêkdanê ye û di şîyan da ye ronahîyê bixe ser pêkhateyên ji navdayên deqî. Ku wate, xwendin kiryareka derûnî û dirkkirinê ye.

### 2.4.2. Destnîşankirina Fikrê

Şirovekirina naveroka deqî û çendîn peregraf û riste û parçeyên deqî bi xwe ve digire. Fikir û wateya deqî bi rêya çend xalinan tê şirovekirin, ku ji têgihîştina pêkhateyên ji nav da ya deqî pêk tê. Wek:

1- Dîyarkirina teweran û destnîşankirina fikrên bineretî û destnîşankirina kurteya boçûnên sereke û paşan destnîşankirina encam û rêxistina bîr û boçûnan.

2- Sûdwergirtin ji bona nav û nîşanên deqî. Ku pêdivî ye nav û nîşanên deqî rengvedana naverokê bike.

3- Dabeşkirina deqî bo ser çend birge û yekeyên hûr ku serbixwe ne ji layê wateyê ve û xizmeta boçûnên giştî da ne.

4- Pêkvegirêdana bîr û boçûnan: Bêguman palderek heye bo dahênerê deqî. Çunke kes nikare tiştekî bi xurtî li ser nivîserî bisepîne û nivîser jî pêdivî ye rêzê li eqilyeta xwendevanî bigire û bîr û boçûnan bi şêweyekî guncav bixe berdestên xwendevanî. Lê belê eger babeta deqî taybetmendîyeka zanistî û felsefeyî hebe yan şirovekirin meseleyeka komelayetî yan ayînî yan ramyarî bo rêxistna boçûnan roleka mezin nabe,

belku divêt nivîser bîr û boçûnan bi rêya pêşekî û encaman bixe berdest û belgeyên pêdivî bo gotinên xwe bîne an divêt babetê bi şêweyekî lojîkî dîyar bike.

Bo girêdana bîr û boçûnan sê kêşe tên pêş :

A- Neguncandin di navbera hizrekê û hizreka dî,

B- Dema ku boçûn têk diçin û birgeyek yan fikrek gelek dubare bibe,

C- Dema ku boçûn dijî yek bin, ev jî kêm û kasîyeka wijdanî tê hejmartin û ji bihayê nivîserî kêm dibe. Çunke helwestê bi ronî yeklane kiriye li ser wê babeta nivîserî azirandî, ev çend jî dibe egerê nîşandana dûdilîya nivîserî dîyar dike. Dema hizrekê derdixe û paşî hizrên dî bi pêçewan e dîyar bike.

5- Hebûna yekîtîya organî ji çinîn û ristina deqî bi şêweyekî be ku hemû beş pêkve girêdayî bin û nabe pêş û paşkirin di hizran da hebe. Yekîtîya organî sê mercên wê hene:

A- Yekîtîya babetî,

B- Yekîtîya hestan,

C- Rêxistina hizir û wêne li jêr herdu binemayên yekîtîya babet û yekîtîya hestan e. Bi şêweyekî her fikrek û wêneyek bi erka xwe rabe bo geşekirina karê hunerî.

6- Wergirtina kûratîya wateyê ji sinorê peyvê derbaz dibe bo wateya dirkpêkirinê. Anko têgihîştina wateya dirust a peyvê.

### 2.2.3. Zanîna Jîyana Nivîserî û Jîngeha Wî

Zanîna jîyana nivîserî û ew jîngeha tê da perwerde bûye û bîr û boçûn û îdeolojîya nivîserî kartêkirineka rasterast li ser wateya deqî heye. Bi taybet layenê wijdanî, derûnî û hest û sozên nivîserî taybet yên helbestvanî. Çunke hest û sozan pitir hemû deqan di nava helbestê da rengvedaneka kartêker heye. Herwisa ew jîngeha tê da mezin bûye û ew hemû tiştên dewrûberên wî kartêkirinê li ser wateya deqî dikin û taybet zanîna van li dûrî jîyana nivîserî zor giring e. Wek; (http\\ : wikarad.com)

1 - Cihê ji dayîkbûn û mezinbûna wî,

2 - Dema jidayîkbûna wî û ew serdema tê da jîyaye,

3 - Îdeolojîya wî ya taybet, wek dîndar e, bê bawer e û hwd.

### 2.2.4 . Hest û Sozên Nivîserî

Soz ramana sereke ya derûnî û menewî ya şiirê ye û regezeka binçîne ye di hemû berhemên edebî da. Ji ber vê yekê şirovekirina sozê di deqî da gelek giring e. Çunke peywendîyeka rasterast bi derûnîya helbestvanî ve heye. Herwisa soza peywendî bi hindirê şair û cîhana dewrûberî ve heye û girêdayî rûdanên xweş û nexweşên şair tê da derbaz dibe (www.hawler.in). Anko hest û soz binemayekî giring e bo şirovekirina deqê edebî, têkilbûna nivîserî û babetê dîyar dike û bi şêweyekî deqê edebî ji deqên dî cuda dike. Em dikarin hest û sozan li ser sê rehendan parve bikin:

**Rehenda Yekê** :

Cûreyên Sozan :

Hest û soz cûrbicûr in û li gorî helwestê têne guherîn. Wek;

1- Soza Mirovayetî: Wek; hezjêkirina çakîyê û karên baş.

2- Soza Siruştî: Wek; soza dayîkînî, babînî û dilovanîya zarokan bo dayîk û baban.

3- Soza Şanazîyê: Wek; soza ayîn, nîştiman, eşaîr û kesayetî.

4- Soza pevçûn û bergirîkirinê.

5- Soza dilovanîyê bo bê desthilatan, azarkêş û bêumêdan.

6- Soza xem û peşîmanîyê li dema tûrebûn û dilreqîyê da. Anko her deqekî pitir ji sozek tê daye.

**Rehenda Duyê**:

Piledarîya Sozan

Sozên piledar gelek tund in yan di nerm û ser xwe ne û ew jî li gorî deqî dimîne. Eger deqî hest livandin ev belge li ser hêzîya hest û sozan û eger hest û soz nelivandin, ew çend kêmbûna soza nivîserî xuya dike. Hêza şêwazî û binemayê endêşeyî giringîyeka zor heye bo rijandina hest û sozan. Wek rûdanên bîvelerza ku ziyanên zor ên malî û giyanî lê dikevin. Herwisa soza cîgir û berdewam jî heye. Soza zindî û bihêz ew soz e ya karîgerîyê dihêle li ser derûnîya mirovî bo maweyekî dirêj, sist û kêm nebe ji encama gelek dubarebûnê.

**Rehenda Sêyê**

Soza resen û dirust

Soza resen yan soza rast û dirust ew soz e ya di hindirê nivîserî û derbirîna deqî hevdu digirin û yeksan dibin û rastîya nivîserî bo babeta wî dîyar dibe. Wate eger nivîserî ew soza hest pê dike şiya (karî) bo me veguhêze ew soz rast û resen e. Lê belê eger neşiya veguhêze, ew sozeka sexte ye û bi tenê bo cihxweşkirin û berjewendîya taybet e. Erê em dê çawa soza sexte binasin? Bêguman bi rêya hestkirineka şirovekarî em dê bişên soza derew û sexte aşkera bikin.

### 2.2.1.5. Şêwazê Nivîserî

Şêwazî giringîyeka zor heye, taybet di deqê edebî da û yek ji taybetmendîyên nivîserî bo gihandina peyama xwe. Şêwazî roleka karîger heye li ser derûnîya xwendevan û şêwazê nivîserî dibe eger bo binavûdengîya wî û herwisa bi destveanîna jimareyeka zor ya xwendevanan. Em dikarin şêwazê nivîserî di çend xalan da dîyar bikin: (http\\: almirsal.com.)

1- **Ziman**

Di vê astê da lêkolîn li peyv, riste, girê û deqî tê kirin û bi rêya giringîdana bi pêkhateyên jêr û serve yên deqî herwisa kurtî û dirêjîya riste, biker berkar, kar, pêşxistin, paşxistin, nêr, mê û risteya biker dîyar, biker nadîyar û hwd. Asta peyvsazîyê pitir ferhenga nivîserî bi xwe ve digire û ev ferheng jî divêt bê dîyarkirin bi van rêyan:

1- Polînkirina peyvan bi rêya kêlgeha wateyê,

2- Dîyarkirina kêlgeh, zalbûn û peywendî bi babetê ve

3- Erka van kêlgeyan çi ne?

4- Hevwateyî û wateya di navbera peyvan bi xwe ve digire ku her yek bo biwarekî guncav e.

5- Siruşta peyvan: Wate, peyva guncav û bihêz bi xwe ve digire ji du layan ve, yek: Rastewxwe û rengvedan, ku peyva rastewxwe wateyê digêhîne û ya rengvedan layenê sozê ve digire. Du: Peyva namoya (xerîb, biyanî) baştir ew e peyvên dîyar û berbelav bi kar anîbin. Lê belê eger yên namo bi kar hatibin, ew vedigere ser dema nivîserê deqî.

Herwisa asta destewaje, riste û birge di deqî da ji çend rûyan ve xuya dibe. Wek;

1- Ronîya wateyê: Ronîya wateya birgeyan mebest jê sadehîya hizrê nîne, belku rêyên derbirînê bi xwe ve digire. Eger tûşî girifta têgihîştinê bûn ji deqekî bi egerê alozî, tem û mijdara peyvan û destewajeyan ev vedigere bo hilnebijartina destewajeyên guncav.

2- Hevsengî: Hevsengî di navbera destewaje û peyvan bi xwe ve digire ji layê jimare û ew karîgerîya mûsîqê dirust dike.

3- Kurtî û dirêjî: Derbirînên dirêj gunca in bo şirovekirina wan biwarên peywendî bi eqlî ve hene û derbirînên kurt jî guncav in bo biwarên derbirînên sozdarî wek şiir û pexşan.

4- Destnîşankirina pêkhateyên jêr û serveyên risteyan û polînkirina risteyan bo risteyên wesfî, risteyên hilsengandin, risteyên derbirîna hestan. (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2012 : 114).

2- **Cûreyê Şêwazî**

Em behsa şêwazê bikarhatî dikin aya ragihandin e, dariştin e, yan herdu ne û kîjan zaltir e û aya şêwazekî guncav e? Bo nimûne; şêwazê ragihandin guncav e bo amojkarîkirinê û dariştin bo arastekirinê.

3 – **Kurtbirî û Dirêjbirî**

Nivîser li gorî pêdivî û tamdana deqî kurtbirî û dirêjbirî bi kar tine. Anko li dû pêdivîyatîya babetê kurtbirî yan dirêjbirî tê bikaranîn. Wekî;

1- Kurtbirî: Mebest ji kurtbirîyê gihandina wateyeka zor bi peyvên kêm û risteyên kurt û tijîwate. Anko zêderûyî (îsraf) di peyvan da nehê kirin ku wate ji forma pitir be yan henkifê yek bin.

2- Dirêjbirî: Barkirina wateyeka kêm di zortirîn peyv da. Ev çend jî bo mebesta cextkirin, serincrakêşan, karîgerî, dirustkirin, razîkirin û ronkirin bi rêyên cûrbicûr. Wek; hevwate û risteyên pêçewane yan bi rêya dubarebûnê bo mebesta ciwankarîyê.

4- **Wêne û Endêşe**

Wêneyî jî roleka giring heye bo ronkirin û dîyarkirina wateyê, çi beşek be yan gişt digel pêkhateyan ku wêne ronkirinên endêşeyî bi xwe ve digire. Wek; lêkçiwandin, xwaze û hwd. wêne wateyê ron dike, hêza peyvê zêde dike, sinûrdar dike û wateya dûr nêzîk dike.

5- **Hunerên Ciwankarîyê**

Hunera ciwankarîyê regezdozî û dijwate û serwa bi xwe ve digire û hwd. bi rêya wateya dûr û nêzîk cûre ciwankaryekê pê dibexşe. Çunke wateya mebest bi şêweyekî veşartî bi kar tê. Helbet îstatîka babeteka giring a edebîyatê ye û bi rêya wî nivîskar peyama xwe bi awayekî nerastewxwe digêhîne.

6- **Muzîk**

Muzîk cext li ser rawestîyan û kêş, hêz, birge, awaz serwayê dike. Di vê astê da dikare lêkolînê li ser tirpe, binema û pêkhateyan bikin digel karîgerîya ciwankarîyê ku dirust dike. Herwisa dikare lêkolînê li dû barebûna deng û wateya azirandinê bike. Tirpe di deqî da giringîyeka mezin heye di taybetî di şiirê da dibe dû beş :

1- Tirpeya ji derve: wek kêş, serwa, siruşt deng û hwd.

2- Tirpeyeka taybet e bi deqî ve girêdaye û bi barê derûnî. We; dubarebûn, hevterîbîya dengan, regezduzî, dijwate û hwd.

### 2.2.6. Hilsengandin û Biryardan

Hilsengandin û biryardan li ser deqî van xalên li xwarê bi xwe ve digire :

1- Taybetmendîya xwedîyê deqî: Aya xwedîyê deqî berjewendîxwazekî komelayetî ye, bangxwazekî rewiştî hilsengîne, şoreşgêrekî xwedî kesayetîyê bihêz e yan kesekî xemgîn e yan kesekî babet serxwe û hevseng e.

2- Dîyardeya dewrûberan: Rengvedana barûdoxê serdema xwe ye, wekî behskirina milmilanêyên mêjûyî di navbera dû hoza û lojîkî hêz yan behskirina siruştî û hwd.

3- Nimûneya berz: Ku di deqî da hest pê tê kirin moreka mirovayetîyê pê ve dîyar e. Wek; bangeş e bo azadîyê û şanazîkirin bi welatî, yeksanî, dadperwerî û rewişta bilind (http\\: almirsal.com).

### 2 .5. Astên Şirovekirina Rehendên Pragmatîkî

Şirovekirina deqî ji alîyê pragmatîkê ve her ji asta fonetîk, fonolojî, sentaksê, semantic, rewanbêjî û ferhengsazîyê bi xwe ve digire û hemû pêkve dibine temamkerên hevdu bo binyatanîna deqî. Lewra dema deq bê şirovekirin pêdivî ye ev hemû layen berçav bên wergirtin û her astek ji van cuda cuda bê şirovekirin. Anko deq bê parçeparçekirin û paşî bê lêkdan bo bidestveanîna yekêtîya wateya sereke ya deqî. Şirovekirina pragmatîkî piştbestinê li ser çend astan dike:

#### 2.5.1. Nîşankar

Mebest ji nîşankarîyê ew e ku hindek peyv di nav zimanî da hene, tem û mijdarîyeka zor bi xwe ve di hildigrin û wateya wan peyvan nahê dîyarkirin. Îla bi rêya dewrûberî nebe wê tê da tên bikaranîn bi rêya dewrûberî nîşankar û amajeyên mebest jê tên xuyakirin (Muhemed Muhemed Yusif, 2004: 21). Ev nîşankar dibin çend cure :

1 - Nîşankarên kesî :

Nîşankarên kesî cihnavên serbixwe, wek: “ez, tu, ew, wan…” û cihnavên likaw “m, î, în...” û navên kesan çi axivtinker û wergir be yan kesê neamade be, herwisa cihnavên amaje û hevalnavên amajeyê wek: “vî, vê, van, ewahe. vî...vê, ev... e”, bi xwe ve digire û herwisa. Anko hemû nav û cihnav û ew amajeyên bo navî dizîvirin.

2- Nîşankarên Demê :

Dem wan peyvan bi xwe ve digirin yên dewrûberî dîyar dikin çi dema axivtinê be yan dema cîbicîkirinê be, her demekê jî buha û senga xwe heye. Eger kiryar li demên pêdivî nehê kirîn, dibe serve biçe û çi buhayek nebe. Dem jî dabeşî du cûreyan dibe:

A. Dema Rûdanê: Bi rêya karî di nav risteyê da tê dîyarkirin.
B. Dema Gotinê: Dema axivtinê ye ku dibe niha ( Şêrzad Sebrî, 2014: 173). Bo mînak ;

Ez hero diçûme qutabxaneyê.

A- Demê rûdanê: Borî ye.

B- Dema Gotinê : Niha ye.

Anko nîşankarên demê ew kereste ne yên amajeyê bi demeka didin çi ew dem yê dîyarkirî dibe yan ne yê dîyarkirî be. Bo nimûne; “îro, niha, paşî, sibehî, piştî salekê, piştî du rojan, heftîya bê, çarşemê, piştî çendeka dî, demjimêr şeşê êvarî û hwd. Bo mînak ;

A- Îro ez dê biçime malê.

Nîşankarîya demê “îro” dewrûberî dîyar dike ka îro çi roj e, şemî ye, yekşem e...

B- Niha ez dê biçim.

Nîşankarê demê “niha”, dewrûberî dîyar dike ka niha çi dem e, nîvro ye, speed ye, êvar e... Anko dema nedîyar li dû dewrûberî dîyar dibe ka dem e.

3- Nîşankarên cihî :

Wan nîşankaran bi xwe ve digire, yên amajeyê bi cihekî didin, ku şirovekirin û ravekirina wan nîşankarên piştbestinê bi zanîna cihê axivtinkerî li dema axivtinê dike yan tê da dimîne li ser nasînan guhdarî bo wî cihê axivtinker behs lê dike (Şêrzad Sebrî, 2014: 174). Nîşankarên cihî wekî “vir, li vî bajarî, li vê parkê, li vî cihî, li serbanî, bi rex ve û hwd.” Bo nimûne:

A- Tu li kû derê kar dikî ?

B- Li vir. Anko “li vir” nîşankarîya cihî ye û dewrûberî dîyar dike ka cih kû derê ye. Nimûneyeka dî :

**Ew li vê zankoyê ye**. “vê zankoyê” nîşankara cihî ye, lê navê zankoyê ne dîyar e, li dû dewrûberî dîyar dibe ka kîjan zanko ye. Anko nîşankarên cihî amajeyê didine cihê rasteqîneyê ji derve û dewrûberî dîyar dike ka navê cihî çi ye.

4- Nîşankarên Deqî :

Nîşankarên deqî, parçe û gotinên deqî pêkve girê dide û amajekirin çi bo paşîyê be yan bo pêşîyê be û gelek caran nîşankarên deqî di nav gotinê da amajeyê bo ji derveyî deqî dike. Nîşankarên deqî ji “hevalkarên demê û cihî û amrazên amajeyê...” bi xwe ve digire. Bo mînak;

**Ev kur gelekî zîrek e.**

Di vê risteyê da “ev...e” nîşankarê amajeyê ye û amajeyê bo kurekî dike ku axivtinker û guhdar dizanin ew kur kî ye. Mînakeka din ;

**Berîya çendekê ew hat.**

Vê risteyê du nîşankarî tê dane. **Yek**: “berîya çendekê” nîşankarîya demê ye, lê dem nehatiye dîyarkirin, ku dewrûber dema dirust dîyar dike, ka çend roj in, çend demjimêr in... Ya **duyê** “ew” nîşankarîya cihnavî ye, ku amajeyê bo ji derveyî deqî dike, lê nav nehatiye dîyarkirin lê dewrûber dizane, ew kî ye.

5- Nîşankarên Civakî :

Nîşankarê civakî peywendîya di navbera takên civakî da dîyar dike çi peywendîyeka fermî be yan ne fermî be û herwisa amajeyê dide peywendîyên xizmayet, temen, nasnav û astên taka civakî, pile û payeyên wan (Ebdilwahîd Mişîr Dizeyî, 2011: 111). Bo mînak;

1- Civakî: Rûspî, axa, maqûl û hwd.
2- Xizmayetî: Xal, mam û hwd.
3- Rêzgirtin: Birêz, gewrim, ezbenî û hwd.
4- Pîşe: Mamosta, diktor û hwd.

### 2.5.2. Girêmanîyên Pêşekî

Girêmanîyên pêşekî ji kirdeyên axivtinê yên girêmaneyî pêk tên, ku pêşwext ew zanyarî tên zanîn û li dû dewrûberî firêker û wergir di hevdu digêhin. Bo mînak; di risteya “**Dergehî bigire.”** da girêmana wê yekê dike ku **“Dergeh vekirî ye**.” Bi wateyeka dî, girêmanên pêşekî ew paşxaneya veşartî yê zanyarîyê ye di nav gotinê da û girêmana hindê tê kirin ew zanyarî xuya ye. Lê belê ew bixwe ne rastewxwe ye di nav gotinê da û serkeftina vê girêmanê girêdayî paşxaneyê da (Hemu Elhac El Zehebiye, 2012: 136). Anko girêmana pêşekî bo wê yekê diçe ku guhdar bikare girêmana tiştekî bike li dû wî dewrûberê riste tê da hatiye kirin ji layê firêkerî ve. Bo mînak;

**Newzad niha nivêjan dike.**

Di vê risteyê da girêmana pêşekî : Newzadî berîya niha nivêj nedikirin.

Zanayan du cûreyên girêmanên pêşekî dîyar kirine. Ew jî :

1- Girêmaneya pêşekî ya semantîkî

Ev girêmaneka lojîkî ye û pabendî binemayê rastîyê ye. Ku wate, eger risteya dîyarkirî rast be, ew risteya girêmana pêşekîyê jî rast e. Anko girêmana pîşekî girêdayî ye di navbera du meseleyan da eger ya yekê rast be ya duyê jî ya rast e (Mehmud Ahmed Nehile, 2011: 29). Bo mînak;

A- Azadî xwîşka Newzadî xwest. Eger ev rast be, divêt ev riste jî rast be:

B- Xwîşka Newzadî bo Azadî xwest.

Ku wate, girêmaneya semantîkî dewrûberî wernagire, belku girêdayî wan zanyarîyan e yên di nav risteyê da hene, ku girêdayî forma risteyê ne di nav zimanî da.

2- Girêmaneya Pêşekî ya Pragmatîkê **:**

Ev cûreyê girêmaneyê peywendî bi rastî û nerastîyê ve nîne. Dibe risteya dîyarkirî bê nefîkirin bê ku kartêkirinê li girêmaneya pêşekî bike. Bo mînak; "**Tirimbêla min nû ye**." Yan bibêjî: "**Tirimbêla min nû nîne**." Di herdu gotinan da girêmana pêşekîya hindê dikin, ku tirimbêl heye, sereray cudahîya herdu risteyan (Mehmud Ahmed Nehile, 2011: 29). Anko girêmaneya pêşekîya pragmatîkî di navbera dewrûber û wê gotina axivtinker dibêje. Dibe çendîn girêmaneyên cuda bi xwe ve bigire. Gelek caran yek gotin li dû dewrûberî jimareyeka zor girêmaneyên pêşekî di hizra guhdarî da xuya dibin.

### 2.5.3. Kirdeyên Axivtinê

Kirdeyên axivtinê gelek erkan bi xwe ve digire li dema bi kiryara gihandinê ra dibe. Îca çi erka hestderbirînê be, ragihandinê be, belavkirinê be, fermandan be, rênimayîkirinê be, niwandina kirdeyekê be û hwd. Bêguman karê zimanî arastekirina rênimayan e bo bi rêvebirina kar û çalakîyên jîyanê di hemû biwar û biyavan da. Ji ber wê yekê ziman kirdeyên cûrbicûr bi xwe ve digire. Derbareyî kirdeyên axivtinê Ostin, li ser sê cûreyan dabeş dike (Muhemed Muhemed Yusif, 2004: 34-35):

1- Kirdeya Gotinê: Mebest ji kirdeya gotinê dariştin û zarkirina risteyê ye, ya li dû yasayên rêzimanê tê rêxistin.

2- Kirdeya Mebestê: Mebest ji vê kirdeyê dîyarkirina mebesta firêkerî ye ji risteyê yan gotinê. Çi fermandan be yan amojgarî û rênimayîkirin be.

3- Kirdeya Karlêkirinê: Mebest jê ew karlêkirin e ya kirdeya zimanî li wergirî dike. Çi guhdarîya fermana be yan qayîlkirin be, bi amojgarîyan yan derxistina rastgoya firêkerî be yan bi derewîn derxistna wî be ji layê guhdarî ve.

Anko kirdeya axivtinê ferman û daxwazî ye yan rênima û amojgarîkirin e yan hestderbirîn û karlêkirin e bi şêweyekê rastewxwe be yan nerastewxwe be. Bo mînak;

A- Risteya Ragihandinê: Eger tu çûyî, dê wî digel xwe bibî! (gefkirin)

B- Risteya Pirsê: Kengî te xwarin xwar? (pirsyarî)

C- Risteya Fermanî: Bê zehmet, wê pencereyê veke. (daxwazî)

D- Risteya Fermandan: Spêdeyê zû rabe bixwîne. (amojgarî)

### 2.5.4. Derkevteyên Axivtinê

Derkevteyên axivtinê ji wan zanyarîyên nerastewxwe yên ji gotinê tên derencamkirin. Ev jî bi piştbestina rêyên pragmatîkî bi dest ve tê. Ne ku bi rêya wateyên bo peyvan hatine danan (Şêrzad Sebrî, 2014: 178). Anko ew zanyarîyên nerastewxwe ne yên wergir bi rêya dewrûberî ji axivtinên firêkerî diîneder. Grays derkevteyên axivtinê dabeşî du cûreyan dike:

A- Derkevteyên Axivtinê yên Giştî: Ev derkevte dûr ji dewrûberî tê têgihîştin, ku ji pêkhatina gotinê dîyar dibe. Bo mînak; "**Xwendin ronahî ye**." Wateya wê dîyar û ron e, ku behsa giringîya xwendinê dike.

B- Derkevteyên Axivtinê yên Taybetî: Ev derkevte bi rêya dewrûberî tên zanîn û bi bezandina binemayê harîkarîyê bi dest ve tê (Muhemed Muhemed Yusif, 2004: 51). Bo mînak; "**Tu çend ciwan î**! Dibe li dû dewrûberî ev riste bi wateya berûvajî bê. Graysî gelek giringî da hindê, em çawa tiştekî bibêjin û mebesta me tiştekî dî be? Herwisa çawa dê dirust be, guhdarî guh li tiştekî be û li tiştekî dî bigêhe? Ji bo çareserkirina van pirsan Graysî binemayê harîkarîyê dîyar kir, ku "**binemayên harîkarîyê"** dabeşî çar cûreyan kiriye:

1- Binemayê Çendayetîyê: Beşdarîkirin di gotinê da bila ewqas pêdivî be, ne ji wê kêmtir be ne zêdetir. Bo mînak;

Dayîk: Tu çûye qutabxaneyê?

Keç: Belê.

2- Binemayê Çawanîyê: Wî tiştî nebêje, yê ku te guman li ser rastîya wî hebe. Anko çi tiştan bê belge û selmandin nebêje.

3- Binemayê Guncavdinê: Beşdarîya peywendîdar û guncav be digel pêdivîya gotinê.

4- Binemayê Şêwazî: Bila axivtina te ron û aşkera be. Mijdarî di derbirînê da nebe. Kurtbir be, gotin bila bi rê û pêk û aşkera be (Mehmud Ahmed Nehile, 2002: 34).

Anko eger yek ji van çar binemayan hate bezandin li wê demê dê derkevteyên axivtinê bi dest ve bên, ji ber ku bezandina van binemayan dê axivtina wan pêzanînan bi xwe ve bigire, ku rastewxwe nehatine derbirîn. Bo mînak;

Bav: Tu çûye qutabxaneyê?

Kur: Xewa min tê.

Di vê nimûneyê da wergirî binemayê "peywendîyê" bezandîye. Ev ji bo egerê hindê ku derkevteyên axivtinê bi dest ve bên ji egerê bersiva wergirî ya neguncav ku bo firêkerî dîyar dibe ji wê bersiva neguncav û nepeywendîdar kurî nevê biçe qutabxaneyê. Anko binemayên harîkarîyê harîkarîya firêker û wergirî dikin ji bo guftûgoyeka temam û ron û hêsan li hevdu bigêhin. Di vir da dê hewl bidin çendîn nimûneyan pratîk bikin li gorî astên şirovekirina pragmatîkê:

### 1- Çîroka Gelek Kurt

Çîroka gelek kurt janreka edebî ye bi şêweyê pexşanê tê nivîsîn. Di vî cure çîrokê da hewl tê dan, ku bi kêmtirîn peyv bi zortirîn wate bê derbirîn. Ji ber hindê têgihîştina çîroka gelek kurt ya hêsan nîne. Pêdivî hizirkirineka kûr e heta xwendevan bikare di vî cûre çîrokê bigêhe. Bo mînak di çîroka bi navê "Sîngê Min" da em dê hewl bidin rehendên pragmatîkî yên zimanî li ser cî bi cî bikin. Çîroka "Sîngê Min":

**"Sîngê min hind min diêşît, dibêjî dê peqit, çend seyr e ku ewê êşandî nûke bextewer be**." (Hesen Silêvaneyî, 2017: 10).

Rehendên pragmatîkî di vê çîrokê da:

**Yek**: Cûreyên Nîşankar:

1- Nîşankarên Kesî

Min: Bo axivtinkerî dizîvire û dewrûberî dîyar dike ka axivtinker kî ye.

t: Bo sîngî dizîvire.

Ew: Bo kesê sêyê tak dizîvire, yê sîngêşandî. Ew nêr e ji ber nîşana regezî (ê).

2- Nîşankarên Demê:

Êşe:  Dema neborî ye.

Dê peqit: Dema dahatî.

Nûke: Dema niha ye.

Be: Dema neborî ye.

3- Nîşankarên Cihî: Sîng

**Du**: Girêmanên Pêşekî

1- Sîng heye.
2- Êşandin û peqandin heye.
3- Lêdan û qutan heye. Bextewerî heye.

**Sê**: Kirdeyên Axivtinê

1- Nerazîbûn heye.
2- Gazinde û zilim heye.
3- Hestderbirîn heye.

**Çar**: Derkevteyên Axivtinê:  Çêjwergirtin ji êşandina kesê beramber.

**2- Deqê Şî'rî**

Zimanê Şî'rê zimanekî  sembolîk e û hest û soz di şiirê da zal e û hunera rewanbêjîyê tê bikaranîn bo afirandina wêneyên şiirî dibe egerê  ladana yasayên  rêzimanê, ku ladan di binemayên harîkarîye da dirust dibe, derbazî  asta  pragmatîkê dibe û pêdivî bi dewrûberî heye bu dîyarkirina wateyê. Bo mînak, Bedirxan Sindî dibêje:

**Ey felek  bo te dinalim  bo çî nêrgiz çirmisîn,**

**Ew çima bextê me ho ye her bê  dost û bê kes în** (Bedirxan Sindî, 2013: 12).

Rehendên pragmatîkî yên vê parçeşiirê da hene :

**Yek**:

Cûreyên Nîşankarî

1- Nîşankarên Kesî

Te : Bo felekê dizîvire.

M : Bo kesê yekê dizîvire yê ku bo felekê dinale.

N : Bo nêrgizê dizîvire.

Me : Bo kesê duyem û pirhejmar dizîvire.

N : Bo me dizîvire.

2- Nîşankarên Demî: Karê çirmisîn û nalîn yên hatin ku dema borî ne.

3- Nîşankarên Cihî: Felek mebest pê dinya ye.

**Du** : Girêmanên Pêşekî:

1- Dinya heye.

2- Êş, azar û nalîn hene.

3- Çirmisîna nêrgizan heye.

4- Bextê reş heye.

5- Bêxwedanî heye.

**Sê** : Kirdeyên axivtinê:

1- Kirdeya nalînê û çirmisîna nêrgizê.

2- Gazinde : Çima bextê me ho ye?

**Çar** : Derkefteyên axivtinê :

Helbestvan gazindeyan ji dinyayê dike, bo çi mirovên baş, ciwamêr û ciwan ji nav diçin. Her dem bextê wan reş e û kes xwe li doza wan nake xwedî, mebest miletê kurd e.

Ku wate, pragmatîk bi şirovekirina hemû parçeyên zimanî di nav deqî da radibe (wek; fonolojî, morfolojî, sentaks, semantîk). Herwisa pragmatîk bi şirovekirina hemû wan hêmayan ra dibe yên ji derveyî deqî ziman amajeyê dide. Anko pragmatîk bi şirovekirina hemû wateyên veşartî ra dibe yên axivtinkerî, mebest jê heye, anko girêdana deqî bi dewrûberên deqî û ew jîngeha deq tê da hatiye afirandin. Anko xwendina deqî bi çavê pragmatîkê girêdana deqî ye bi dewrûberê komelayetîyê nivîserê deqî ve û bo gihîştina mebesta rasteqîne ya firêkerî.

## Beşa Sêyem

## 3. Deq di Navbera Mebesta Nivîser û Têgihîştina Xwendevanî

### 3.1. Deq û Mebesta Nivêserî

Xuya ye deq alavek e ji alavên gehandinê bo bercestekirina hizr û mebesta nivîserî bo wergirî. Helbet wê mebestê jî armancên xwe yên taybet û giştî hene. Çi armancên edebî, civakî, siyasî, ayînî, aborî, mirovayetî, rewiştî û her îdeolojîyek û meremeka nivîserî bivêt bi rêya deqî bo xwendevanî bide xuyakirin. Ev çend jî dibe eger ku deqî bi danerî ve girê bide û çi jêkvebûn di navbera wan da berçav nabin. Şêwazê nivîserî jî dibe xala aşkerakirina derûn û kesayetîya danerê wî deqî û derbirînê ji navxweya wî dike û derbirînê ji hilçûn, hizir, bîr û boçûnên wî dike beramber tiştan (Nemetullah Hamid, 2007: 125). Li dû vê boçûnê deq rengvedana kesayetîya nivîserî dike. Belku mebest jî ji derencama layenê rewşenbîr û jîngeha perwerdeya nivîserî peyda dibe, ku mebest hilgira peyamekê ye.

Herwiha nivîsîn rêyeke di cewhera xwe da pêkve girê dane di navbera nivîser û deqî da. Nivîser jî hilgirê bîr û bawerî û xwedîyê merîfîbûn û çawanîya rêxistina niwandina zimanî dike. Herwekî dîyar e deq rengvedana lênêrîna bercestebûn û menaya nivîserî ye di cîhana zimanî da. Desthilata zimanî di wê çendê da nîne ku mora zîhnî û merîfîya nivîserî di deqî da jê bibe, belku nasnameyaka dî bi desthilata amadebûna nivîserî dê bibexşe. Di vir da mebest ji nasnameyê çespandina xwedîyê nivîserî nîne di deqî da bi şêweyê gîyanekê amade û karîger. Herçend hemû amadebûna xwe dixe bercestebûna zimanî. Lê belê cîhanbînîna nivîserî girêdayî bi medlula zimanî ve ye (Necat Hemûd Ehmed, 2008: 114). Di vir da nivîsîn xala pêkvegirêdana di navbera nivîserî û deqî ye. Herwiha deq jî bi rêya zimanî bîr û bawerîyên nivîserî berceste dike. Lê mebest ji amadebûna nivîserî di deqî da ramana wê yekê nade ku nivîser bi temamî kontrola deqî dike, belku deqî binyatekê serbixwe heye û nivîser bi tenê hêmayên zimanî û wateya deqî berceste dike wek semantîk. Lê belê mebesta di nav dewrûberên deqî da wek pragmatîk.

Herwisa deq cûreyek e ji nivîsînê û digel axivtina rojane da cudahî heye. Ji egerê siruştî yê erka deqî û ew armanca bo dinivîse û ji çarçoveya peywendîya derbazî balkêşî ya wergirî dibe. Ev jî bi rêya keresteyên zimanî xuya dibe. Bi nav û dengî û serkeftina nivîserî girêdayî cemawerê wî ye. Çunke nivîsîn di binyatê da dîyardeyeka komelayetî ye.Ev teknîk û yarîkirina bi peyvan ku nivîser bi kar tîne, ji layê xwendevanî cûre tem û mijdarîyekê dirust dike û dibe egerê çendîn xwendinên cuda. Şûlî û mijdarîyên di nav deqî da cûr bi cûr in û li dû cûreyê hêmayê dimîne. Hindekan lêkdana wan sinordar e wekî kesayetên mêjûyî û hindekên di jî taybet in bi dahênerê deqî ve. Herçend wateyeka giştî hebe, lê belê bi rêya barkirina wateya derûnî û yarîkirin bi peyvan ji wateya ferhengî dûr dikeve û hêmayeka tem û mijdar dike ber xwe û serê xwendevanî dişêwîne. Ev çend jî xwendevan pêdivî bi hizirkirineka kûrtir heye bo gihîştina wateya nû. Ev jî dergehê xwendinên cuda bo deqî vedike û xwendevanî ji wateya serve berev wateya kûr û aloz vedibe. Anko em dê pêdivî xwendevanekî zîrek bibin bo vekirina van hêmayan û destnîşankirina rehendan. Li dûmahîya her xwendinekê xwendevan têgihîştina xwe û xwendina xwe berev arasteyekî dibe ku wî bawerî pê heye û piştgirîya wê dike. Di vêrê da pirsyarek dirust dibe. Aya mebesta nivîser û xwendevanî dê bigêhine hev? Anko dibe bigêhine hev yan jî ji hevdu dûr bin ( Ebdilwahid Mişîr Dizeyî, 2015: 104). Anko em dişên bibêjin mebest ne di nava peyv, tîp û zimanî da ye. Belku di nava boçûn û hizrên nivîserî da ye. Bo zanîna vê mebestê pêdivî ye ziman di nav dewrûberî da bê şirovekirin bo gihîştina mebesta nivîserî. Çunke gelek carann di nava deqî da nivîser amajeyê bi tiştên ji derveyî zimanî dike. Anko li vir li ser asta rewşenbîrîya xwendevanî dimîne bo gihîştin yan negihîştina mebesta nivîserî. Herwisa giring e nivîser bizane çi dinivîse, bo kê dinivîse? Ev çend jî dibe egerê destnîşankirina çîneka dîyarkirî. Dibe her nivîserekê xwendevanên xwe hebin. Helbet ev xwendevan jî li asta peyama nivîserî ne. Lewra nivîser bo wan dinivîse û bi zimanê wan diaxive. Ev ast jî têne polînkirin li dû temen û asta epîstomolojîya xwendevanî. Ku em dişên xwendevanî dabeşî sê cûreyan bikin:

### 3.1.1 Cûreyên Xwendevanî

1- Xwendevanê Asayî: Ew xwendevan ku çi zêdekirina li ser deqî zêde nake. Dibêjinê xwendevanê negatîv.

2- Xwendevanê “arif” yan wê giringîyê bi xwendinê dide ku dikare bi rêya şarezayîya xwe dubare deqî di nav derûnîya xwe da biafrîne. Herwiha dikare li ser kaxezê jî binivîse. Anko ew dikare dubare deqî darêje.

3- Xwendevanê Rexnegir: Ev xwendevan ne bi tenê dikare dubare deqî di nav derûnîya xwe da biafirîne. Belku dikare li ser kaxezê jî binivîse û deqekî nû berhem bîne (Ebdî Hacî, 2008: 111). Ku wate, li dû vê parvekirina xwendevanan li ser sê astên cîyawaz, di heman dema da mirov dikare peyama firêkerî jî dabeşî sê astan bike .Wek:

1- Peyama Sade: Ev cûreyê peyamê hemû kes têdigêhin û di asta şêwazê rojaneya xelkî da tê darіştin û bi zimanekî giştî tê arastekirin.

2- Peyama Navincî: Ev cûreyê peyamê di asteka navincî da tê arastekirin û bi tenê kesên xwendevan têdigêhin ka mebesta nivîserî ji wê peyamê çi ye.

3- Peyam di Asteka Bilind da: Ev cûre peyam aloz, tevlihev, tem û mijdar e. Bi tenê rewşenbîr, akademî û çîna bilind a civakî têdigêhin. Wek; rexnegiran. Hersê kujî di vî wêneyî da:

**Nivîser** ⟶ **Peyam** ⟶ **Wergir**

Li vê derê eger em peyama edebî wek nimûne wergirin dê bibînin ku deqên edebî ji deqên vekirî têne hejmartin û xwendinên cuda bi xwe ve digirin ji egerê şûlîyatî û mijdara hindek peyv û destewajeyan bi taybetî deqê helbestê, ku şiir ji wan deqan e yên peyamên veşartî di nav xwe da hildigire. Gelek carann nivîserê helbestê bi rêya helbestê peyama xwe digêhîne û peyama wî têkelî hest, soz û xeyalê dibe. Lewra mebesta wî aloz û berze dibe. Yan jî mebesta xwe bi rêya hindek çevenga di nav şiirê da digêhîne. Helbet xwendevanê asayî di wan çevenga nagêhe û nikare wan kû da bişikêne yên helbestvanî bi kar anîne. Anko li vir hindî asta rewşenbîr li dev xwendevanî blind be dê bikare pitir nêzîkî mebesta nivîserî be. Lewma şarezayî di wan çeveng û hêmayên hatine bikaranîn di cîhana hunerî û edebî da zor giring e. Çunke ew çeveng û hêma rengvedana ketwarê rasteqîneya mirovayetîyê dike. Bo mînak: “Ew wekî berazî ketine giyanê me.” Xuya ye ku “beraz” giyanewerekî dirinde ye û gelek zîyanê digêhîne jîngeh û dewrûberên xwe. Gelek caran helbestvanên kurd ev peyv

beramberî zilm û zordarîya dagîrkerên welatî bi şêweyekî nerastewxwe bi kar anîye, ku sîfetê berazî daye mirovî. Anko ew mirovên nivîserî mebest pê wekî berazî dirinde ne.

Ku wate zor giring e şarezayî di saxlet û sîfetên wan tiştên ji derveyî ziman û dewrûberên me da heye em bizanin, ku nivîser penayê bo lêkçiwandinê dibe di navbera mirov û tiştên dewrûberî da bo gehandina peyam û mebesta xwe. Lewra asta epîstemolojîya xwendevanî kartêkirineka mezin heye li ser têgihîştina mebesta nivîserî.

Li vê derê pirsyarek tê azirandin, gelo mebest li kû derê ye? Di nav deqî da ye yan di van kesayetî û jîyana nivîserî da ye? Rolan Bart di nivîsîneka xwe da bi nav û nîşanên "mirina nivîserî" û nimûneya "Balzak"î tîne ku derbareyîî jinekê dinivîse û pesna doxê jinê dike. Bart di wê nivîsînê da komeleka pirsyar û gomana dixe berdestî. Aya Balzak wekî nivîsereke derbareyî jinê dinivîse, yan pelewanê romanê, yan ezmûna psîkolojîya dildarî dinivîse? Bart di bersiva wê pirsyarê da mirina nivîserî radigêhîne. Çunke di nivîsînê da deng û çavkanî ji nav diçin. Ji ber hindê nivîser nikare rolê senterî bigêre. Belku xwedîyê deqî ye. Wek, cîhaneka serbixwe rola senterî digêre (Herêm Usman, 2018: 94). Ku wate, bi dîtina Rolan Bartî deqî desthilata serbixwe heye û çi peywendî bi nivîserê deqî ve nîne. Anko deq wek daneyeka semantîkî tê wergirtin û çi peywendî bi dewrûberan ve nîne. Ev çend jî berûvajî binemayê pragmatîkê ye, ku dewrûberê komelayetî merc e bo gihîştina mebesta nivîserî. Ku wate li vê derê du boçûn peyda bûn der bareyî mebestê da:

1- Bi dîtina zanista pragmatîkî ku beşa yekê da bi awayekî berfireh me behsa dewrûberê komelayetîyê jîyana nivîserî kiriye, ku kartêkirinê li wateya deqî dike. Anko dewrûber binemayeka giring e bo vedîtina mebestê.

2- Li goreyî xwendina metoda binyatgerî da deq dibe senterê giringîya pêdanê, ku xwendineka bêlayan e bo deqî bê kirin û metoda binyatgerî hewla lêkana deqî dike bê karîgerîya tiştên ji derveyî deqî. Anko li dû zanistên fonolojî, morfolojî û pêkhateyên zimanvanîyê, watenasî, rewanbêjî û zanista psîkolojîya zimanvanîyê, şirovekirin û lêkdana deqî dikir (Erxewan Muhemed, 2013: 2018).

Ku wate dewrûberê komelayetî jêdera herî giring e bo bidestveanîna mebesta nivîserî. Çunke li pey boçûnên zanayên zimanvanîyê ew zanyarîyên di nav mêjîyê nivîserî da gelek pitir e ji ya forma zimanî digêhîne. Anko bo gihîştina mebesta

rasteqînîya firêkerî pêdivî ye jîyan, bîr û bawerî û jîngeha nivîserî bi kûrî bê xwendin, da ku em bikarin wê mebestê bi dest ve bînin, ya peyv neşiyan derbibirin û bigêhîne xwendevanî.

### 3.2. Deq û Têgihîştina Xwendevanî

Deq bo xwendevanî tê nivîsandin û xwendevan kujîyê sêyê yê sêgoşeya "nivîser, deq, wergir e." Anko senterê prosesa gehandinê ye û gorepana cîbicîkirina armanc û mebesta nivîserî ye. Lê cîbicîkirina mebesta nivîserî ya têgihîştina xwendevanî ra. Helbet ev çend jî li ser cûreyê xwendevanî, layenê wî yê merîfî û asta peyama arastekirî dimîne.

Li destpêkê têgihîştin bi zanistên mirovayetî û ruhî ve dihate girêdan. Lê belê niha bi zimanî ve tê girêdan, ji belku qeşe Ogstîn lêkolînên zimanvanîyê bi ayînî ve girê didan û bi dîtina wî li ser vî binemayî ziman delaletê ji bona Xwedê dike. Xwedê di nava her kesî da ye û bi rêya zimanî derdikeve. Armanca vê lêkolîna zimanvanîyê cudakirina axivtina Xwedê ye ji axivtina mirovî. Di vê gotina Ogstînî da mirov deqek e, Xwedê bi rêya zimanî berceste kiriye. Ji layekê dî bi dîtina Rolan Bart deq bi arezû û şarezayên xwendevanî tê holê. Di xwendinê da deq xeber nade, belku xwendevan tê axivtin. Ku wate Ogstîn behsa babeta têgihîştinê dike. Lê Bart behsa xwedîyê têgihîştinê dike. Eger babeta têgihîştinê dahêner be, lê xwedîyê têgihîştinê deq e. Babeta têgihîştinê her dem cîgîr e. Lê mercên têgihîştinê berdewam têne guherîn û dikevine ji derveyî deqî li dû rêbazên ravekirinê (Ebdulmutelîb Ebdula, 2008: 115). Bi vî rengî her xwendineka cuda dahênana deqekî dî yê cîyawaz e. Anko xwendevan beşdar e di avakirin û dahênana deqî da yan jî di şiyan daye deqê duyê berhem bîne. Herwiha teorîya wergirtinê di rexneya Emrîkî û Ewrûpî da li jêr karîgerîya geşepêdana hermînyotîkê da hate holê. Vê teorîyê rexne li nivîserê deqî girt ku xwendevan bi pişt guh ve avêtiye. Ku vê teorîya wergirî bi binemayê zindî û aşkerakirina wateya deqî dizane û cextê li ser peywendîya gihîştina xwendevanê deqî dike û xwendevanî bi dahênerê layenê estetîkî yê deqî dizane (Herêm Usman, 2018: 110). Anko xwendevan gorepana saxkirina deqî ye. Eger xwendevan nebe deqî hîç buhayek û hebûnek nabe. Ji layekê dî ve her xwendevan deqî pesend dike yan red dike. Bêguman eger deq hate retkirin bi deq nahête hejmartin.

Herwiha babeta têgihîştinê babeteka gelek berfireh e û ji xwendevanekî bo xwendevanekî tê guherîn. Têgihîştin girêdayî asta me'rîfî ya xwendevanî ye û ew tiştên dewrûberê mirov hene û ew jîngeha xwendevan tê da perwerde bûye. Herwiha ew tiştên balkêş yên ji cîhana ji derve bo xwendevanî tên bi rêya endamên hesteweran bo mêjîyê wî têne veguhestin. Li vê derê mêjî dê hindek şînwarên wî biparêze. Ev şênwar dê binyatê cîhana xeyalî û bîrdankê dirust bike. Lê ew nikare berawirdîyê di navbera wêneyê fotografî û wêneyê têgihîştinê da bike. Çunke ew tiştê dibîne hemûyê tênagêhe. Bo mînak, eger em wêneyekî nîşa komeka kesan bidin dê her kesek bi şêweyekî vî wêneyî şirove bike. Eger em pirsyarê ji wan kesan bikin û bibêjinê “We çi di vî wêneyî da dît?” Dê bersiva her kesekî ji kesekî di cuda be (Elfrêd Adler, 2018: 79). Ku wate dewrûberê me kartêkirineka yekser li ser têgihîştinê heye. Bi rêya wan zanyarîyên bi rêya hestan digêhine mêjîyê mirovî. Herwiha têgihîştina mirovekî digel mirovekî dî cudahî heye li ser heman deqî. Anko her yek bi çavekî deqî dixwîne. Lê belê her çend asta me'rîfî ya kesî û cûreyê pisporîyê û cûreyê deqî pîver e bo têgihîştinê.

Herwiha teorîya wergirtinê lêgerîyanek li wateya deqî di navbera nivîser û xwendevanî da kir. Aya deq e wateyê digêhîne yan jî xwendevan? Yan jî deq û xwanevan pêkve wateyê digêhînin? Lewma vê metodê bawerî bi wê çendê heye ku hebûna deqî bi tenê bes nîne ji bo vedîtina wateya wê, belku xwendevan jî di dîyarkirin û vedîtina wateyê da pişkdar e. Ev çend jî piştî rêbaza binyatgerîyê dîyar bû ku bi tenê deq dikire jêdera her tiştekî. Herwiha teorîya wergirtinê cext li ser rolê aktîvê xwendevanî kir. Çunke bi dîtina vê teorîyê xwendevanî kartêkirineka mezin heye ji bo destnîşankirina wateya deqî (Ebdî Hacî, 2008: 105). Anko xwendevan binyatê bidestveanîna wateyê ye û kilîlên têgihîştinê di destên wî da ne.

Herwiha bi dîtina rexnegirên teorîya wergirtinê peywendî di navbera deq û xwendevanî da heye neku di navbera xwendevan û nivîserî da. Çunke nivîser bi tenê karê xwe didane ber destê xwendevanî û xwendevan wateya dûmahîyê ya deqî didane. Di heman demê da xwendevan dibe rexnegir. Merc nîne hemû xwendevan wekî yek bin. Anko hemû xwendevan yek wateyê nadine heman deqî. Dibe hindek xwendevan hindek caran wek hev wateyê bigêhînin û dibe jî her yek wateyekê bide heman deqî.

Ev çend jî li ser çawanîya têgihîştina xwendevanê deqî dimîne. Ramana deqî li dû boçûna Engardinî ji encama tefa'la di navbera binyatê karê edebî û têgihîştinê da dirust dibe. Bi vê çendê xwendevan dibe pişkdarekî kara di deqî da. Çunke xwendevan û deq divêt pêkve bo berhemanîna wateyê hewl bidin (Ehmed Yasîn, 2015: 121). Li pey teorîya wergirtinê armanc ji deqî xwendevan e û eger xwendevan nebe deqî çi buhayê xwe nabe. Çunke deq bi siruşta xwe vekirî ye û cihê gelek xwendina li ser heye, taybet deqên edebî. Deq berev xwendevanî diçe ji bo pişkdarîkirinê û temamkirinê ne bi tenê ji bo xwendinê. Herwiha ji bo çawanîya pişkdarîya xwendevanî di çêkirina wateyê da, xwendevan bi du erkan radibe:


1- Erka Zanîna Yekser: Ew jî zanîna wan hêma, çeveng û kilîlan e yên ku di nav deqî da hene. Ev jî asta yekê ya serederîya xwendevanî ye digel deqî.

2- Erka duyê têgihîştin e û ev jî girêdayî xwedîyê xwendevanî ye û ev çend bi rengekî ji rengan asta deqî aşkera dike û dema ji erka zanînê berev erka têgihîştinê diçe. Wê demê pişkdarîyê di çêkirina wateyê da dike. Ev çend jî her wekî Ayzer dibêje: Deqên edebî valahî tê da hene û ev valahî nahêne tijîkirin eger xwendevan nebe (Yasîn: 122).

Ku wate têgihîştina xwendevanî dibe rastvekirina kêm û kurteyên deqî û rêxistin û darêjtina deqî bi awayekî baştir û rontir. Herwiha Daived Coper dibêje: Têgihîştina deqî kirdeyeka binyatdanana wateyê ye bi rêya wergirtina bîrokeyan û girêdana wan bîrokeyan bi bîrokeyên paştir ve. Têgihîştina deqî kirdeyek e ku xwendevan têkel dibe. Têgihîştina deqê nivîsî sê taybetmendîyên wê hene (Ebdilwahid Mişîr Dizeyî, 105: 2015) :

1- Xwendina deqî bi temamî.
2- Binyatdanana wateyê,
3- Têkelbûna deqî.

Van hersê taybetmandîyan em dê di vê hêlkarê li xwarê da bidine xuyakirin :




Ku wate têgihîştina deqî li ser binyatê xwendineka dirust û serxwe û têkelbûna deqî bi temamî û vegerandina zanyarîyên berî hingî di bîrdankê da hatine xezinkirin û di vê qonaxê da xwendevan têkelî deqî dibe û têdigêhe. Xwendevan dema deqekî dixwîne, di bîrdanka wî da komeleka taybetmendî, zanîn, serborîyên û rewiştî hilgirtine. Vê zanyarî û paşxaneyê karîgerî heye li ser hemû parçeyên deqî. Herwiha ev têkelbûn ji encama xwendinê tê û em dişên bibêjin: Ew wateya bi dest ve hatî di navbera pêşniyara deq û zanyarîyên pêştirên di nav mêjîyê xwendevanî da hene. Têgihîştin ji deqî wateya danana zanyarîyan bo ser wan zanyarên em dizanin tê. Em her li ser vî binçîneyî lêkdana lojîkî bo dikin. Pileya têgihîştinê jî radeya wan zanyarîyên pêşînê dîyar dike yên xwendevanî hene. Bi şêweyekî giştî çendîn pêzanînên xwendevanî pitir bin dê têgihîştin kûrtir û baştir be.

### 3.2.1. Astên Têgihîştinê

Helbet têgihîştin ji kesekî bo kesekî tê guherîn li ser heman deqî yan li ser heman babetê. Ev çend jî li ser cûreyê xwendevanî dimîne û asta wî ya epîstemolojî. Herwiha li ser cûreyê deq û babetê deqî dimîne, aya heta çi radeyê zanyarîyên pêşîyê di bîrdanka xwendevanî da hene? Ku bikare pê zanyarîyên berdest şirove bike û têbigêhe. Em dikarin astên têgihîştinên li ser çend cûreyan parve bikin (Seher Kamil Kazim, 2018: 1196-1197) :

1- Asta Têgihîştina Rasterast

Di vê astê da xwendevan dîyarkirina wateya çendîn peyvên deqî dike. Herwiha dîyarkirina hindek navên tak û hemû navên di nav deqî da hatin û ronkirina peywendîya peyvan digel hevdu, ronkirina peywendîya di navbera parçeyên deqî da û cûreyên wê peywendîyê. Destnîşankirina fikrên sereke yên deq û dîyarkirina fikrên nesereke yên deqî. Herwiha rêxistina rûdana bi awayekî zincîrî, lojîkî û destnîşankirina data û zanyarîyên pêdivî li ser deqî, jêk vavartina peyvên nêzîkî yek di ramana xwe da. Herwiha girêdana peywendîyê di navbera deqê xwendî bi pêzanînên xwendevanî yên borî ve.

2- Asta Têgihîştina Berhemanînê

Vê astê peywendîya bi derencama deqî ve heye. Erê nav û nîşan bo xwendevanî guncav e? Dîyarkirina armancên nivîserî ji deqî. Dîyarkirina wî tiştê xwedanê deqî negotî. Herwiha dîyarkirina saxletên kesayetîya nivîserê deqî di mîyana guftugo û wan rûdanên di nav deqî da behs kirin û rêxistina wan tiştên boçûnên cuda li ser hene di navbera regezên babetê da û derencama deqî da. Anko di vê xalê da têgihîştin berev armancê diçe.

3- Asta Têgihîştina Rexneyî

Di vê astê da têgihîştin di pileyeka bilind daye bo selimandina rastîyên zanistî û lênêrînên cuda. Dîyarkirina babetên peywendî bi deqî ve heye û ew babetên peywendî bi

deqî ve ne. Herwiha destnîşankirina fikrên sereke, fikrên nesereke, fikrên nûjen û berbelav. Herwiha dîyarkirina layenê waqiî û xeyalî yên deqî û giringîya deqî di ber ronahîya serborîyên xwendevanî da û ew alîyên jîyanê yên mifayê ji vê mijarê werdigirin. Anko têgihîştineka babetî û zanistî ye û dûr e ji hest, soz û layengirîyê.

4- Asta Têgihîştina Tamwergirtinê

Ev ast xwe di nav deqên edebî da dibîne û berev ciwankarîyê û layenên rewanbêjîyê diçe. Hest û soz di vê asta têgihîştinê da roleka bilind digire û kartêkirinê li xwendevanî dike. Çi hest û sozên xweş bin yan yên bi azar û nexweş bin ku xwendevan beşdar e digel êş û azarên nivîskarî. Herwiha pêkvegirêdana fikrên wijdanî digel yên dirkkirinê û ev çend dibe kopîtka wateya hindek peyvan. Herwiha mijarên mirovayetîyê yên hest û sozan diazirînin.

5- Asta Têgihîştina Afirînerî

Di asta afirînerî da xwendevan dûbare rêxistina rûdan û efkaran bi şêweyekî nerazîbûn dike û hewla vedîtina hindek çareserîyên nû dide bo wan kêşeyên di nav deqî da derbaz dibin. Herwiha pêşnîyara hindek rûdan di ber ronahîya komeleka girîmanên guncav dike. Herwiha derbirînên xwendevanî û hilçûnên wî derbareyî hindek rûdanên di nav deqî da bi şêwazekî taybet bikarînana zimanî ra dibe û bergekî nû dike ber deqî. Herwiha têgihîştin kirdeyeka derûnî ye û bi çend qonaxan da derbaz dibe:

1- Guhdarîkirin: Dema wergirî dengê axivtinkerî wergirt wêneyê dengî di mêjîyê guhdarî da pesend dibe û paşî şirove dike bo pêkhateyên hûrtir.

2- Guhdar di nav mêjî da digere bo pêzanînên beramberî wan zanyarîyên wergirtîn, paşî bi şirovekirina wê gotinê radibe ya çûye di nav mêjîyê guhdarî da û di heman demê da amadebaşî heye ku pêşwazîya hindek gotinên dî bike.

3- Her pêkhateyek risteyê diguhêre bo bîrokeyekê ku wate, wê digêhîne û hev dem di gel herdu qonaxên borî.

4- Her bîrokeyek çendîn lariste û peyvan pêk tê ku pêngav pêngav wateyeka lêkdayî û aloz dirust dike û heta digêhe wateya temama risteyê.

5- Wateya wêneyê dengî dê kurt bike û biguhêre bo hizra berdewam.

6- Wêneyê dengê  gotinê diparêze  heta dûmahîka axivtinê  ku ew gotin li bîra wî dimîne û paşî şirove dike û wateya wê  lêk dide.
7- Piştî têgihîştinê wergir mêjî format dike ji wêneyê dengan. Lê belê wate her di bîrdankê da dimîne (Ebdilwahid Mişîr Dizeyî, 2015: 80-81). Ku wate, têgihîştinê  dem pê divêt û têgihîştin jî li goreyî babet û kesî tê guherîn û  merc nîne hemû  bigêhine têgihîştineka dirust. Ev çend jî li dû asta  rewşenbîrîyê  wergirî dimîne ka heta çi radeyê şiyan hene bo  têgihîştin û lêkdana gotinê yan deqî.
Herwiha armanc ji têgihîştina deqî bo xwendevanî em dişên di çend xalekan da kurt bikin :

1- Guherîna hêmayan bo wateyê û şiyanên xwendinê digel famkirinê li dev xwendevanî peyda dike.
2- Zêdekirina ferhenga zimanî ya xwendevanî  di mîyana xwendina babetên hemereng (cuda cuda).
3- Dê zanyarî li ser şêwazê nivîsînê hebe û rêyên derbirîna fikran.
4- Dê layenê wî yê merîfî berev astekê baş diçe ji egerê gelek xwendina babetên giştî.
5- Berfirehkirina serborîyên xwendevanî  di bîyavên giştî da.
6- Asta derbirîn û têgihîştina xwendevanî  berev pêşve bibe û behreya têgihîştinê li dev peyda dike (Seher Kamil Kazim, 2018: 1196).

### 3.2.2. Hokarên Zimanî yên  Dibine Egerê Tênegihîştinê

Gelek dîyarde hene di astên cuda yên  zimanvanîyê da dibine egerê  şûlîyatîyê û berzekirina wateyê  û dibine asteng bo têgihîştineka dirust yan  derengbûna têgihîştinê. Wan hokaran em dê di çend astan da kom bikin:

1- **Asta Fonolojî**

Ziman dîyardeyeka gelek aloz e. Wekî dîyar e biçûktirîn  keresteyê zimanî deng e. Komeleya dengekî  ku  hemûyan pêkve  heman nirx hebe û di zimanekî taybet da  yek fonîm  pêk tînin û çend fonîm bi yasaya fonolojîyên zimanekî taybet  lêk dide (Wirya

Umer Emîn, 2004: 24). Bêguman fonîm biçûktirîn yekeya zimanî ya bê wate ye. Lê belê wateyê diguhêre, gelek caran cihguherîna fonîmê kartêkirinê li ser wateyê dike û aloz dike û dibe egerê guherîna wateyê yan di reng têgihîştina wateyê. Bo mînak :

Erzaq ⟶ Ezraq

Cum'e ⟶Cu'me

Rub' ⟶ Ru'bi .

Eger em li van mînakan binêrin dê bibînin ku bi tenê fonîmek hatiye guherîn wateya peyvê şûlî kiriye û mirov bi hêsan tênagêhe. Dibe gelek caran mirov bi wateyên cuda cuda serederîyê digel bike.

2- **Asta Morfolojîyê**

Kurtkirina peyvan û destkarîkirina peyvan ku hindek peyv ji encama kurtkirinê dibe hokarek bo tênegihîştinê. Bo nimûne peyva “bon” bi çend şêwazan tê. Wek: “bo, bên”. Dîyar e ku “bon” ji bo “bên”ê bi hêsantir e, lê belê “bo” siviktir e bo gotinê. Çunke jimareya fonîman kêmtir e. Lê belê “bo” hevbêj e digel “bo”ya amraza peywendîyê û “bo?” amraza pirsê. Ev dîyarde bara pitir di şiirê da rû dide û bi taybet şiira klasîkî ji ber pêdivîyatî ya şiirê (Ebdalwahid Mişîr Dizeyî, 2015: 89).

3- **Asta Lîksîkî**

Yek ji hokarên dibine egerê dirustbûna şûlîyatîya wateyê, hokarên lêksîkî ne (Wirya Umer Emîn, 2004: 143). Ji wan peyvan pêk tê yên berbelav nebûne û gorankarî ser da hatî yan peyvên mirî yan yên wateya wan ron û aşkera nîne. Bo nimûne, peyva “nawûrte”, bikarînana wê di risteyê da: “Dê bibêjî nawûrteya kewan e)”, ku peyva nawûrte ji peyveka resen a kurdî ye di nav devoka badînî da ku bi wateya “xebse”yê tê û bo wê demê tê gotin dema çend kesek bi hev ra xeber didin û kesên dewrûberên wan tênegêhin ka çi dibêjin. Ev cûre peyvên ferhengî dibine egerê tênegihîştina wateya risteyê.

4- **Asta Ristesazîyê**

1- Dirêjîya Risteyê

Gelek riste û gotin hene dirêj in ku guhdar nikare wêneyê dengî zû wergire û di nav bîrdankê da bimîne. Çunke hindek guhdaran şiyanên bîranîna gelek zanyarîyan nîne. Ji ber hindê hindek daxwaza dûbarebûnê dikin. Çunke mêjî dereng werdigire. Bo mînak; ew qutabîyê nimreya yekî bi dest ve anîye kurê xaleta cîranê xesûya birayê min e. Bo hindek guhdaran ev derbirîn gelek dirêj e bi hêsan tênagêhe û mêjîyê wî wernagire.

2- Ew risteya gelek zanyarîyan bi xwe ve digire

Bêguman her gotin û risteyekê radeya zanyarîyan cûr bi cûr in û hindekan kêm zanyarîyan bi xwe ve digirin û hindek gelekan bi xwe ve digire. Hindek zanyarî hene nehatine dirkandin. Lewra hindî pêzanîn gelek bin û nû bin dê dereng bêne têgihîştin. Anko ew risteya sê gotin tê dabin dê bi sanehîtir be bo têgihîştinê ji wê risteya şeş gotin tê da hatibin (Ebdilwahid Mişîr Dizeyî, 2015: 83-84). Bo mînak; mamostayî digel qutabîyên xwe sera qutabîyekî nexweş da. Di vir da tê da ev gotin hene:

A- Mamostayî sera qutabî da.
B- Mamosta digel qutabîyên xwe çû.
C- Qutabîyek nexweş bû.

Herwiha di risteya: Azad û birayê xwe pêkve çûne cejna cîranê xizmê azadî. Di vê risteyê da ev gotin hene:

1- Azad çû.
2- Birayê Azadî çû.
3- Azad û birayê xwe pêkve çûn.
4- Roja cejnê ye.
5- Cejna cîranê xizmê Azadî.

Di risteya yekê da sê gotin hene. Lê belê di risteya duyê da pênc gotin hene. Anko risteya yekê bo têgihîştinê ji risteya duyê asantir e.

3- Qutbûna Di Navbera Firêzan (Girêyan) da:

Ew laristeyên ji hevdu qut dibin têgihîştina wan girantir e ji wan laristeyên bi ser yek ve têne gotin. Bo mînak;

A- Ew qutabîyên ku hatine hilbjartin derçûn.
B- Derçûn ew qutabîyên ku hatine hilbjartin.

Di risteya yekê da risteya "hilbjartin derçûn" bi ser yek ve hatine. Lê di risteya duyê da bi ser yek ve nehatine û hindek peyvên dî ketine di navbera wan da. Lewra risteya yekê ji ya duyê bi sanehîtir e ji bo têgihîştinê.

4- Derbirînîyên Neasayî:

Derbirînên neasayî dibine asteng bo têgihîştineka dirust. Bo mînak;

A- Pirtûk li ser mêzê ye.
B- Mêze li bin pirtûkê ye.

Risteya yekê bi sanehîtir bo têgihîştinê ji risteya duyê. Çunke ji layê wateyê ve pesendtir e û derbirîna wê dirustir e ji risteya duyê.

5- Guherîna Cihê Siruştî yê Pêkhateya Risteyê :

Di her zimanekî da yasaya rêxistina keresteyên risteyê hene û her gorankarîyek dirust be dê bibe egerê di reng têgihîştinê . Bo mînak:

A- Azadî av vexwar.
B- Av vexwar Azadî.

Risteya yekê bi sanehîtir e bo têgihîştinê. Çunke li dû yasaya rêzimana zimanê kurdîyê biker û berkar û kar di cihê xwe da dirust hatne rêzkirin. Lê belê risteya duyê ji yasayê ladaye. Çunke destpêkê berkar hatiye û paşî kar û li dûmahîkê biker hatiye. Ev çend jî berûvajî yasayên rêzimana kurdî ye.

6- Derbirînên Berûvajî

Wan derbirîna bi xwe vedigire ku berûvajî boçûn û şêweyê berbelav in. Bo mînak; **Azadî pantora xwe kirê û nivist.**

Ev riste berûvajî şêweyê asayî û berbelav e. Çunke li dema nivistinê kes pantorê naketê. Belku bi cil û bergên nivistinê dinivin (Dizeyî, 2015: 85-87).

5- **Asta Watesazî**

1- Wateya Hevbêjîyê

Ew peyvên hevbêj hokar in bo dereng têgihîştinê. Bo mînak; peyva "şîr"


A- Şîrê bizinê bikire.

B- Şîrî bikire.

Di risteya duyê da mebest ne dîyar e ka şîrê vexwarinê ye yan şîrê şerî ye. Risteya yekê ya bi hêsan e bo têgihîştinê. Lê belê risteya duyê mirov bi hêsan tênagêhe. Çunke peyva "şîr" du ramanan dide, tu nizanî ka şîrê vexwarinê ye yan şîrê şerî ye.

2- Firehwateyî:

Firehwate dîyardeyeka wateyê ye û egerekê sereke ye bo dirustbûna şûlîyatîya wateyê (Perwîn Usman Mistefa, 2009: 144). Bo mînak :




1- Wateya **Yekê** : Wê malê zilamek tê da ye. (Wate jin nîne)

2- Wateya **Duyê** : Wê malê zilamek tê da ye. (Wate yek zilam)

3- Wateya **Sêyê** : Wê malê zilamek tê da ye. (Sîfetê Mirovekî Baş)

### 3.3. Qonaxên Xwendina Pragmatîkî Ya Deqî

Prosesa xwendinê çalakîyeka giring e bo pêkvegirêdana van hersê cemseran “nivîser, deq, xwendevan”. Anko xwendin peywendîyeka sê qolî dirust dike di navbera van hersê cemseran da . Bêguman eger prosesa xwendinê nebe deqî çi buhayek û hebûnek nabe. Xwendin xala pêkvegirêdanê ye di navbera “nivîserî, deqî û xwendevan”î da. Eger peywendî di navbera van her sê cemseran da veqetîya û lawaz be, bêguman prosesa gehandinê bi cih nahê, yan dê lawaz û tejî kem û kurtî bin. Lewra giring e ev cûre peywendî peywendîyeka xurt û bihêz be da ku derencameka berhemdar û peyamdar hebe.

Xwendin çalakîyeka rewşenbîrî û erênî ye ku bi rêya kiryara hebûna deqî diselimîne. Anko xwendin kiryareka peywendîkirinê ye û derencamgihîştina wateya deqî ye. Ji ber vê çendê xwendinê rehendeka ji derve heye û merc nîne saxletên hunerî yên ji nav da tê da bin. Herçend xwendin erka peywendîyên navxwe jî bi xwe vedigire ji bo gihîştina mebest û wateya deqî (Baqir Casim Muhemed, 2009: 115). Ku wate, hebûna deqî bi çalakîya xwendineka erênî û pragmatîkî ve girê daye çi xwendin û dîyarkirina rehendên di nav deqî bin yan rehendên dewrûberên deqî bin. Anko bi her rengekî xwendinê be armanc jê gihîştina wateya deq û mebesta nivîserî ye.

Herwisa xwendin proseyek e ji du beşan pêk tê. Beşa yekê “famkirin”, anko têgihîştin û pişkinîna deqî, vedîtina wateyên veşartî û layenên hunerî yên deqî. Di pişkinîn û vedîtinê da xwendevan derbareyî ew deqê dixwîne wekî nivîserî di qonaxa wergirtin, têgihîştin û afirandina dîmen û dîyardeyên dewrûberî da ye. Di vêrê da çawa ew dîmen û dîyarde û dewrûber xwe ser nivîserî disepînin û di heman demê da berhemanîna edebî xwe li ser xwendevanî disepîne. Di prosesa xwendinê da xwendevan berhema hunerî û nivîserê wî berhem û wek dû tiştên sepandî di pişkîne û hewla vedîtina wî dide. Yan xwendevan bi şêweyekî babetîyane dinêre berhem û nivîserî. Di beşa duyê ya xwendinê da xwendevan hewla afirandina wê berhemê dide xwandiye. Anko dîyarkirina wê berhemê bi rêya hilsengandin û wênekirina wî bo berhem û ew tiştên wî xwendî û fam kirî û ew amajeyên têgihiştîye (Can Pol Sartir, 1984: 48). Anko

di xwendina yekê da pişkinîn û vedîtina zanyarîyan dike û di xwendina duyê da wan zanyarîyan bi şêwazê xwe yê taybet da dadirêje. Ev proses hemû di nav mêjî da tê encamdan û hinde caran li ser kaxezê jî tê derbirîn dema rexnegir şirovekirina deqekî dike.

### 3.3.1 . Rola Xwendevanê Deqî

Wekî amaje pê hatiye dan ku xwendevanî roleka herî giring heye di sêgoşeya “nivîser, deq û xwendevan”î da, ku xwendevan senterê wergirta mebest û peyama nivîserî ye. Herwiha deq ew gorepan e ya xwendevan û nivîserî digêhîne yek û di heman demê da xwendevan xala girêdana di navbera nivîser û deqî da ye. Anko xwendevan palewanê gorepana deqî ye û çendîn rolên giring di vê gorepanê da digire. Em dikarin rolê xwendevanê deqî di van xalên li xwarê da kom bikin:

1- Xwendevan bi tijîkirina valatîyên deqî radibe.
2- Wateya veşartî ya deqî dîyar dike.
3- Pêkvegirêdana parçeyên deqî yên nepêkvegirê dayî.
4- Darişţina binyatê deqî.
5- Avakirina avahîya dûmahîkê ya deqî (Murad Ebdulrehman Mebruk, 2015 : 166).

Ku wate xwendevan deqî hemûyê diherifîne û serûnû deqekî nû berhem tîne. Li vê derê dîyar dibe rola xwendevanî beramberî rola nivîskarê deqî ye û dibe zîyatir jî be. Wekî me amaje pê kirî, di rêbaza binyatgerî da nivîser piştguh hatiye avêtin û bi tenê deq û xwendevan giring bûn. Vê çendê jî rol û pêgeha xwendevanî di nav deqî da mezintir lê kir û deq bi temamî xiste jêr desthilata xwendevanî.

Herwiha Stanlî Fîş li cihê nivîserî û deqî, xwendevanî dike berhemanîna wateyê û sînorê desthilata deqî jî kêm dike û desthilata xwendevanî berfirehtir lê dike û heta gihîştiye wê radeyê xwendevanî bixe cihê nivîser û deqî. Anko êdî xwendevan wateyê dirust dike û dikare deqî berhem bîne li cihê nivîserî (Yadigar Letîf, 2012: 116). Herwiha digel giringîpêdana Stanlî Fîşî bo xwendevanî, derbareyî xwendevanî pirsyarekê araste dike, dibêje: Aya xwendevan kî ye? Di bersivê da dibêje: Ew

xwendevanê ez behs lê dikim bînayeka avakirî ye û xwendevanekî nimûne, şareza, pêgihîştî û xwedan şiyan e. Herwiha Fîş bo xwendevanê şareza sê mercan didane:

1- Divêt xwendevan bi başî bi wî zimanî biaxive yê deq pê hatiye nivîsîn.
2- Divêt xwendevanî pêzanînên temam li ser zanista watesazîyê hebe.
3- Divêt xwendevanî ezmûneka baş ya xwendinê hebe û bişê dakeve di nav taybetmendîyên gotar û cûreyên wê da. (Letîf: 121).

Ku wate divêt layenê merîfî yê xwendevanî di asteka baş da be û taybet hilgirê wan hersê xalên serî be. Heta ku xwendevan bişê bi başî deqî bixwîne û têbigêhe. Bi awayekî pragmatîkî qonaxên xwendina deqî derbaz bike û bigêhe encameka baş ku wateya di nav deqî ye û têgihîştina mebesta nivîserî ye ya derveyî deqî.

### 3.3.2. Pêngavên Xwendina Pragmatîkî ya Deqî

Qonaxên xwendina deqî ji kesekî bo kesekî tê guherîn. Renge gelek şêwaz û cûreyên cuda mirov di çavkanyan da dibîne bo pêngavên xwendina deqî. Li vê derê em dê behsa qonaxên xwendina deqê edebî bikin. Çunke karê me li ser şirovekirina deqên edebî ye. Em dişên qonaxên xwendina deqî li ser van xalên xwarê parve bikin:

1- Xwendin û pişkinîna deqî.
2- Xwendineka kûr û hûr li dûrî deqî.
3- Xwendin û têgihîştina deqî.
4- Xwendin,şirovekirin û hilsengandina deqî. (https://storyandistora.wordipress.com).

1- Xwendin û Pişkinîna Deqî

Mebest ji vî cûreyê xwendinê xwendineka serpê û bilez e. Li vê derê xwendevan bi xwendineka ser ve hemû deqî bi temamî dê bixwîne, heta ku peywendîyeka mêjîyî digel deqî dirust bike. Dema xwendevan deqî dixwîne bo hindê ye da têbigêhe. Kirdeya xwendinê yek ji wan rêyan e bo têgihîştina deqê nivêsî. Di vê qonaxê da xwendevan hewl dide wateya parçeyên deqî pêkve girê bide, ku bi têgihîştina netemam tê navkirin. Anko nagêhe wateya giştî ya deqî (Ebdilwahid Mişîr Dizeyî, 2015: 106). Dema mirov

cara yekem deqî dixwîne, bêguman nikare bi temamî li deqî bigêhe heta çendîn caran dubare bike û hemû parçeyên deqî bi temamî bi xwîne û li serê raweste. Caran yekê ya xwendina deqî bi tenê bo hindê ye xwendevan agahdarî hemû zanyarîyên nav deqî be û bibe rêxweşkerek bo qonaxa duyê ya xwendinê ku têgihîştin e.

2- Xwendineka kûr û hûr li dûrî deqî

Xwendina duyê bo deqî xwendineka gelek giring e. Çunke di vê xwendinê da xwendevan digel deqî têkel dibe û hemû çemk û têgehên di nav deqî da dîyar û ron dike. Herwiha hemû ew peyvên bûne kilîlên deqî dest nîşan dike û hemû kodên girtî yên deqî vedike. Herwiha Ayzer karê edebî dike du parçe, dibêje: Cemserek hunerî ye ku deq e ji alîyê nivîserî ve hatiye dirust kirin. Cemserê duyê îstatîkî ye ku ji layê xwendevanî ve tê bercestekirin (Erxewan Muhemed, 2013: 102). Ku wate, divêt xwendevan di xwendina duyê ya deqî da bi erka bercestekirina deqî rabe û hemû parçe, çemk û hizrên deqî jêk vavêre û berev têgihîştinê biçe.

3- Xwendin û Têgihîştin

Piştî xwendevanî deq bercestekir, hemû kodên deqî şikandin û kilîlên sereke yên deqî dest nîşan kirin. Di qonaxa sêyê da xwendevan berev têgihîştina deqî ve diçe. Çunke stratejîya deqî bo kontrolkirina kirdeya têgihîştina xwendevanî ye ku berpirs e bi çawanîya dabeşkirin, rêxistin û ronkirina têgehên nav deqî da (Muhemed, 2013: 121). Têgihîştin kirdeyeka mêjî û dirkpêkirinê ye û girêdayî ye bi wan zanyarîyan ve yên di bîrdanka xwendevanî da ku xwendevan têgihîştina deqî li ser wî binyatî berhemê tîne. Anko bo destveanîna xwendineka famkirî gelek caran xwendevanî pêdivî zanyarî û alavên ji derveyî deqî dibe. Çi dewrûberê deqî be wê deqî tê da hatiye nivîsandin yan jîyan û îdeolojîya nivîskarî be yan bikarînana ferhengê be bo famkirina peyvên giran ên deqî.

4- Xwendin, Şirovekirin û Hilsengandina Deqî

Piştî xwendina serve, xwendina duyê û têgihîştina xwendevanî bo deqê dîyarkirî, di qonaxa çarê da xwendevan bi şirovekirina deqî radibe, her wekî me di qonaxên

şirovekirinê da behsa vê çendê kirî. Ku xwendevan pêkhateyên serve û ji nav da yên deqî şirove dike. Mebest ji pêkhateyên serveyên deqî fonetîk, fonolojî û sentaksê ye ku xwendevan van pêkhateyan şirove dike û bi rê dixe û her parçeyekî didane cihê wê yê dirust li dû yasayên rêzimanê. Herwekî Fûad Efanî dibêje: Xwendevan beşdarîyê di davakirina deqî da dike (Fûad Efanî, 2011: 263). Anko mebest ji avakirina deqî lêkdan û likandna parçeyên deqî ye piştî hilweşandinê. Herwiha pêkhateyên ji nav da yên deqî mebest jê semantic e ku girêdana naverokê bi ruxsarî ve û rêxistina hemû bîrokeyên deqî bi awayekî zincîrî vehangî. Herwiha li dûmahîya xwendinê xwendevan biryara hilsengandinê li ser deqî dide. Anko redkirin û wergirtina deqî bo xwendevanî dizîvire piştî qonaxên xwendinê bi dûmahî anîn.

Ku wate, destpêkê xwendevan wateyan peyvan dîyar dike û kodan dê veke bi rêya ferhenga xwe di çarçoveya wateya guncav ji dewrûberî. Herwiha paşî qonaxa pêkvegirêdana risteyan digel paragrafî dest pê dike û paşî qonaxa şirovekirina wateyê dest pê dike ku birîtiye ji pêkvegirêdana bîrokeyên paragrafî û heta binyatekî wateyê yê bi rêk û pêk û guncav hebe, sercem peywendîyên wateyê derbînin, bi şêweyekî herêmî pêkve bêne girêdan û yekeyeka yekgirtî dirust be li ser asta deqî yek bîroke û derencam hebe.

### 3.3. Tijîkirina Valahiya Deqî

Mebest ji valatîya deqî ew spês e ya nivîserê deqî bo xwendevanî bi cih hêlaye. Çi bi mebest be yan bê agahîya nivîserî be ku raman û wateya parçeyên deqî temam nabin eger ew valatî nehên tijîkirin. Tijîkirina wan valatîyan erka xwendevanî yan ya rexnegirî ye.

Valahîya di nav deqî da ji layê Ayzerî ) ve ew valahî ye ya spî ya nav deqî da ye û divêt xwendevan tijî bike. Ev valatî di nav dewrûberê xwe da tijî nake, belku pêdivî ye di nav dewrûberekî dî da tijî bike. Ku wate pêdivî bi kesekî dî heye. Lê eger xwendevanî şiya vê valatîyê tijî bike ew prosesa peywendîyê digel deqî dest pê kiriye. Valatîya deqî ne rêkûpêkîya di navbera deq û xwendevanî da ye, di dema prosesa xwendinê da

peywendîya edebî dirust dike û ev valahî amajeyek e bo agahdarkirina xwendevanî ku deqî pêdivî pêkvegirêdanê heye (Erxewan Muhemed, 2013: 132). Ku wate, ev valahî ne valahîyeka mezin e, belku derzeka biçûk e di navbera dû parçeyên deqî da ku xwendevan hest ne bi rêkûpêkîya deqî dike û hewl dide wê derzê tijî bike û deqî berev yekgirtineka temam ve bibe. Bêguman bo karê tijîkirina derzyên deqî me pêdivî bi xwendevanekî astbirêz û jîr heye. Çunke di hindek cihan da valatîyên berze û nedîyar hene, ku xwendevanê asayî dê sera derbaz be û hest bi wan derz û valatîyan nake. Herwiha xwendevan dê hewl bide di hindirê deqî da ew tiştê nehatiye nivîsandin û famkirin û pêdivî dizane bê zêdekirin û ronkirin. Dema ev valatî ji layê xwendevanî ve têne tijîkirin, li wê demê peywendî di navbera xwendevan û deqî da tê dirustkirin û deq dikeve jêrî kontrola xwendevanî (Muhemed Ebdulbeşîr Misalitî, 2019: 34). Anko xwendevan li pey têgihîştin û lênêrîna xwe û li dû pêdivîyatîya deqî hewla dagirtin û tijîkirina wan valahîyan dike. Herwiha wateyên veşartî xuya dike û deqî bi awayekî rêkûpêk bi rê dixe. Ev çend jî xwendevanî pal dide bo avakirina deqekî nû. Bo mînak Nalî derbareyî xweştivîya xwe dibêje:

**Herçend ke însan e le ber çawî min û to,**
**Mumkîn nîne em lutfe le însan û beşer da** (Nalî, 1383 : 81).

Di vir da Nalî dibêje: Herçend yara min li ber çavên min û te mirov e, lê belê ev nazikî û ciwanî nabe di mirovî da hebe. Anko mebesta wî “firîşte” ye. Di vê derê da deqî bi çi rengan behsa firîşteyê nekiriye û bo xwendevanî bi cih hêlaye. Anko pêdivî ye xwendevan vê valatîyê tijî bike û wateya wê ron bike. Helbet ev çend jî li ser têgihîştina xwendevanî dimîne. Ka heta çi radeyê dikare wateya deqî lêk bide û bizane ka valatîya deqî li kû derê da ye û dê çi peyv dane di wê valatîyê da, ku digel wateya deqî bi gunce. Xwendevan bo tijîkirina valahîya deqî piştbestinê li ser sê stratejîyan dikin. Ku temamkerên hevdu ne û li goreyî armancê têne guherîn. Stratejî stûna têgihîştinê ye. Çunke hemû layenê deqî tijî dikin yên nivîserî vala hêlane:

1- Xwendin û Hilbijartin: Pêkhatiye ji şiyanên hilbijartin û puxtkirina wateya peyvan û bîrokeyên bimifa ku li deqî bigêhe bê ku hemûyê bixwîne.

2- Pêşbînîkirin: Ew şiyan in yên xwendevanî hene bo pêşbînîkirina wateya beşeka deqî bê ku bigêhe dûmahîka deqî.

3- Derencam: Peywendîyeka lojîkî ye ku pêşekî û encamê bi hevdu ve girê dide. Ev pêkvegirêdana hûr bo yêk parçeya deqî pir giring e (Ebdilwahid Mişîr Dizeyî, 2015: 108).

Ku wate, kurtkirina zanyarîyên deqî di çend rêzan da ku ji naveroka deqî pêk tê. Helbet derencam derbirîna hemû deqî dike û hemû zanyarîyên sereke yên deqî di encamê da têne kurtkirin. Encam ji pîşekî, tiştên biçûk û mezin bi xwe ve digire heta bigêhe wateya dûmahîya deqî. Derxistina encamê ji wan zanyarîyên ber destê me ye ku girêdayî ye ji zanista şirovekarî û paşî dibe destûr, binema û yasa li goreyî pêdivîyatîyê û ev çend girêdayî ruxsar û naveroka deqî ye. Ku ruxsar giringîyê dide peywendîya di navbera peyv û risteyan da û guncavdina di navbera pêşekî û encaman da û venagere bo ketwarê ji derveyî deqî. Lê belê naverok giringîyê bi wateyê dide û pişt bi ketwarê ji derveyî deqî girê dide. Derencama deqî pêk tê ji deranîna wateya dewrûberê deqî, ku ew zanyarîyên nehatine gotin bi rêya wan zanyarîyên hatine gotin bê zanîn. Anko mebest pê wateya veşartî ye ya li pişt wateya ferhengê. Ku wate bi rêya encamê em dişên layenekî wateya deqî bi rêya wateya semantîkî li parçeyekî deqî têbigêhin û parçeyên di jî bi rêya pirkirina wateya dewrûberî bizanin. Bo vê çendê jî Van Dayk dakokîyê li ser du binemayên wateya deqî dike. Ew jî :

1- Wateya Serve: Wateya ruxsarî, zimanî ferhengî, peyv û risteyan bi xwe ve digire.

2- Wateya Kûr: Ev wate ye ya piştbestinê li ser dewrûberî dike û qebareyê têgihîştinê girêdayî ye bi cûreyê xwendevan û asta rewşenbîrîya wî ve. Van Daykî deqêtî bo du binemayan kurt kiriye, ku hem çemkê deqî berceste dike û hem deqêtî ji nedeqî cuda dike (Dizeyî, 110 ). Ku wate pirkirina valatîya wateya deqî li dû cûreyê xwendevan û layenê wî yê epîstemolojî dimîne ka heta çi radeyê wan zanyarîyên veşartî û nehatine dirkandin bi rêya wan zanyarîyên hatine dirkandin bên xuyakirin û digel zanyarîyên aşkera tevlihev bibin û yekeyeka temama wateyê bibexşe. Gelek caran peyv û riste bi tenê wateya pêdivî nagêhînin, belku pêdivî bi dewrûberî heye bo tijîkirin û temamkirina wateya deqî. Çunke di gelek cihan da nivîser valatîyê dihêle heta ku xwendevan tijî bike

yan jî dê çend pirsyara biazirîne û bersivê bo xwendevanî bihêle yan jî deqî bi dawî naîne û encameka temam nade dest xwendevanî ji ber vê yekê hest bi valatîyê tê kirin. Bi vî rengî xwendevan beşdarîyê di avakirina deqê duyê da dike li dema bi tijîkirina valatîya deqî radibe bi egerê zêdekirin û rêxistina zanyarîyên deqî û berfirehkirina wateyê û bidestxistina wateyeka ron û aşkera, ku li vê derê pitir xwendevan di nav deqî da derdikeve û dibe beşeka sereke ji deqî.

### 3.4. KurtkirinaWateya Deqî

Kurtkirina deqî yek ji karên giring ên xwendevanî ye. Ku xwendevan bo têgihîştina deqî penayê bo komkirina çemk û peyvên alozên deqî dibe. Taybetî wan peyvên gelek dubare dibin û şûlî û aloz û peyvên giştî. Yên wateya sereke hildigirin ku bi peyvên kilîlên deqî têne hejmartin. Ku xwendevan bi polînkirin û vavartina peyv û çemkên sereke û bi hilweşandina deqî ra dibe, bi rêya vehandin û likandinê deqekî nû berhem tîne. Wekî dîyar e ku deqî wateyeka temam heye û ji çendîn paragrafan pêk tê û her paragrafek ji çendîn risteyan pêk tê. Bo têgihîştina temama van peregraf û risteyan pêdivî ye hizrên sereke yên deqî dest nîşan bikin bo rêxweşkirin û dîyarkirina parçeyên sereke yên deqî, ku her deqekî pêkhateyeka cîgir û sîstemeka giştî heye. Ji layê şêwaz, dariştin û cûreyê deqî ve û dîyarkirina cûr û babeta deqî rêya têgihîştinê bo xwendevanî bi sanehî dike. Bo kurtkirina wateya deqî Van Daykî sê destûr danane:

1- Jêbirin

Jêbirina wan hemû zanyarîyên zêde, yên dubarekirî. Herwiha hemû ronkirinên dirêjbir û zêdeyî pêdivîyatîyê hatine derbirîn.

2- Berfirehkirina Wateyê :

Mebest ji berfirehkirina wateyê ew e ku wateyeka giştgir û rûn be û şûlîyatî tê da nebe. Bi kêmtirîn peyv zortirîn wateyê bigêhîne.

3- Dariştina Binyatê Deqî :

Destnîşankirina meseleyên sereke û kurtkirina wan û dubare dariştina deqî. Bi dîtina Van Daykî kurtkirin kartêkirinê li wateya deqî dike û wateyê diguhêre (Ebdalwahid Mişîr Dizeyî, 2014: 111).

Bi dîtina min kurtkirin wateya sereke ya deqî naguhêre, lê eger karê kurtkirinê bi awayekî rêxistî û jîrane bê encamdan û hemû bîrokeyên sereke yên deqî û peyvên kilîl bêne destnîşankirin û li dema dariştinê regezên sereke yên deqî berçav bêne wergirtin. Deq li ser sê regezên sereke tê damezrandin. Ew jî:

1- Rêziman : Rêziman roleka sereke dibîne di avakirina wateyê da. Çunke deq piştbestinê li ser rêzimanan dirust dike. Risteyên netemam deqê netemam berhem tîne.

2- Likandin: Likandin amrazên pêkvegirêdanê bi xwe ve digire. Giring e piştî hilweşandina deqê sereke bi awayekî hostakarî parçeyên deqî bi harîkarîya amrazên lêkdanê kurtîya deqî berhem bîne.

3- Vehandin: Mebest ji vehandinê pêkvegirêdana hizrên sereke yên deqî ne. Bi şêweyekî zincîrî ku her parçeyek bikeve cihê dirust di nav deqî da her ji destpêkê heta encamê pêkvegirêdaneka hizrî ya temam hebe. Da ku wateyeka serbixwe û temam bibexşe.

### 3.4.1. Binemayên Kurtkirina Deqî

Bo binemayên kurtkirina deqî Wezah Bîn Hadî çar binemayan dest nîşan dike bo kurtkirina deqî:

1- Binemayê Jêbirinê: Jêbirina hemû hevokên dibine egerê tênegihîştina deqî.

2- Binemayê Lêkdanê: Pêkvegirêdana risteyê bi risteyên dewrûberî ve. Likandin binemayeka giringîya lêkdana parçeyên deqî ne.

3- Binemayê Avakirinê: Dirustkirina risteyê ji hevokên deqî û şirovekirina wan di cihê wan da. Bi mercekî wateya sereke ya bineretî ji dest nede.

4- Binemayê Giştgirîyê: Mebest ji vê xalê derbirîneka nû ye, ya hemû hevokên deqî bi xwe ve digire bi heman wateyê (http://said.net/doat/wadah/index.htm).

Anko rêxistina hemû deqî ji destpêkê heta dûmahîkê û parastina wateya sereke û peyvên kilîlên deqî dike. Ku wate deq dê bê parçekirin bo parçeyên biçûk û paşî bi harîkarîya amrazên lêkdanê dê bê likandin û vehandin. Anko deq ji layê qebarê peyv û risteyan ve dê bê biçûkkirin. Lê belê bi heman wateya deqê orjînal. Bi wateyeka dî gehandina heman wateyê bi peyvên kêmtir.

### 3.4.2. Qonaxên Kurtkirina Wateya Deqî

Helbet gelek rê û şêwazên cuda cuda hatine behslêkirin derbareyî kurtkirin û puxtkirina deqî. Li vê derê em dê hewl bidin baştirîn rê û şêwazan bo kurtkirina deqî xuya bikin (Ebdulfetah Emîr). Çendîn pêngavan bo kurtkirina wateya deqî didan :

1- Têgihîştina Deqî

Têgihîştina deqî pêngava sereke ye bo kurtkirina deqî. Eger mirov bi dirustî li hemû parçeyên deqî negêhe bêguman beşeka mezin ji wateya deqî dê winda bike. Bo têgihîştina deqî pêdivî du pêngavan e:

A- Xwendina Deqî: Xwendeneka giştgir bo hemû deqî bê kirin bi şêweyekî birêkûpêk. Anko xwendineka kûr û hûr bo hemû parçeyên deqî bê kirin. Her ji destpêkê heta dûmahîkê .

B- Destnîşankirina Peyvên Giran: Piştî xwendineka giştgir bo deqî hatiye kirin. Pêdivî ye li ser xwendevanî hemû peyvên aloz û giran dest nîşan bike û şirovekirina wan bike. Taybet ew peyvên sereke yên dibine kilîlên deqî.

2- Destnîşankirina Hizrên Sereke

Destnîşankirina hizr û tewerên sereke yên deqî karekî giring ê kurtkirinê ye. Çunke nabe hizrên sereke bên jibîrkirin û ladan da ku wateya deqî têk neçe. Ev çend jî bi du pêngavan tê kirin:

A- Destnîşankirina pirsyaran li ser deqî.
B- Vedîtina bersivan bo wan pirsyaran. Bêguman ev cûre gengeşe di navbera xwendevan û deqî da dê bibe egerê dirustkirina peywendîyeka bihêz di navbera wan da. Ev çend jî dê wel xwendevanî bike, bi awayekî baş têkelî deqî bibe.

3- Destnîşankirina Hizrên Wergirtî

Mebest ji hizrên wergirtî amadebûna deqekî borî ye di nav deqê ber destê me da. Anko hevdeqî ye îca çi hevdeqîya rastewxwe be yan ne rastewxwe be. Ev çend jî bi du rêyan tê destnîşankirin:

A- Di destnîşankirina gotinên wergirtî:  Gotinên wergirtî çi gotinên mezinan bin yan gotineka zanayekî be yan  hevokên Qurana Pîroz bin yan fermûdeyên pêxemberî bin (s.l.b.).

B- Dîyarkirina hejmarên mînakên bikarhatî:  Mebest pê ew mînakên  babet pê hatiye ronkirin. Bên destnîşankirin û rêxistin.


4- Rêxistina Hizrên Deqî

Rêxistina hizrên deqî yêk ji giringtirîn  pêngavên kurtkirina deqî ye. Bi du pêngavan tê encamdan:

A- Amrazên Lêkdanê: Amrazên lêkdanê  parçeyên deqî bi hev ra girê dide û wateya wan temam dike. Çunke eger hizrên deqî bi şêweyekî lojîkî nehêne rêxistin û pêkvegirêdan, li pey yasayên rêzimanê dê bibe egerê yasayên rêzimanê.

B- Rêxistina hizrên sereke yên deqî: Giring e hizrên deqî bi awayekî zincîrî bêne pêkvegirêdan û rêxistin û yekbûna wateyê bê parastin (http//images.app.goo.gl.).

Em dikarin pêngavên kurtkirina wateya deqî  di vî hêlkarî da  kurt bikin :



wate piştî xwendin û şirovekirina peyvên giran têgihîştin dirust be. Piştî têgihîştinê çendîn pirsyar peyda dibin û piştî bersivdana wan pirsyaran hizrên sereke têne destnîşankirin û jêk vavartina hizrên wergirtî ji hizrên sereke yên deqî û dîyarkirina wan nimûneyan yên babeta sereke pê hatiye ronkirin. Paşî komvekirina hemû hizrên sereke û vehandina wan bi awayekî zincîrî û pêkvegirêdan û likandina wan bi harîkarîya amrazên lêkdanê. Li wê demê dê deqekî nûjenkirî bi şêweyekî kurt û puxt berhem bê. Mebest ji kurtkirinê ew e ku bi kêmtirîn peyv zortirîn wate bigêhînin bi heman mebest û hizir lê bi şêwazekî din.

### 3.6. Pêngavên Şirovekirina Pragmatîkî Ya Deqî

Helbet di beşa duyem da me behsa hindek qonaxên şirovekirina deqî bi şêweyekî giştî û berfirewan kir. Em di vir da bi kurtî dê behsa pêngavên şirovekirina pragmatîkî ya deqî bikin. Zanista watesazî û pragmatîkî giringîyê bi vî cûreyê şirovekirina deqî dikin. Halliday dibêje: dewrûber deqek e, dûkevtîyê deqê dîyar e û pirek e bo girêdana zimanê bi jîngeha ji derveyî deqî (Redullah Bîn Red, 1418:40). Anko şarezayî di qonaxên şirovekirina pragmatîkê da gelek giringe û taybet bo wergirî dema bi lêkdana wateya deqî radibe. Giring e van pêngavan berçav wergire:

1- Vekirina hêmayên deqî û guherîna wan bo cemk û peyvên sade û dîyar. Ev çend jî pêdivî bi stratejîyeka dîyarkirî heye bo dîyarkirina hizra deqî û mebesta wî. Vê çendê em dê di van du xalan da dîyar bikin:

A- Lêkolîn li pêkhateyên sentaks û sîmayên taybet: Wekî jêbirin û pêş û paşxistin.

B- Dûçûna peywendîya di navbera pêkhateyên sentaksê. Anko pêkhateyên risteyan û vavartina risteyan wekî risteyên hoyî, risteyên mercî û hwd. Di vir da wergir dê valatîyan tijî bike da ku peywendîya lojîkî qut nebe û zincîreka pesend dirust dibe. Bo mînak:

Keç : Telefon e.

Kur : Li serşoyê me.

Keç : Spas!

Di vê danûstandinê da keçek û kurek in li cihekî dijîn ku li male ne. Ku wate, jin û zilam in yan xwîşk û bira ne li dema kur diçe serşoyê, zengila telefonê lê dide. Dîyar e telefon bo zilamî bû. Lewma keçê gotê telefon e. Kurî gotî li serşoyê me.We dîyar e kur neşiya bersivê bide. Çunke di serşoyê ve bû. Keçê gotê, spas. Dîyar e keçikê bersiva telefona kurikî daye. Di vir da gelek valatî hatine tijîkirin.

2- Pêngava duyê wergir dê li wateyê bigere û van pêngavan dê biavêje:

A- Girêdana deqî bi dewrûberê ziman û nezimanî ve.
B- Dîyarkirina wateya mebest bi rêya dewrûberê ziman û têbînîkirina hevalînîya di navbera peyvan û guncandina wan û dîyarkirina layenê rewanbêjî .

3- Berawirdkirina wan ronkirinên bo risteyên di nav deqî da kirin ku bi cîhana deqî tê nasîn.


Ew jî ji şarezaya wergirî bi cîhana ji derve di nav hişî da ye. Eger wergir gihîşte wê bawerîyê ku deqekî birêkûpêk û guncav e. Çunke wergirî parçeyên deqî kom kirine û li cihekî mezintir danane ku deq e.

4- Wergir piştî van pêngavan dê dest bi dîyarkirina armanca nivîserî bike ji deqî. Bi rêya:

A- Dîyarkirina wesf, rûdan û kesayetên deqî.

B- Dîyarkirina beş û giştên deqî di çarçoveya deqî da.

Herwiha geşepêdana rûdan û kesayetên deqî bi proje tê binavkirin. Herwiha ronkirina kesayetîyên deqî bi tomar tê binavkirin. Ev hersê tewer binemayên giring in bo deq û wergirtinê (Ebdilwahid Mişîr Dizeyî, 2014 : 123- 125). Anko em bi şêweyekî giştî hengavên şirovekirina wateya pragmatîkî ya deqî dê di vî wêneyî da xuya bikin :



### 3.7. Mînaka Prakîkî Ya Şirovekirina Pexşana Lawikê Min

Em pêş şirovekirina pexşana "Lawikê Min" dê beşekê behsê jîyannameya Dr. Kamîran Bedirxanî (1895-1978) bikin.

Kamiran Bedirxan, lawê Emîn Alî û neviyê Mîr Bedirxan e. Li ser cî û sala ji dayikbûna Kamiran Bedirxan nêrînên cûda hene. Li gorî Aharon Cohen ew, “Sala 1894ê li bakûra Suriyê û 100 km dûrî Helebê li bajarê Jerablosê hatiye dinyayê.” Joyce Blau jî dibêje: “Emîr Kamiran di 21ê Tebaxa 1895ê li Şamê ji dayik bûye” Di sernivîsa çapa nû ya rojnameya *Roja Nû* de hatiye nivîsandin ku “Kamiran Alî Bedirxan, di 21ê Tebaxa 1895an de li Stenbolê ji dayik bûye û xwendina xwe ya ewil jî li Stenbolê xelas kiriye.” ( http://candname.com/kamiran)

Kamiran Bedirxan di sala 1947'an de çû Fransayê û li wir sazgeha lêkolînerî ya kurdî ava kir. Di wan deman de jî li Zanîngeha Parîsê dest bi hînkirina zimanê kurdî kir. Wî di mijarên cihê de, bi zimanên cihê zêdeyî sih pirtûk nivîsandin. Herçiqas pirtûkên wî ên kurteçîrokan tunebin jî, wî kurteçîrok jî nivîsandine. Kamiran Alî Bedir-Xan di salên 1940 de, dersên xwendina kurdî dida Kurdên Libnanê li zanîngeha (Layîk) ya bi nav û deng, tevî beşdarbûnên wî di weşînên bernameyên Kurdî yên radyowa Rojhelatê li Beyrûta Libnanê, ya ku hatibû damezrandin roja 5ê Adarê sala 1941ê. Weşîna radyoyê her hefte 2 caran bû, roja Çarşembê û roja Înê. Kamiran çend pirtûkên xwe jî çap kiribû li çapxane ya Jozêf (Joseph) Selîm Seyqelî li taxa Sokak Al-Bulat.

Kamiran Alî Bedirxan sala 1971'ê serek da Kurdên Beyrûta Libnanê. Di vê seredanê de jî, li gel wezîrê kar û barên navxweyî yê Libnanê, Kemal Jumblat (yê ko ew bixwe kurd e) civiya. Bi hinera Kamiran, Jumblat partiyeke kurdî ramyarî bi awayekî fermî pejirand, û destûra xebata ramiyarî da kurdên Libnanê. Kamiran Bedirxanê ko hemû jiyana xwe dabû çand, ziman û wêjeyê kurdî. (https ://ku.wikipedia.org/wiki/Kamiran)

Dema ku Bedirxanî ji ber bûyera kuştina Şehremînî Ridvan Paşa (24ê Adara 1906an) careke din bi tevî malbatên xwe ve têne nefîkirin, wê demê Kamiran Bedirxan, zarokek yanzdeh salî bû û di Dibistana Sultanî de xwendevanê pola seretayî bû. Kamiran Bedirxan, ji ber vê bûyerê bi tevlî zarokên din ên Bedirxanîyan ji aliyê polîsan ve hatiye destgîrkirin. Ew, bûyera destgîrkirin û birina zarokên Bedirxaniyan ji dibistanê weha tîne ziman:

1. Destpêka nivîskarî û berhemên sereke

Yekemîn berhema nivîskarî ya her du birayan, pirtûka bi navê *Edirne Sûkutunun İçyüzü [Rûyê Hundirîn ê Sûkuta Edirneyê]* ye û di Hezîrana sala 1913an de li Stenbolê hatiye nivîsandin. Dema em li naveroka pirtûka wan binêrin, wisa tê fêmkirin ku her du bira jî wê demê li bajarê Edirneyê di cebheya Şerê Balkanê de bûne. Dema em bala xwe bidin mukadîme û naveroka vê pirtûkê, wisa jê der tê ku wê demê her du bira jî li ser zemîna fikra Osmanîparêzî û Îslamparêzî de bûne. Ev fikr û têgehiştin, di nav rewşenbîrên kurd de wê demê di rewacê de bû. Paşê Kamiran Bedirxan bi xwe jî fikrên xwe yên wê demê wisa tîne ziman; "Ez merivek bawermend bûm, min wisa pê bawer dikir ku divê beriya her tiştî dîn bête parastin." Naveroka pirtûkê jî, vê rastiyê bihêztir dike.

Li paş bergê vê pirtûkê, behsa hinek xebatên din ên birayên Bedirxanî tête kirin, lêbelê em nizanin ku ew xebatên wan hatine çapkirin yan na. Ew heşt pirtûkên ku navê wan hatiye lêkirin, wekî li jêrê hatine nivîsandin û rêzkirin:

1- *Dindaşlarımıza [Ji Hemdînên Me re]*; Celadet Bedirhan û Kamiran Bedirhan.
2- *Saltanat-i Edebiyye [Seltenatê Edebiye]*;çar cild e,Celadet Bedirhan û Kamiran Bedirhan
3- *Hacle [Jûra Bûkê]*; du cilde e, Kamiran Bedirhan.
4- *Kadının Vazife-i İctimaiyyesi [Wezîfeya Civakî ya Jinan],* nivîskara wê, Madam Anna Lamperber e û ji aliyê Süreyya Bedirxan ve hatiye tercumekirin.
5- *Felaketler Karşısında Milli İnfialler [Înfîalên Mîllî li Hemberê Bextreşiyan]*, Celadet Bedirhan û Kamiran Bedirhan
6- *Kurd Aziziye Hükümeti [Hikumeta Kurdî ya Azîzî]*,Süreyya Bedirhan û Kamiran Bedirhan
7- *Muhasara Kıvılcımları [Çirûskên Dorpêçkirinê]*,Celadet Bedirxan
8- *Paris Sen Muhakemesinde Otomobilli Caniler [Kujerên bi Otomobîl di Muhakemeya Sen a Parîsê de]*, Süreyya Bedirhan"

2. Nivîsên di nav *Serbestiy*ê de

Me di hejmarên berdest ên *Serbestiy*ê de panzdeh nivîsên Kamiran Bedirxan destnîşan kirine. Navê meqaleyên nivîskar û dîroka weşandina wan, di rêzeyên jêrê de hatine destnîşankirin:

1- Kamiran Bedirhan, *Kürdler Hakkında [Di derheqê kurdan de]*[12]
2- Kamiran Bedirhan, *Kürdistan* [13]
3- Kamiran Bedirhan, *Kürdistan* [14]
4- Kamiran Bedirhan, *Kürdistan* [15]
5- Kamiran Bedirhan, *Kürdistan* [16]
6- Kamiran Bedirhan, *Kürdistan* [17]
7- Kamiran Bedirhan, *Kürdistan Hakında Selayhiyetdar Olmayanlar [Ew ên ku di derheqê Kurdistanê de ne selahiyetdar in]*[18]
8- Kamiran Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan: Kürdistan'da Haleti Fikriye [Kurd û Kurdistan: Li Kurdistanê rewşa fikrî]* [19]
9- Kamiran Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan: Nazik Bir Vaziyet Karşısında [Kurd û Kurdistan: Li hember weziyetek nazik]*[20]
10- Kamiran Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan: Kurd Lisanı[Kurd û Kurdistan: Zimanê Kurdî]*[21]
11- Kamiran Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan: Kürdlerin Amali[Kurd û Kurdistan: Amelê kurdan]*[22]
12- Kamiran Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan: Kürdistan'a Göz Dikenler [Kurd û Kurdistan: Yên çav berdana Kurdistanê]* [23]
13- Kamiran Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan [Kurd û Kurdistan]*[24]
14- Kamiran Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan [Kurd û Kurdistan]*[25]
15- Kamiran Bedirhan, *Kürdler ve Kürdistan [Kurd û Kurdistan]*[26]

3. Reformekirina zimanê kurdî û perwerdeyî

Xebatên li ser kultur û pêşxistina zimanê kurdî, piştî Meşrûtiyetê bi awayekî hîn serûber û bi rêxistinî hatin kirin.“Piştî îlankirina Meşrûtiyetê, ji bo îsleh û standardkirina kurdî, Komela Kurd ji bo Belavkirina Zanînê û hin rêxistinên din hatibûn damezirandin. Van rêxistinan di dema destpêkirina Şerê Giştî de xebat û weşana xwe dabûn rawestandin. Bi dawîhatina Şerê Giştî şûn ve, van rêxistinan bi belavkirina kovara *Jîn*ê, dest bi berdewamkirina xebata berê kirin. Komeleya navborî ji berê ve dixebitî ku li ser esasê cihê nivîsandina herfan, gramereke zimanê kurdî binivisîne û bide çapkirin. Alfabe hatiye amadekirin û hetanî çend rojên din dê bête çapkirin. Alfabeya ku niha tê çapkirin, ji alfabeya berê bêtir mifedar û mukemeltir e. Em muteşebis û nivîskarên wê pîroz dikin.” ( http://candname.com/kamiran).

Kamiran Bedirxan jî di nivîsa xwe de behsa girîngiya xebata vê komeleyê û karê standardkirina zimanê kurdî dike û dibêje: “Em bi balkêşiyeke mezin civîn û xebata li ser şiklê gramer û îslehkirina herfên zimanê kurd dişopînin ku di navenda Cemiyeta Tealiya Kurdistanê de berdewam dike.Di cedwela xebata ku ji bo temînkirina pêşkevtina dehaya neteweyî ya kurdan tête kirin de, girîngîpêdana îslehkirina herfan, sererastkirina gramerê hêjayê memnuniyeteke fewqalede ye. Êdî naveroka azadbûn, bextiyarî û mesûdbûna milletan, rasterast meseleyeke perwerde û ronahiya medenîbûnê ye. Ew milletên ku zimanê xwe reforme bikin, qaîdeyên gramera xwe sererast bikin, herfên sade û sivik çêbikin, hîç astengek li ber îstiqbal û pêkhatina hêviyên wan namîne. Di halê hazir de ew milletên ku bi eserên xwe yên medenî bûne sebebê heyretê, ew jî demekê ji aliyê îlmî, sinayî, komelayetî û siyasî ve di rewşek gelek perîşan de bûn. Ev rêya rizgarî ya ku îro em pêde diçin, her milletekî di vê rê de tûşê problemên gewre û hetta ji yê me gewretir jî bûne. Ji bo serkevtin û bidestxistina mewqiyeke rêzdar, her daîm fedekariyek mezin lazim e. Di rastiyê de şerefa serkevtinê, bi têkoşîn û hewldana ji bo berhemanînê mimkun dibe. Ne mimkun e ku mirov bi hewldaneke biçûk muwaffaq bibe. Îro zanistiya giştî temîna paşeroj û îqbala cemiyetan e, kurd jî girîngiya vê yekê dizanin û nîşana wê ya herî girîng jî, têkoşîn û hewldana wan a ji bo îslehkirina zimanê kurdî ye. Di vê xebatê de xusûsiyetek tewr girîng ê ku komîsyon dîqet bike ev e: Alfabeya ku ji bo xwendin û nivîsandina kurdî bête dirustkirin, divê gundî jî karibin di demeke kurt de bi wê alfabeyê hînê xwendin û nivîsandinê bibin. Li gorî agahdariyên me, heyeta navborî

piştî gelek tecrûbeyan, bi wergirtina biryara îslehkirina meseleya herfan, îstiqameta xebatê diyar kirine. Meseleyeke tewr dijwar a komeleyê jî, şikl û rêbaza alfabê ye; gelo ev alfabe dê ji milê çepê ber bi milê rastê ve yan ji milê rastê ber bi milê çepê ve bête nivîsandin. Dema em bala xwe bidin girîngiya vê babetê, divê em bi hîssa faaliyeteke azamî û têgihîştineke nûjeniyê tevbigerin. Divê em bala xwe bidin girîngiya rewşê, bi nûjenî û hîssên xebateke azamî tevbigerin. Ji xeynî serkevtinê, divê her qenaet û îctihadên batil ji bo hîssên nûbûnê bêne fedakirin. Esasen dînê Îslamê jî dibêje; bi şertê ku mixalifê emir û hukmên bilind ên îlahî nebe, li gorî pêdiviyên zeman, usilên minasib tetbîq dibin.

Hetta mirovên alim, mutefekîrên maqûl û nûjen, karin bibin mutefîq û tesdîq bikin ku ev yek li gorî Quranê ye jî. Di vê xebatê de, pêwîst e em berê xwe nedin wan rêyên ku qebûlkirina wan ne mimkun be, bi şertê ku pêjnên ruhî û temayulên kurdan rencîde nebe, em karin usilên musaîd ên ku hînbûn û perwerdeyiya kurdî hêsantir bikin bînin wucidê. Bi rastî selehiyet û ehliyeta ew şexsiyetên ku bi van meseleyên îlmî re meşxul in; têrî sererastkirina reformekirina ziman, rêkûpêkkirina herfan dike û ev bûye mecburiyetiyeke pêdivî. Em tebrîkên xwe pêşkêşê wan şexsiyetên pispor û koma îlmî ya ku tevlî xebata reformekirina ziman, sererastkirina qaîde û herfên kurdî bûne dikin û bi hemû hesreta ruhê xwe serkevtina wan dixwazin.”. Di bername û rêznameyên hemû rêxistin û weşanên kurd ên wê demê de, gelek girîngî dane pêşkevtina zanist û perwerdeyiya di nav milletê kurd de. Ji bo destnîşankirin û çareserkirina pirsgirêkên di derheqê perwerdeyiya civata kurd de, munaqeşe hatine kirin û nêrînên cûr bi cûr hatine pêşkêşkirin. Wekî gelek nivîskarên wê demê, Kamiran Bedirxan jî endam û peyrevekî bernameyên wan rêxistinan bû, gelek caran di nivîsên xwe de behsa vê babetê dike û dîtinên xwe yên li ser destnîşankirin û çareseriya problemên perwerdeyî tîne ziman û di nivîseke xwe de dibêje: “Li gor qanûna esasî ya hikumeta Osmanî, perwerdeyiya seretayî mecbûr û bedawa ye. Lêbelê ev hukmê girîng ê qanûnê, ne di gundên kurdan û ne jî yên tirkan de hatiye tetbîqkirin. Ji ber vê yekê, kurd hatine mecbûrkirin ku şiklê jiyana xwe ya îptîdaî (kevnare) bi awayekî giştî muhafeze bikin.” “Dibistanên me negihiştîne qonaxa temînkirin û tetmînkirina pêdiviyên welat. Serkevtina têkoşîna li hemberê rewşa heyî, musabeqe û jiyana îroyîn; bi hebûna ciwanên zînde, xwedî armanc,

xwedî gotin û kiryar mimkun dibe. Her çiqas mektebên me yên îdadî, arîstokrasiyek ezberkarên baş, tebeqeyek minewerên xweşgotin perwerde dikin jî, ji teşkîlkirina tebeqeyek ehlîkar aciz in ku pêdiviya welatê me bi wan heye û gelek muhtacê xizmetên wan e. Di mektebên me yên îdadî de bi salan dersên fransizî têne xwendin lê ji xeynî Sultaniya Galatayê, di mektebên mayî de ne ku piraniya wan, tenê ciwanekî me jî ne weqfê zimanê navborî ye û nizanin. Perwerdeyiya me ya diwanzdeh salî dûrê qabîliyeta tetbîqkirinê ye, piraniya xwendekaran di klasên (sinifên) neh û dehan de mecbûr dimînin ku terka mekteba xwe bikin. Ji ber vê yekê, divê mudetê tehsîlê, qasê demeke minasib bête kurtkirin. Welhasil divê perwerdeyî ruhekî wisa bide ciwanên me ku karibin li hember hemû giranî û dijwariya vê esrê li ber xwe bidin. Di nivîseke din de, em dê li ser usilên perwerdeyiya mekteban, bernameyên wan û di tetbîqkirina bernameyan de tadîlat û çaksaziyên pêdivî rawestin."

4 . Derketina ji bajarê Stenbolê û çûna Almanyayê

Stenbola paytexta Osmanî, di 5ê Çiriya Pêşî ya sala 1922yê de ket bin kontrola tevgera Kemalîst û hikumeta Anqerayê. Wekî gelek siyasetmedar û rewşenbîrên Kurdistanê, di dawiya salên 1922an de, ji aliyê rêvebirên komarê ve "Ji bo Emîn Alî Bedirxan û sê lawên wî; Sureyya, Celadet û Kamiran jî cezaya darvekirinê hate birrîn. Vê biryarê, ew bêgav kirin ku birevin Qahîreyê û ji wê derê ve jî biçin Almanyayê." Em gavên dawî yên vê serûwena veqetandina ji Stenbolê, ji pozê qelema Celadet Bedirxan bixwînin: "Di roja sêşema 26ê Eylûla 1922yê de biryara çûyinê hatibû girtin. Ji bo vê, pasaport û ewraqên rêwîtiyê hatin amadekirin. Rêwîtî, dê roja çarşembê bi vapora Bulgarya, ber bi Varnayê ve dest pê bikira. Serê sibê ya çarşembê, min û Kamiran rahiştin neh walîzên xwe û em çûn nivîsgehê. Beriya çûyina vê derê, bi îhtîmala çêbûna guhartinekê, me serî li acenteyê da. Ji me re gotin, vapora Bulgarî ya ku dê biçûya Varnayê, diçe Pîreyê. Beriya roja şemî jî tu vaporek Bulgarî naçe Varnayê, lê îro piştî nîvro vapora Îtalyanî ya bi navê Scriva diçe Varnayê. Ji bo rahiştina alavên xwe, em bi lezgînî hatin Kadîkoyê û ji wir jî bi vaporek hatin Stenbolê. Lê em dîsa hîn bûn ku vapor îro jî hereket nake. Di vê navberê de em pê haydar bûn ku çenteyekî Kamiran jî wenda ye. Kamiran ji bo lêgerîna çenteyê vegeriya salonê, lê ew ê ku çente bi xeletî rahiştibû li

me vegerand. Di wê navberê de barkêş û polîs hatin nav vaporê û îlanek li embara vaporê hilawîstin. Li gor vê îlanê, vapor dê nîvroya roja dinê hereket bikira. Piştî vê agadariyê, em jî vegeriyan û wê şevê jî li mala xwe man. Roja çarşema 27 Eylûla 1922yê, me dîsa xatir ji hev xwest û daketin Stenbolê. Vaporê ala xwe ya hereketê hildabû û saet tam di yekê nîvroyê de bendera Stenbolê terk kir."

Her sê birayên Bedirxanî; Sefder, Celadet û Kamiran Bedirxan diçin Almanyayê û li wê derê dest bi xwendina unîversîteyê dikin. Sefder Endaziyerîya Daristanê, Celadet û Kamiran jî hiquqê dixwînin.

5. Xebata di nav Xoybûnê de, kovarên Hawar, Ronahî, Roja Nû, Stêr

Ji ber ku ev dema Kamiran Bedirxan bêtir tê zanîn, ez dê bi kurtayî behsa vê deme bikim. Piştî ku xwendina xwe ya li Almanyayê xelas dike, derbasê Binxetê dibe û tevlî xebata Xoybûnê dibe û paşê jî bi tevî Kekê xwe yê Celadet di nav pêvajoya derxistina *Hawar*ê kar dike. ( http://candname.com/kamiran).

**Kovara Hawarê**

Hejmara yekemîn a ***Hawarê***, di 15yê Gulana 1932an de roja yekşemê li Şamê di çapxaneya Terekî de hatîye çapkirin. *Hawar* ji panzdeh (15) rojan carek bi kurdî-fransizî hatîye weşandin û li ser hev 57 hejmar (15.08.1943) hatine çapkirin. Sala pêşî kêm-zêde li gorî peryoda xwe têtе weşandin û paşê peryoda weşanê xera dibe, dem deman weşana wê mudetên dirêj hatîye rawestandin, hetanî Tebaxa sala 1943yê li ser hev 57 hejmar têne çapkirin. Naverok û babeta kovara *Hawar*ê:

1- Ziman û millet
2- Alfabe û Rêziman
3- Ferheng
4- Edebiyat û folklor
5- Danasîna klasîkên Kurd
6- Wergerandin
7- Tarîx û Erdnîgarî

8- Jîyana civakî û neteweyî
9- Kitêbxaneya Hawarê
10- Nameyên xwendevanan

**Nivîskarêne *Hawar*ê**

Celadet Bedrirxan, Rewşen Bedirxan, Dr. Kamiran Bedirxan, Osman Sebrî, Qedrîcan, Cegerxwîn, Mistefa E. Botî, Qedrî Cemîl Paşa, Dr. Nûredîn Zaza, Lewê Fendî, Ehmed Namî, Hesen Hişyar, Bişarê Segman, Nêrevan, Reşîd Kurd, Tewfîq Wehbî, Evdil Xaliq Esîrî, Şakir Fetah, Hevindê Sorî, Pîrot, Lawêkî Kurd .Celadet Bedirxan di *Hawar*ê de bi navên wekî Herekol Azîzan, Xweyîyê Hawarê, Hawar, Stranvan, Stranvanê Hawrê, Bavê Cemşîd, Bavê Cemşîd û Sînemxanê nivisîye.

**Ronahî**

*Ronahî*, di 1ê Nîsana 1942an de li Şamê bi serpereştiya Celadet Bedirxan dest bi weşanê dike, peryoda weşana wê mehane bûye û li ser hev 28 hejmar hatine çapkirin. Dema weşana *Ronahî*yê rastê dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn tê.

**Roja Nû**

Di 3yê Gulana 1943an de li Beyrûdê bi serpereştiya Kamiran Bedirxan dest bi weşanê dike, kovareke hefteyî bûye û li ser hev 73 hejmar hatine çapkirin. Hejmara dawî di sala 1946an hatîye weşandin. Kovara ***Stêr*** jî, li ser hev 3 hejmar wek pêveka roja nû hatîye weşandin. Ew, di sala 1947an de çûye Fransayê û li wê derê ***Navenda Lêkolînên Kurdî*** ava kirîye, demeke dirêj berpirsiyarîya navendê û herweha nûnerîya tevgera neteweyî ya Kurd û Mistefa Barzanî li Awrupayê kirîye. Li nik pisporên Awrupayî Kamiran Bedirxan, heman demî pisporekî rojhelatnas dihate qebûlkirin û li ser meseleyên Rojhelatê gelek caran pê dişêwirîn. Di sala 1954an de bi jineke Polonî (Nathalîya) re dizewice. Zarokên wî nîn in. Wî, ji bilî Kurdî, bi zimanê Almanî, Fransizî, Arebî, Osamnî, Farisî zanibû. Qasê ku ez dizanim, hetanê îro 30 pirtûkên wî hatine çapkirin.

**Dawî**

Bi giştî gelek endamên malbata Bedirxaniyan û bi taybetî jî Emîn Alî Bedirxan û zarokên xwe; Sureyya, Celadet û Kamiran di pêvajoya pêşkevtina fikra/hizra neteweyî û tevgera rizgarî ya Kurdistanê de xwedî ked û roleke pirr girîng in. Wan ji aliyê xebata siyasî, rêxistinî, çapemenî, kulturî û dîplomasiyê ve gelek xizmetên mezin ji bo neteweya kurd kirine. Em bi awayeke giştî dikarin xebata rewşenbîrî/kulturî û sîyasî ya Kamiran Bedirxan, bi ser çar dewran ve dabeş bikin. Dewra yekemîn, ji salên 1913an bigre hetanî dawîya Şerê Yekemîn ê Cîhanê dom dike; pirranî û giranîya xebatên wan ên vî demê, di çarçoveya fehma "yekgirtina osmanî" û "umetparêzî" de li ser kultur û edebîyatê ye. Dewra duyemîn, ji rawestandina Şerê Yekem ê Cîhanê şûn ve bi damezirandina Cemîyeta Tealîya Kurdistanê dest pê dike û hetanî derçûna ji Stenbolê dom dike; giranîya nivîsandin û xebata vê demê jî li ser karê rêxistinî û sîyasî ye. Hemû berhem û nivîsên wan ên vê demê, bi zimanê osmanî hatine nivîsandin. Dewra sêyemîn, ji tevlîbûna xebata Xoybûnê bigre, çapkirina kovarên *Hawar, Ronahî, Roja Nû, Stêr* yanî hetanî çûna wî ya Fransayê dewam dike. Dewra çaremîn jî, xebatên wî yên li Fransa û dewletên Awrupayî ne. Kamiran Bedirxan, di 4ê Çiliya Pêşî ya sala 1978an de ji nav me veqetiya û li Parîsê koça dawî kir. Li ser wesiyeta wî, laşê wî dane Fakulteya Tibbî ya Parîsê ji bo lêgerînên zanistî. Em xebat û keda wî ya ji bo milletê kurd, qet jibîr nakin û di salvegera mirina wî de, careke din wî bi rêz û hirmetê yad dikin

### Mînaka Prakîkî Ya Şirovekirina Pexşana Lawikê Min

## LAWIKÊ MIN

Gava ko fermana kurdan rabû, em hêj nû zewicî bûn. Şevekê tu pir dereng mayî û gava tu hatî mal, di destê te de tivngeke nû û çend sed berik hebûn. Dilê min tirsiya û ricifî. Min ji te re bi dengekî lerizî digot:

- Gurgîn … dîsan çi heye?

Te li min bi hêvîna çavan û bi kesera dilan mêze kir, paşê bi dengekî xurt li min vegerand.

- Dawet dest pê dike.

Di welatî de şeş meh şerekî zor çê bû, jin bî bûn, zaro sêwî man. Kurd destpêkî de dijmin şikandin. Lê, paşê bi bêbextî hatine şikestin.

Gava tu di şer de bûyî min ji te re kurikek anî. Êvarekê, ez li ber derîyê malê sekinî bûm, çavên min li rê bûn. Min dît tu hatî. Herdu destên te bi xwîn bûn. Di ser sînga te de birîneke kûr û vekirî hebû. Te, ez himêz kirim û te got eskerên dijmin di ser şopa min de ne; bawer ke niho ewê bên û min bigrin, megrî!!!

Tinê vê demê ji bîra meke.

Paşê tu bi gavên lez çûyî ser dergûşa kurê xwe yî pêncmehî Tacîn, û te ew hilanî û jê re got :

- Tacîn!! Dilê te ji bona arîkarîya Kurdistanê ye. Xwîna te ji bona şer û rijandinê ye.

Te kurê xwe dikir dergûşê û eskerên dijminan diketin hindirê malê....

Lawikê min! îro pênc sal qediyane ko em, ji hev dûr hatine êxistin. Tu niho di kortalekê de bi çarsed camêrên kurd radikevî.

Xwedê dizane… Çermê rû û sînga te perçifî û laşê te riziyaye.

Lê, Gurgîn! Bizane ko her şev berî here rakeve, kurê te Tacîn zend û destên xwe ên nerm davêje ser stoyê min û bi çavên xwe ên zelûl û bikeser li min mêze dike, min maç dike û ji min re dibêje:

- Dayê!.. Dayîka min bavê min re binivîsîne ko mezin bûme. Dilê min ji bo hejkirina Kurdistanê ye, xurtîya ji bona arîkarîya Kurdistanê ye, xwîna min ji bo şer û rijandinê ye !!! ( Dr. Kamiran Alî Bedirxan ,1932 : 63 ).

**Şirovekirina pexşana "Lawikê Min" ji alîyê pragmatîkê ve**

Pêngava **Yekem**: Dîyarkirina Hizra Deqî

**1- Dîyarîkirina Çemkan**

A - **Gurgîn**: Gurgîn yêk ji kesayetên sereke yê pexşanê ye, ku nivîserî sîfetê giyanewerekî pê bexşîye bi navê "gur" ku bi mebesta zîrekî, azayetî û çavnetirsîyê tê nasîn. Herçend ev cûre giyanewer bi giyanewerekî dirinde tê nasîn, lê belê mebest jê sîfetên azayetî, zîrekî û wêrekîyê ne. Herwiha yek ji sîfetên sereke yên gurî hişyarî ye, ku herdem şoreşgerên kurd wek gurî di hişyar in û di çeperê bergirîyê da ne.

B – **Dawet** : Dawet wek ferheng anko şehyan yan ahinga pêkînana hevjînîyê. Lê di vir da nivîserî dawet kiriye hêmayek bo şerî, ku şoreşvanê kurd berdewam di nav ceng, nexweşî û şerên berdewam da bûne ji bo berdewambûn û bilindkirina morala xwe her dem ceng wekî dewatê dîtine ji bo azadkirina welatê xwe. Ji ber hindê ceng bo wan dawet bû û berxwedan semakirin bû.

C- **Tiving** : Wek hêmayeka bergirîyê bi kar anîye, ku tiveng berdewam yek ji wan çekan bûye her dem di destên şerkerên kurdan da bûye ji bo parastin û bergirîkirina mal, welat û namûsa xwe.

D- Herwisa nivîserî di vê pexşanê da " **jin** " wek hêmayeka xweragirîyê bi kar anîye. Eger em bi zîvirîn şoreşên kurdî, dê bibînin ku ku jin hêmaya bergirî û berdewambûna giyanê şoreşê bûye û roleka aktîv hebûye di nava şoreş û berxwedana gelê kurd ku jina kurd şiyaye bibe dayîk û di heman demê da şiyaye bibe bab û bi rola zilamî ra bibe bo birêvebirina xêzanê ji her alîyekî ve, dema hevjînê wê li çeperên şoreşê û herwiha di nava şoreşê jî da roleka baş hebûye li alîyê xizmetkirina şoreşgeran ve.

E- **Zarok** : Zarok bo hêmaya paşerojê bi kar anîye, da ku cihê babê xwe bigire û şoreş berdewam be. Ev çend jî her bo rola jina kurd dizîvire di perwerdekirina zarokê kurdan ku bikare di paşerojê da cihê babê xwe bigire û berdewamîyê bide rêbaza wî.

Herwiha di mêjûya mirovayetîyê da berdewam "jin û zarok" bi hêmayên lawazîyê hatine hejmartin. Ku her dem di etîka cengî da pêdivî ye jin û zarok di parastî bin û kes destî bo nebe. Lê wekî dîyar e dijminên gelê kurd pêl hemû yasa û etîka şerî danane ji bo gihîştina armanc û mebesta xwe.

**2- Pêkhate û Ladanên Sentaksê**

Di vir da nivîserî gelek cihan yasayên sentaksê pêş lê kirine ji bo hunera ciwankarîya deqî. Wek mîna muzîkeyekê bi kar anîye, da ku xwendevan xweşîyekê jê wergire. Bo nimûne "Şevekê tu pir dereng mayî". Di vê derê da pêşî û paşîya biker û tewawkeran kiriye ji bo ciwanîya derbirînê. Ev çend jî di deqên edebî da tiştekî asayî ye. Çunke nivîser yarîyan bi peyvan dike ji bo gehandina mebesta xwe bi rêya hunera derbirînê. Anko rêziman li dev wî giring û merc nîne ku hemû yasayên rêzimanê bi hûrî cî bi cî bike. Ya giring dev wî ew e dê çawa peyama xwe bigêhîne xwendevanî bi rêya hunera derbirînê û di heman demê da bikare serinca xwendevanî bo xwendina deqê xwe bikêşe. Herwiha cihnavên serbixwe bi awayekî ron hatine bikaranîn, taybet cihnavên "min, em, tu, te, ez, ew û hwd." Lê gelek cihan ev cihnav hatine pêş û paşkirin bo mebesta derbirînên ciwan.

**3- Jêkvavartina Risteyan**

A- Risteyên Ragihandinê

Wekî dîyar e ku risteyên lêkdan û ragihandinê pitir in ji risteyên dî yên deqî. Ev çend jî wê yekê xuya dike ku nivîserî boçûnên xwe li ser deqî hene. Bo mînak risteyên lêkdayî:

1- Gava ku fermana kurdan rabû, em hêj nû zewicî bûn.
2- Şevekê tu pir dereng mayî.
3- Gava tu hatiye mal, di destên te de tivngeke nû û çend sed berik hebûn.
4- Di welatî da şeş meh şerekî zor çêbû, jin bî bûn, zaro sêwî man.
5- Kurd destpêkî de dijmin şikandin, lê paşê bi bêbextî hatine şikestin.
6- Gava tu di şer de bûyî min ji te re kurikek anî.

7- Lawikê min îro pênc sal qediyane ko em ji hev dûr hatine êxistin.
8- Eskerên dijminan diketin hindirê male.
9- Dawet dest pê dike.

B- Risteyên Pirsê ?

1- Gurgîn … dîsan çi heye ?

C- Risteyên Mercî :

1- Megrî! Tinê vê demê ji bîra meke.

D- Risteyên Wesf tê da Hatine Bikaranîn :

Di risteyên wesfî da hemû ji dev jinê hatine arastekirin bi şêweyekî sozdarî. Bo mînak:

1- Çermê rû û sînga te perçifî û laşê te riziyaye.
2- Kurê te Tacîn zend û destên xwe ên nerm davêje ser stoyê min.
3- Bi çavên xwe ên zelûl û bikeser li min mêze dike.
4- Dilê min tirsiya û ricifî.
5- Te li min bi hêvîna çavan û bi kesera dilan mêze kir.
6- Zaro sêwî man.
7- Herdu destên te bi xwîn bûn.
8- Di ser sînga te de birîneke kûr û vekirî hebû.

Pêngava **Duyem** : Layenê Wateyê:

1- Vegerandina Kesayetîyên Çîrokê

Ev çîrok sê kesayetîyan bi xwe ve digire: Jin, Gurgîn, Tacîn. Kesayetîya “Gurgîn û Tacîn”î hatine wergirtin anko kesayetîyên xwestî ne, ne yên waqiî ne. Lê belê kesayetîya jinê ne dîyar e. Bi tenê amaje û gotinên wê dîyar in. Li vê derê em dê behsa hersê kesayetîyan bikin:

A- Kesayetîya Jinê

Di vir da navê jinê bixwe nehatiye, lê dewrûberê komelayetîyê dîyar dike ka navê wê çi ye? Lê belê bi amajeyên zimanî em dizanin kesayetîya jinê ye dema dibêje “Gava

ku fermana kurdan rabû em hêj nû zewicî bûn. Şevekê tu pir dereng mayî û gava tu hatî mal, di destên te de tivngeke nû û çend sed berik hebûn. Dilê min tirsiya û ricifî. Min ji te re bi dengekî lerizî digot: Gurgîn … dîsan çi heye?" Di vê derê da kesayetîya jinê xuya dibe, dema bi dengekî bilerz, tirs û ricifî dibêje: Di destên te da tivngeke nû çend sed berik hebûn... Anko tirs û lerizîn bara pitir sîfetên jinan e û hilgirtina tivingê karê zilaman e. Eger bigota di destên te da "çend gulên ciwan hebûn" li wê demê kesayetîya jinê bi dirustî dîyar nedibû, aya jin firêker e yan wergir e? Di vir da kesayetîya jinê du rolan digire :

1- Wek vegêra çîrokê,
2- Wek kesayetîyeka dîyar û karektereka çîrokê, ku giyanê berdewamîyê daye çîrokê.

Ku peyva jin di ferhengê da van sîmayan bi xwe ve digire:

Jin
- Nêr
+ Şûkirî ye
+ Pêgihiştî ye

B- Kesayetîya Zilamî (Gurgîn)

Gurgîn kesayetîyekî sereke yê çîrokê ye. Hêza dînamîkîya çîrokê ye ku çîrokê ber bi kopîtkê ve dibe. Helbet wekî me amaje pê daye ku "Gurgîn" kesayetîyekî xwestî ye, ne waqiî ye, ku ji giyanewerê "gur"î wergirtiye. Herwiha wekî kesayetîya jinê du rolan bi xwe ve digire:

1- Karakterê Çîrokê,
2- Di heman demê da guhdarê vegêrana çîrokê ye ji layê hevjîna xwe ve.

Ku peyva zilam di ferhengê da van sîmayan bi xwe ve digire :

Zilam
- mê
+ xêzandar
+ pêgihiştî

C - Kesayetîya zarokî bi navê “Tacîn

Ev kesayetî jî hatiye wergirtin neku kesayetîyekî waqiî ye ku ji “tac” hatiye wergirtin. Mebest jê taca serê babê xwe ye. Herwiha ev kesayetî dibe egerê berdewambûna çîrokê ku me amaje pê kiribû. Wek hêmaya paşerojê ku cihê babê xwe bigire û hêşta babê wî berdewam e di erka xwe da. Berhev bûye ku cihê babê xwe bigire. Dema dibêje: “Dayîka min bavê min re binivîsîne ko mezin bûme. Dilê min ji bo hejkirina Kurdistanê ye, xurtîya ji bona arîkarîya Kurdistanê ye, xwîna min ji bo şer û rijandinê ye!” Ev çend wê yekê digêhîne ku perwerde û avakirina zarokan karekî giring e ji bo paşeroja her miletekî. Di vê derê da xuya dibe Gurgîn gihîşte wê armancê ya dema çûye ser dergûşa kurê xwe yê pêncmehî. Ji Tacînî re gotiye: “Tacîn dilê te ji bona arîkarîya Kurdistanê ye, xwîna te ji bona şer û rijandinê ye!” (Di vir da xewna Gurgînî ci bi cî dibe û bi armanca digêhîne.) Sîmayên peyva zarok di ferhengê da:

Zarok
± Nêr
+ mirov
- Pêgihiştî

2- Dîyarkirina Wateya Mebest û Ew Derbirînên Nehatine Gotin

Mebest ji wan valatîyan yên bo xwendevanî dibine cihê pirsyarê û deqî negotin. Bo nimûne di vê pexşanê da dema jin dibêje zilamî “Gurgîn… dîsan çi heye?” berî hingê çi tişt nehatine gotin ka çi hebû ku xwendevanî xwendibe. Lê belê ev çend ramana hindê dide ku berî hingê jî berdewam şer û nexweşî hebûne. Lewra bi dengekî lerizî dibêje: “Gurgîn… dîsan çi heye?” Paşî bi dengekî xurt lê vedigerîne û dibêje: “Dawet

dest pê dike.” Û paşî yekser behsa şerî dike ku şerekî giran rû da û jin bê zilam man û zarok bê bab man. Anko du tiştên berûvajîyên yek in. Ya dirust ew bû piştî dawet dest pê dike, bûk û zava bihatana û xelkî berûka wan sema bikira û dehol û zirna lê bidana neku şerî dest pê bikira. Di vir da cihê pirsyarê ye bo xwendevanî dawet dest pê dike û bo çi yekser behsa şerî dike?


Di vir da nivîserî hunera rewanbêjîyê bi kar anîye û “şer” bi dawetê şibandiye bi vî rengî :

Şer = Lêçû (wek dawetê hatiye nîşandan),
Dawet = Lewçû (rengê xwe daye şerî),
Hose (Xebse) = Rûyê Lêkçiwandinê (rûyê wekhevîyê).
Ev çend jî mêrxasîya şervanê kurd xuya dide, ku çi caran paşve neçûye bo bergirîya welatî û her dem bi keyf û sema berev sinorên bergirîyê çûye û wekî dawetê hizir kiriye. Herwiha dibêje: “Kurd destpêkî de dijmin şikandin. Lê, paşê bi bêbextî hatine şikestin.” Di vir da amajeyê bi serkeftina kurdan dide û paşî dibêje bi bêbextî hatine şikestin. Mebest ne ron e ka bo çi hatine şikestin? Valatî maye, lê em dişên bibêjin: Bi egerê xîyanet û xwefirotina kurdan hatine şikestin, ku ev çend jî tiştekî dîyar û berçav e di mêjûya gelê kurd da berdewam tê tomarkirin. Herwekî hozanvanê mezin Ehmedê Xanî dibêje: “Derdê kurdan bêtifaqî û xiyanet û nezanîn e.”

Herwiha piştî ji şerî vegerîyaye mal û hevjîna xwe hembêz kirî û got: “Eskerên dijmin di ser şopa min de ne; bawer ke niho ewê bên û min bigrin.” Paşî kurê xwe hembêz dike û didane di nav dergûşa wî da û eskerên dijminî dikevine nav hindirê malê. Di vir da dîyar nebûye ka Gurgîn hatiye girtin ji layê eskerî ve, yan ne? Cihê pirsyara me li dev xwendevanî ye? Lê dû da yekser jin dibêje: “Lawikê min îro pênc sal qediyane ko em ji hev dûr hatine êxistin.” Di vir da dîyar dibe ku lawikê wê hatiye girtin û niha di destên dijminî da ye. Herwiha di vir da jinê hunera monologê bi kar anîye ku lawikê wê li dev wê nîne û di destên djimnî da ye û ew digel xwe diaxive û zêmaran dike di hizr û bîrhatinên lawikê xwe da roj û heyvan dihejmêre. Herwiha di vir da jî hunera rewanbêjîyê hatiye bikaranîn dema dibêje :

1- Te li min bi hêvîna çavan û bi kesera dilan mêze kir (hunera xwastinê hatiye bikaranîn).
2- Bi çavên xwe ên zelûl û bikeser li min mêze dike (Lêkçiwandin).
3- Bi destên xwe ên nerm (Lêkçiwandin).

Em dikarin hersê kesayetîyan di vî wêneyî da dîyar bikin:




Ev çîrok li ser van hersê kesayetîyan hatiye avakirin bi rola “dayîk, bav û kur”î.

Pêngava **Sêyem** :

Qonaxên Komkirina Parçeyên Deqî :

Ev deqê pexşanê li ser dû rehendên sereke parve dibe :

**A - Rehenda Eqilanî**

Vê rehendê kesayetîya zilamî derbirînê jê dike. Ev çend jî tiştekî fitrî û siruştî ye ku pitir lojîk li ser kar û kiryarên zelamî zal dibe ji hest û sozan. Wekî van risteyan :

1- Gava tu hatî mal, di destê te de tivngeke nû û çend sed berik hebûn.
2- Di welatî de şeş meh şerekî zor çê bû, jin bî bûn, zaro sêwî man. Kurd destpêkî de dijmin şikandin.
3- Gava tu di şer de bûyî, min ji te re kurikek anî. Êvarekê, ez li ber derîyê malê sekinî bûm, çavên min li rê bûn. Min dît tu hatî. Herdu destên te bi xwîn bûn. Di ser sînga te de birîneke kûr û vekirî hebû.
4- Tinê vê demê ji bîra meke. Paşê tu bi gavên lez çûyî ser dergûşa kurê xwe yî pêncmehî (Tacîn).

5- Tu niho di kortalekê de bi çarsed camêrên kurd radikevî. Xwedê dizane… Çermê rû û sînga te perçifî û laşê te riziyaye. Lê, Gurgîn! Bizane ko her şev berî here rakeve.

**B- Rehenda Hest û Sozan**

Wekî dîyar e rehenda hest û sozan pitir li ser kesayetîya jinê zal e ji ya zelamî. Ev çend jî bo fitret û siruşta wê dizîvire, bo guncîna wê digel rol û erka wê. Lew ra em dê bibînin hemû derbirînên hest û soz tê da zal bûyî ji layê kesayetîya jinê ve hatine derbirîn. Wekî:

1- Em hêj nû zewicî bûn.
2- Şevekê tu pir dereng mayî.
3- Dilê min tirsiya û ricifî.
4- Min ji te re bi dengekî lerizî digot: Gurgîn… dîsan çi heye?
5- Te li min bi hêvîna çavan û bi kesera dilan mêze kir.
6- Çavên min li rê bûn.
7- Te, ez himêz kirim.
8- Lawikê min! îro pênc sal qediyane ko em, ji hev dûr hatine êxistin.
9- Kurê te Tacîn zend û destên xwe ên nerm davêje ser stoyê min û bi çavên xwe ên zelûl û bikeser li min mêze dike, min maç dike.


Herwiha parçeyên deqî di nav bera hersê kesayetîyên çîrokê (jin, Gurgîn û Tacîn) hatine parvekirin û bi şêwazekî birêkûpêk hatine darêjtin. Helbet yek ji şêwazên sereke yên xwendina deqî, ew e xwendevan û nivîser hevdu razî bikin. Ew jî bi rêya wê çendê ku deq bi arezû û hezên derûnî yên xwendevanî be. Bi ramaneka dîtir dema xwendevan deqî dixwîne hest bi hestên navxweyê nivîserî dike. Wek xwendevanek dema ev deq xwend, wek filmekî wêne hatine pêş çavên min. Min hest bi wan nexweşîyan kir yên karekterên deqî tê da jîyane. Anko mebesta nivîserî dîyarkirina wan hemû nexweşî û sitema li miletê kurd hatiye kirin û wekî filmekî trajedîk bo me kawdanên dijwarên xêzaneka kurd nimayîş dike. Ku ev mînakek e ji hezaran çîrokên wekî vê.


Pêngava **Çarem**


Dîyarkirina Armanca Nivîserî

### 1- Di çarçoveya Deqî da : Dîyarîkirina Wesfa Kes û Rûdanan

Ev tekst wek cûre bi “pexşan” hatiye binavkirin. Lê di nav xwe da hevtekst digel herdu janrên “çîrok û roman”ê heye. Ji layê naverokê ve rehendên mêjûyî û neteweyî li ser zal e û diçe di xaneya rêbaza realîzma waqiîgerî da. Kamiran Bedirxan nivîser di hilbijartina gotara her yek ji karekterên vê têksta pexşanîya çîroka şêwaznameyî li dû rol, pêgeh û nivşê wan yê serkeftî bûye. Bo pitir ronkirina gotar û rola wan bi vî rengî dê bidin xuyakirin :






Di şirovekirina xwe da pitir em dê ronahîyê berdine ser gotarên “bav û kur”, “Gurgîn û Tacîn”î. Lê bo çûna di nav gotarên wan divêt em li ser gotara layenê sêyem (jin, dayîk û hevjîn) rawestin, ku wek vegêra serekeya çîroka vê deqê pexşanê tê nasîn û ku di forma nameyekê da arasteyî karekter û xwendevanan dike. Îca name wek kenal û amrazeka sereke bo gehandina peyama bavî bo kurî (Gurgîn bo Tacînî) û berûvajî kur bo bavî tê nasîn. Sererayî naveroka tekstê ku naveroka “neteweyî û mêjûyî” ye, Kamiran Bedirxan karîye balansa di navbera rehenda “hest û sozê” ji layê rehenda wê ya “lojîk û eqilanî” da ragire û gotara wî li dû wan rehendan bi kar bê. Li vê derê em dê rola hersê kesayetîyan xuya bikin :

1 - Gotara Jinê wek Hevjîn û Dayîk

Em dikarin bibêjin: Kamiran Bedirxanî divêyaye bibêje her jineka kurd bi tenê tirs û şermek li dema navînan yan gazîkirina hevjînê xwe hindek peyv û hevokên sozdarîyê bi kar binê. Lewra girêya “Lawikê Min” du caran li ser zarê hevjîna Gurgînî hatiye gotin. Risteya “Gava ku fermana kurdan rabû” wek risteya destpêka tekst, paragraf û herwisa wek risteya kilîlê tê nasîn ku bara pitir a risteyên deqî digel yek hevterîb in û her li ser binemayê vê risteyê arasteya gotara nivîser û karekteran dîyar bûye. Bo mînak: Di paragrafa yekê da eger li şûna risteya “Di destên te de tivngeke nû çend sed berik hebûn.” risteya “Di destên te da dîyarîyek û çend destikên gulan hebûn.” da hevdijîyek di navbera tekst, naverok û wateyê da dirust be. Dirust bikaranîna riste û

paragrafan beramber ew doxê jin ketiye tê da. Bo nimûne: di doxê tirsê da hest bi rîtim, awaz û stresa derûnî û derbirînê tê kirin: Dilê min tirsiya û recifî min ji te re bi dengekî lerizî digot: Gurgîn…dîsan çi heye? Anko di gotara jinê da layenê hest û sozan li ser layenê eqilanî zal e.

2- Gotara Zilam (Gurgîn)

A- Di Pêgeha Hevjînê da

Nivîserî vîyaye ew saloxên serincrakêş û pirheybet yên ajelê (gur) bide vî kesayetî. Lewra navê Gurgînî wek kesayetîyekî aza û çavnetirs û wefadar bo hevjînê û welatê xwe di vî deqî da hatiye hilbijartin. Bo nimûne: Gotara Gurgînî wek hevjînekî cengawer: Paşê bi dengekî xurt li min vegerand dawet dest pê dike: Ev riste bi şêweyekî dirkeyî derbirînê ji şerekî mezin dike (di waqiî da ev şer çêbûbû). Herwisa wek hevjînekî pir hest û soz piştî hembêzkirina hevjîna xwe bi şêweyê dîyaloga nerastewxwe hevjîna wî gotarê vedigêre: “Te got eskerên dijmin di ser şopa min de ne; bawer ke niho ewê bên û min bigrin, megrî!” (di waqiî da hate girtin û êxsîrkirin).

B- Di Pêgehê Babekî Cengawer da

Gurgîn di pêgehê babekî cengawer digel kurê xwe yê pêncmehî diaxive û bi navê wî gazî dike. Dema gotara xwe bi şêweyê peyameka bihêz û bilindtir ji asta temenê wî arasteyî wî dike, Gurgîn wî vîyaye kartêkirina peyama wî li ser kurê wî (Tacîn) li ayîndeyî da di asta ritm û bihêzîya heman peyamê da be.

Gotara Gurgînî wekî babekî cengawer: Tacîn dilê te ji bona arîkarîya Kurdistanê ye. Xwîna te ji bona şer û rijandinê ye. Bab ji bo bergirîya parastina Kurdistanê (welat) daxwaza buhatirîn endamê leşê kurê xwe dike ku dilê wî ye ew xwîna di nav demarê wî da digere. Kurtîya vê gotarê em dikarin di vê hêlkarîyê da bixine ber çavan :

Gurgîn (bav), **Firêker** ⟶ **Peyam** (gotar) ⟶ Kur (Tacîn) **Wergir**.

3- Gotara Kurî (Tacîn)

Nivîserî mebest navê "Tacîn" bo kurê Gurgînî hilbijartiye. Merema wî bo wê gotinê vedigere dema tê gotin "kur taca babî didane serê xwe" yan "kur kevanê babî dikêşe". Ku wate hejmûna kar û desthilata babî li ser kurî pitir e ji keçê. Tacîn li pêgehê kur û zarokê babî li pêgehek nizimtir e ji pêgehê babî û di vê tekstê da wek bikarhêner, karker, wergir, şîretwergirek tê nasîn bi rêya peyama xwe vîyaye wê bigêhîne babê xwe ku min peyam û şêreta te wergirtiye. Li ayîndeyê da dê kar lê bê kiriin. Wek te dê bibim cengawer.

Dema dibêje dayîka xwe ku "Bo babê min binivîse ku ez mezin bûme. Dilê min ji bo hezkirina Kurdistanê ye. Xurtîya ji bona arîkarîya Kurdistanê ye. Xwîna min ji bo şer û rijandinê ye." Di vê derê da rola navîn wek kenalek bo gehandina peyama kurî bo babî dîyar dibe û ji layekî dî ve derencam û armanca peyama babî bo kurî xuya dibe :

| Tacîn (kur) | → | Peyam | → | Gurgîn (bav) |
|---|---|---|---|---|
| ↓ | | ↓ | | ↓ |
| Bikarhêner | | Kenal (name) | | Armancder |

Di gotarên "bav-Gurgîn û kur-Tacîn"î da, rehendên eqilanî zal e bi ser rehenda hest û sozan.

**2- Proje : Geşepêdan û Rêxistina Rûdanan**

Rûdan yek ji regezên sereke yên her çîrokekê ye, ku berdewamîyê dide çîrokê û çîrok li ser tê avakirin. Mebest ji rûdanê girêyeka dirustkirî û pêşwext e û girêya baş di çîrokê da ew e ya ku rûdan tê da geşe dike û digêhe kopîtka kamilana xwe ji kêş, vekêşan û hevirkî û hevdijayetîyê ku giyanekî berdewam bide çîrokê. Divêt rûdan bi şêweyekî pêkvegirêdayî, hostakarî û hunerîyane bên berhemanîn (Bextîyar Îsmaîl Ebdulrehman, 2013: 7).

Di vê pexşanê da rû da bi awayekî zelal û birêkûpêk hatine nimayîşkirin bi tenê li destpêkê pêşî û paşîyek di rûdanan da heye. Wekî dibêje "Gava ku fermana kurdan rabû, em hêj nû zewicî bûn". Di vê derê da zewicîbûn berî fermana kurdan rabû. Herwiha em dikarin wan rûdanên di vê pexşanê da hatin, bi vî rengî rêz bikin:

1- Rabûna fermana kurdan,
2- Pêkanîna hevjînêyê,
3- Rûdana şerî (dawet dest pê dike),
4- Sêwîbûna zarokan û bêzilambûna jinan,
5- Peydabûna zarokî (Tacîn),
6- Rûdana birîndarkirina Gurgînî,
7- Hatina eskerê dijminî di nav hindirê malê,
8- Rûdana girtina Gurgînî bo zîndanê.

Eger em seh bikine van rûdanan, dê bibînin yek li dû yekê hatine rêxistin bi şêweyekî zincîrî û serencrakêş ku xwendevanî digel xwe têkel bike û digel karekteran da beşdarî di wan rûdanan bibe. Çunke ev cûre rûdan mîna wêneyên dînamîkî hatine nimayîşkirin û her wekî xwendevan bînerîya filmekî dike. Herwiha ev pexşan bi vekirî maye û bê encam e. Herwekî nivîser dibêje me, ev cûre çîrok dê li ser miletê me berdewam bin.

3- **Tomar : Ronkirina Keresteyên Kesayetîyan**

Di vê pexşanê da ew zanyarîyên hatine tomarkirin bo me çîroka xêzaneka sê kesî vedigêre, ku mêjûya wê bo berî sala 1932 yê dizîvire. Ku dibe piştî Cengê Cîhanî yê Yekê. Wekî dîyar e Cengê Cîhanî jîyan bi temamî wêran kiribû. Kurd jî ji wê çendê bêpar nebûn. Helbet piştî ceng bi dûmahî hat şûnwarên şerî û kartêkirina wî berdewam bû li ser gelên sitemlêgirî û bindest. Dr. Kamiran Bedirxan di navbera salên 1895 û 1978ê da jîyaye ku nivîserê vê pexşanê ye û wî bixwe beşdarî di şoreşên kurdî da kiriye (wekî şoreşa Şêx Seîdê Pîranî). Lê di vê pexşanê da kesayetîya nivîserî bi rola wergirî rabûye. Lê belê di jîyannameya nivîserî da hatiye ku çi zarok nebûne heta ku em bibêjin: Ev rûdana bi serê nivîserî xwe hatiye, helbet ev rûdaneka rasteqîne ye diktor Kamiranî li ser zarê jineka taze zewicî vedigêre û peyama xwe di vê pexşanê da digêhîne :

1- Aya mebesta nivîserî dîyarkirina zilm û sitema kurdan nîne? Belê mebesta nivîserî wê çendê dîyar dike dema dibêje “Gava fermana kurdan rabû...”. Li vê derê ferman qirkirin û nehêlana nasnameya gelê kurd e.

2- Aya mebesta nivîserî dîyarkirina qehremanetî û azayetîya zilamê kurd nebû? Belê yek ji mebestên nivîserî dîyarkirina azayetî, çavnetirs û wêrekîya zilamê kurd e, dema dibêje: “Di destên te de tivngeke nû û çend sed berik hebûn.” yan bi şibandina cengawerê kurd bi giyanewerekî zîrek bi navê “gurg”.

3- Mebesta nivîserî dîyarkirina rola jinê ye hem dayîk û hem piştevanîya zilamî bo berdewamîya xebatê? Lê belê di vê pexşanê da pêgehê jinê û rola wê ya kara xuya kiriye ku dema zilam li malê nebe, jin hem dayîk û hem bab e bo zarokan.

4- Aya mebesta nivîserî perwerdeya zarokan nîne li ser rêbaza babî? Belê dema dibêje: “Tacîn dilê te ji bona arîkarîya Kurdistanê ye, xwîna te ji bona rijandinê ye). Herwiha bo çi nivîserî zarokê kurd bi kar anîye neku zaroka keç? Her ji bo wê yekê ye ku kur cihê babê xwe bigire û bi erka wî rabe. Lê belê bêguman keçê wekî kurî ew şiyan nîn e bi erka cengawerîyê rabe.

5- Nivîser geşbîn e ku dê kurê qehreman (Tacîn) cihê babê xwe bigire û xebat dê berdewam be. Ev çend jî hêzê dide xwendevanî ku nehê herifandin.

6- Wekî me dîyarkirî kesayetî hatine wergirtin ne yên waqiî ne, ku kesayetîya “Gurgîn”î ji giyanewerê “gurg”î hatiye wergirtin wek hêmaya zîrekîyê. Herwiha kesayetîya Tacîn ji “tac”ê hatiye wergirtin ku da bibe taca serê babê xwe. Lê kesayetîya “jin”ê ne dîyar e, bi tenê hevokên wê dîyar in.

7- Nivîserî şêwazekî rastewxwe û sade bi kar anîye ji bo gehandina peyama xwe. Di vir da ziman xistiye di xizmeta gehandina peyamê da neku ciwanîyê da.

8- Ew fermanên nivîserî bi kar înane fermanên dînamîkî û livîner in. Ev çend jî wê yekê digêhîne ku ev deq di temenê gencînîyê da nivîsandiye.

9- Di vir da nivîserî hevsengî di navbera gotara sozdarî û gotara eqilanî di navbera jin û zilamî da ragirtiye. Vê çendê berdewamî daye giyanê çîrokê.

10- Di vê derê da armanca nivîserî berdewambûna xebatê ye, ji bona azadîyê. Hindî nexweşî û asteng hebin berxwedan, xebat, birîndarî, zîndan û mirin xweştir e ji jîyana bindestî û kolayetîyê.

## ENCAM

Wekî dîyar e, xebata me hate encamdan li ser wateya deqî û xwendineka pragmatîkî. Li vêre me hewl da ew mijarên giring ên peywendî bi naveroka babeta me ve heye em bi awayekî zelal bidine xuyakirin û di vê xebatê da em gihîştine van encamên li xwarê :

1- Şirovekirina deq û gotarê kirdeyeka hilweşandina hêmayan û xwendina di navbera dêrên deqî ye bo gihîştina mebesta nivêserî û peyama rastewxo û nerastewxo ya nivîserî bo xwendevanê xwe .

2- Xwendina pragmatîkî ya deqî pişt bi vegerandina dewrûberî girê dide bo vekirina kodan û gihîştin bo hindirê nivîserî û hokarê xalîkirina derûnîya nivîserî bi rêya nivîsînê.

3- Şiroveya pragmatîkê hewla wê yekê dide, bigêhe mebesta nivîserî bi rêjeyî. Ji bilî vê çendê jî di şiyandaye xwendinên cuda bo deqê edebî bike ku bigunce digel derbirînên zimanî.

4- Me hokarên tênegihîştina deqî dîyar kirin ji layê astên zimanvanîyê ve ku hindek derbirîn û destewaje, riste, peyv û fonîm hene dibine egerê dereng tênegihîştinê yan eger asta şarezayî ya xwendevanî ya lawaz be dibe her têneghe.

5- Xwendina pragmatîkî ya deqî li ser çar qonaxan parve dibe:

A. Vekirina hêmayên deqî .
B. Dîyarkirina wateya mebestê.
C. Dîyarkirina şarezabûna wergirî bi cîhana ji derve di hoşî da.
D. Dîyarkirina armanca nivîserî ji deqî.

6- Di xwendina pragmatîkî ya pexşana “Lawikê Min” ya Dr. Kamiran Bedirxan : Em şiyane bigêhîne armanc û mebesta nivîserî . Helbet wekî amaje pê hatiye kirin ku deqên edebî ji deqên vekirî têne hejmartin. Ji ber hindê çendîn xwendinên cuda bi xwe ve digrin. Eger deqê edebî çend sade û zelal be, rêyê dide xwendevanî ku bi hilweşandina wê rabe û deqekî baştir û ciwantir berhem bîne.

7- Di vê vekolînê da me behsa mebesta nivîserî û têgihîştina xwendevanî kir ku ev dibe senterê lêkolîna me û ew pisyara cewherî ya me di armancan da behs lê kirî. Aya mebesta nivêser û xwendevanî hev dagirin yan yekgirtineka rêjeyî ye? Di vir da me

behsa cureyê peyama nivîserî kir ji layê giranî û sivikîyê ve. Di heman demê da me behsa asta merîfî ya xwendevanî kir ku dibe bersiva pirsyara sêyê: “Erê paşxaneya rewşenbîrî, şarezayî û şiyanên xwendevanî bo vedîtina mebesta nivîserî rola xwe heye?” Eger bersiva vê pirsyarê “nexêr” be bêguman mebesta nivîserî û têgihîştina xwendevanî yek nagirin. Lê eger bersiv “belê” be, têgihîştina xwendevanî û mebesta nivîserî dê li astên cuda û rêjeyî hev bigirin. Helbet asta paşxaneya merîfî ya xwendevanî roleka berçav dibîne bo gihîştina mebesta nivêserî. Çunke asta xwendevanî û pisporîya wî ji yekî bo yekî dî tê guherîn. Vê çendê jî kartêkirin li rêjeya têgihîştinê heye. Her ji ber cudahîya asta epîstemolojîya xwendevanî têgihîştin tiştekî rêjeyî ye û wate ji kesekî bo kesekî tê guhartin.

8- Semantîk neşîy ye bigehîte mebesta nivîserî çunkî ji sinûrê ferhengê derbaz nabe bitnê di çiwar çuveyê dewrûberê zimanî da di astê fonetîk , fonolojî , sîntaksê û ferhengsazyê da şilovekirna deqî dike. Lê pragmatîk derbazî nav dewruberê nezmanî û hindrê nivîserî dibe û ewa peyva neşîyayî weteyê xuya bike, pragmatîk zelal û aşkera dike.

9- Zansitê pragmatîkê biyavekê berifrehê epistmolojî bixwe dige, wek Felsefe , Mêjû , Sîyaset , Edebyat , Zansitê zimanvanyê û Rîklam ... Hid.

10- Semantîk wateya xwe ji Pît , Peyv û Ristan werdigire di sinûrê ferhengê da , lê pragmatîk zêdebarî Pît , Peyv , Ristan û Ferhengê wateya xwe ji dewrûberî werdigre, anku wateya Semantîkê + Dewrûber = Wateya pragmatîkê.

11- Forim û wate du tiştên ji hev nahêne cûdakrin , ku form ji Fonetîk , Fonolojî , Sîntaksê bi xwe digire, lê wate Semantîkê û Pragmatîkê bi xwe digire.

12- Heta her nivêsareka bîte deq pêdivîye hinek ji ewan heft pîverên deqbûnê têda hebin , ewên me diyarkirîn : Lkandin , Vehandin , Helwesit , Ragehandin , Mebest, Pesendikrin , Hevdeqî .

13- pragmatîk ewan hêmayên di nav deqî da şilovedike ewên amaje daye ewan tiştên ji dervey deqî , anku mebestê xuya dike.

## ÇAVKANÎ


Afaf Bin But (2014) . *Mistewîyat el Sîyaqe el Luxewî we Esre fî Tewcîhe el Me'na*, Rîsale Master, Camî'e El 'Erebî Mehîdî, Qahîre.

Avêsta Kemal Mehmûd (2009) . *Pragmatîkî Risteyî Pirsyarî û Ferman le Zimanî Kurdî da*, Malbendî Kurdolojî, Silêmanî.

Azad Ehmed Mehmûd (2009) . *Binyatî Ziman Le şe'rî Hawçerxî Kurdî da*, Belawkiraweyî Ekadîmyayî Kurdî, Çapxaneyî Hacî Haşim, Hewlêr.

Baqir Casim Muhemed (2009) . *Neqid el Neqid Em el Mîtaneqid*, Mucele 'Alem el Fikir, Muceled 37, 'Eded 3, Kûweyt.

Bedirxan Sindî ( 2003) . *Zêmarên Çîyayî*, Çapa Yekem, Ji Weşanên Malpera Amûdê, hejmara 21, Dihok.

Bextîyar Îsmaîl Ebdulrehman (2013) . *Hunerê Çîrokê di Quranê da*, Vekolîna Bekalerîyusê li Zanîngeha Dihok, Perwerda Binyat, Beşa Zimanê Kurdî, Dihok.

Can Kohn (1986). *Bunîye el Luxe El Şe'rîye*, Teb'el Ûla, Tercume : Muhemed el Walî we Muhemed el 'Omerî, Dar Beyza, Mexrib.

Can Pol Satir (1947). *Ma el Edeb* , Tercume: Muhemed Xenîmî Hîlal, lîl Teba'e wel Neşir wel Tewzî' el Ficale, Qahîre.

Ebdî Hacî ( 2008) . *Çend Tîyorekên Rexna Edebî*, Çapa Yekem, Çapxaneya Hacî Haşim, Hewlêr.

Ebdul Fetah Emîr Ebas . Miharat el Telxîs el Nis, 3 November 2014 , https://images.app.

Ebdulhadî bin Zafir el Şehrî (2004) . *Îstiratîcîyat el Xîtab: Miqaribe Luxewîye Tedawilîye*, el Teb'el Ûla, Dar Kîtab el Cedîd el Mutehîde, Beyrût.

Ebdulkerîm Muderis, Fatih Ebdulkerîm (1383) . *Dîwanî Nalî, Lêkolînewe û Lêkdanewe*, Çapa Sêyem, Antîşarat Kurdistan.

Ebdulmutelîb Ebdullah (2008) . Şerî Ziman le Pênaw Tewîlkirdinî Deq, www.dengekan.com, Hewlêr.

Ebdulselam Necmedîn, Şêrzad Sebrî (2011) . *Zimanvanîya Tîyorî*, Çapa Yekem, Çapxaneya Hacî Haşim, Hewlêr.

Ebdulwahid Mişîr Dizeyî (2014) . *Zanistî Pragmatîk*, Berêweberî Kitêbxaneyî Giştîyekan, Çapî Duwem, Hewlêr.

Ebdulwahid Mişîr Dizeyî (2010) . *Watesazî û Wuşe, Riste,* Çapî Yekem, Çapxaneyî Rojhelat, Hewlêr.

Ebdulwahid Mişîr Dizeyî (2015) . *Zanistî Semantîk*, Berêweberî Kitêbxaneyî Giştîyekan, Çapî Yekem, Hewlêr.

Ebdulwahid Mişîr Dizeyî (2009) . *Karîgerî Derûnî le Bowarî Rageyandin da* , Dezgayî Aras, Hewlêr,

Ebdulwahid Mişîr Dizeyî (2012) . *Şêwaz û Pragmatîk*, Nawendî Awêr bo Çap û Belawkirdinewe, Hewlêr.

Ebdulwahid Mişîr Dizeyî (2014) . *Pragmatîkî Deq û Gotar*, Nawendî Awêr bo Çap û Belawkirdinewe, Hewlêr.

Ebdulwahid Mişîr Dizeyî (2015) . *Nîşane û Deq û Wate*, Nawendî Awêr bo Çap û Belawkirdinewe, Hewlêr.

Ebdulwahid Mişîr Dizeyî (2015) . *Rewanbêjî û Pragmatîkî*, Nawendî Awêr bo Çap û Belawkirdinewe, Hewlêr.

Ebîr Muhemed Axir . Xitwat Tehlîl el Nisûs el Edebîye, 27 Sebtember 2017, https://www.almrsal.com

Ednan bin Zelîl (2000) .*El Nes wel Islûbîye Beynel Nezerîye wel Tetbîq*, Menşurat Ittîhad el Kîtab el Ereb, Eskenderîye.

Ehmed el Ze'ebî (2000) . *El Tenas: Nezerîye we Tetbîqîyen*, el Teb'e Sanîye, Muesese 'Ûmun lîl Neşir we Tewzî', Urdin.

Ehmed Muxtar Omer (1985) . *Ilim el Delale*, el Teb'e el Sadîse, Alem el Kîtab, Qahîre.

Ehmed Yasîn (2015). *Binemayên Rexna Edebî di Rojnamevanîya Devera Badînan da*, Çapa Yekem, Çapxaneya Xanî, Dihok.

El Ezher el Zinad (1993) . *Nesîc el Nes*, El Teb'el Ûla, Dar Neşir Merkez el Seqaf el 'Erebî, Beyrût.

El Seyîd el 'Erebî Yusif (2016) . El Delale wel 'Ilim el Delale el Mefhum wel Mical we Enwa', https://www.elukah.net.

Elfrêd Edler (2018) .*Têgehiştina Siruştê Mirovan*, Çapa Yekem, Wergêran: Seyfulah Elî, Sîyar Temer, Çapxaneya Hêvî, Hewlêr.

Emîn Ebdulqadir (2007) . *Têkst di navbera Gotara Rexne û Rêbazên Edebî da*, Çapa Yekem, Çapxaneya Hawar, Dihok.

Erxewan Muhemed Ubêd (2013). Awêtebûn û Lêkdaneweyî Nalî, Çapî Yekem, Çapxaneyî Karo, Kerkûk.

Ewrihman Hacî Marif (1975) . *Wişey Zimanî Kurdî*, Çapxaneyî Kurî Zanyarî Kurd, Bexdad.

Fuad Reşîd (2005) . *Nasnameyî Deq, Çapî Yekem*, Belawkirawekanî Liqî Kerkûkî Yekêtî Nûseranî Kurd, Çapxaneyî Wezaretî Perwerde, Hewlêr.

Fuwad Afanî (2011) . *Nezerîye el Tîlqa Rîhle el Hîcre*, Dar el Neşir Neynewa, Sûrya.

Helmet Payiz (2013) . *Deq Awêzan le Romanî Henarî Dunyayî Bextiyar Elî da*, Çapî Yekem, Çapxaneyî Şehab, Hewlêr.

Hemu el Hac Zehebîye (2012) . *Lîsanîyat el Telefiz we Tedawilîye el Xîtab*,Teb'e Sanîye, Dar el Emel lîl Teba'e we Neşir we Tewzî', el Medîne el Cedîde, Mexrib.

Herêm Usman (2018) . *Damezirandinî Binemayekî Ontolojî bo Rexne,* Çapî Yekem, Çapxaneyî Hemdî, Berêweberayetî Giştî Kitêbxane Giştîyekan.

Hesen Silêvaneyî (2017) . *Deh Çîrokên Gelek Kurt*, Rojnama Evro, Hejmara 2127, Dihok.

Hisam Ehmed Ferec (2007) . Nezerîye Ilim el Nes: Rûwîye Menhecîye Bîna el Nes el Nesrî, el Teb'el Sanîye, Mekteb el Edeb, Qahîre.

Kamîran Bedirxan (1932) . *Pexşana Lawikê Min*, Govara Hawar, Jimare 4, Îstenbol.

Kemal Silîvaneyî . Hevtêkstî, 25 May 2019 https://xedeng.yoz.edu.krd .

Klaws Birînkir (2004) . *El Tehlîl el Luxewî lîl Nes*, Medxel îla el Mefahîm el Esasîye wel Menahic, Teb'el Ûla, Tercume: Se'îd Hesen Behrî, Muesese Muxtar lîl Neşir wel Tewzî', Qahîre.

Mehmûd Ehmed Nehle (2002) . *Afaq Cedîde fî el Behis el Luxewî el Me'asir*, Kulîye el Adab, Camî'e Eskenderîye, Misir.

Mehmûd Ekaşe (2005) . *Luxe El Xîtab el Sîyasî : Dîrase Luxewîye Tetbîqîye fî Zew Nezerîye el Îtîsal*, El Teb'el Ûla, Dar Elneşir lîl Camî'at, Qahîre.

Menqur 'Ebdulcelîl (2001) . *'Ilim el Delale Îsule we Mubahise fîl Turas el 'Erebî*, Mîn Menşurat el Kîtab el 'Erebî, Dîmeşq.

Mesûd Cemîl Reşîd (2016) . *Pexşan û Hunerên Wê*, Çapa Yekem, Çapxaneya Hêvî, Dihok.

Mîcan el Rûwîlî, Se'di el Bazi'î (2002) . *Delîl el Naqid el Edebî*, El Teb'e Salîse, el Merkez el Seqafî el 'Erebî, Dar el Beyza, Mexrib.

Mihsin Arif Salih (2012) . *Praktîzkirina Tîyora Deqî di Mem û Zîna Xanî da*, Nama Diktorayê, Zankoya Dihok.

Muhemed 'Ebdil Beşîr Mesalitî (2019) . *Xîtab el Belaxe*, el Tabi'el Ûla, Merkez el Kîtab el Akadîmî, Uman.

Muhemed el Exzer el Sebîhî (2008). *Medxel îla ‘Ilm el Nes*, Mucalat Tetbîqîye, el Teb'el Ûla, Menşurat el Îxtîlaf, Cezayîr.

Muhemed Merûf Fetah (2011) . *Zimanewanî*, Çapî Sêyem, Belawkiraweyî Ekadîmîyayî Kurdî, Çapxaneyî Hacî Haşim, Hewlêr.

Muhemed Merûf Fetah (2011) . *Zimanewanî*, Çapî Sêyem, Çapxaneyî Haşim, Hewlêr.

Muhemed Muhemed Yunis Elî (2004). *El Me'na wel Zîlal el Me'na*, el Zîme fîl Erebîye, el Teb'el Ûla, Dar el Medar el Îslamî, Lîbya.

Muhemed Salim Se'dulah (2007) .*Memleke el Nes*, el Teb'el Ûla, Cîdar lîl Kîtab el 'Alemî lîl Neşr we Tewzî', Urdin.

Muhsîn Aware (2010) . *Deqî Daxiraw û Deqî Kirawe Dû Kîşwerî Cîyan*, Rojnameya Xebat, Jimare 4561, Hewlêr.

Munzîr Eyaşî (2002). *El Islûbîye we Tehlîl el Xîtab*, el Teb’el Ûla, Merkez el Înma el Hezarî, Sûrya.

Murad Ebdulrehman Mebruk (2015) . *Nezerîye el Îtîsal el Edebî we Tehlîl el Xîtab*, Kulîye el Adab, Camî'e Melik 'Ebdul'ezîz, Siudîye.

Nasir bin Muhemed . Xitwat Qirae el Nis el Edebî, 13 April 2015 https://storyandstora.wordpress.com

Nasir Hamid Ebu Zeyd (1999) . *Îşkalîyat el Qîrae wel Alîyat el Tewîl*, el Tab'e el Xamîse, el Merkezî el Seqafî el Erebî.

Necat Hemîd Ehmed (2008) . *Tîyorî Binyatî Şarawe*, Çapî Yekem, Dezgayî Çap û Belawkirdineweyî Aras, Hewlêr.

Nemetulah Hamid Nihêlî (2007) . *Şêwazgerî*, Çapa Yekem, Çapxaneya Hacî Haşim, Hewlêr.

Newzad Weqas, Rêbiwar Muhemed (2019) . *Şî'rî Kurdî le Rewangeyî Pêwerekanî Deqêtîyewe*, Govarî Towêjer, Bergî 2, Jimare 3, Hewlêr.

Perwîn Ebdulla . Şîkirdneweyî Soz, 28 September 2018 hittp://www.hawler.in/index.php.

Perwîn Usman Mustefa (2009) : *Wate û Wergêran*, Çapa Yekem, Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr.

Qeys Kakil Tofîq (2002) : *Peywendîyekanî Nêw Qeq*, Nameya Diktora, Kolîjîya Adab, Zanîngeha Selaheddîn, Hewlêr.

Rehîm Surxî (2008) . *Proseyî Peywendî Cemawerî*, Çapxaneyî Xanî, Dihok.

Rewan Merwan . Tehlîl el Nis el Edebî , 30 Sebtember 2019, https://wikiarab.com .

Rêzan Salih, Senger Nazim (2017) . *Deqawêzan le Romanî Hîkmetî Pîranî da*, Govarî Towêjer, Jimare 0, Hewlêr.

Rolan Bart (1986) . *Ders Sîmîyolojîya*, Tercume : Ebdulselam bin Ebid el ‘Anî, Teb'e el Sanîye, Dar Tubqal lîl Neşir, Mexrib.

Sacîde Ebdullah Ferhadî (2008) . *Riste û Paşriste û Têrwanêkî Erkî*, Çapî Yekem, Dezgayî Çap û Belawkirdineweyî Aras, Hewlêr.

Salîk Rafêl (2009) . *Şîkarkirdinî Gotarî Çîroke Hewal*, Wergêranî: Şêrko Heme Emîn Qadir, Çapî Yekem, Çapxaneyî Renc, Silêmanî.

Sefîye Mutehirî (2003) . El Delale el Îhaîye fî el Sîxe el Efradîye, Mîn Menşurat Îtihad el Kîtab el 'Erebî, Dîmeşq.

Seher Kamil Kazim (2018) . *Muharat el Fehm el Quranî*, Mucele Kulîye Terbîye el Esasîye lîl U'lûm Terbewîye we Însanîye, Eded 38, Camî'e Babil, 'Îraq.

Seîd Hesen Behrî (1997) . *Îlmu Luxe el Nes el Mefahîm wel Tîcahat*, el Teb’el Ûla, Dar Nûbar Lîl Tebae, Qahîre.

Seîd Yeqtîn (1989) . *Înfîtah el Nes el Rîwaî*, el Teb'el Ûla, el Merkez el Seqafî el Erebî, el Dar el Beyza, Beyrût.

Selah Fezil (1992) . *Belaxe el Xîtab we 'Ilim el Nes*, el Meclis el Wetenî lîl Seqafe wel Finûn wel Edeb, Kûweyt.

Selam Nawxoş (2005) . *Puxteyek Derbareyî Zimannasî*: *Mêjûyî, Binyatgerî, Çomsky*, Çapî Yekem, Çapxaneyî Çiwarçira, Hewlêr.

Şêrzad Sebrî (2014) . *Pragmatîk*, Belawkiraweyî Ekadîmyayî Kurdî, Çapxaneya Hacî Haşim, Hewlêr.

Şêrzad Sebrî Elî (2011) . *Wate di navbera Semantîk û Pragmatîkê da*, Çapa Yekem, Çapxaneya Xanî, Dihok.

Şêrzad Sebrî Elî (2015) . *Watesazî*, Çapa Yekem, Çapxaneya Hawar, Dihok.

Şoreşvan Adil Ehmed (2012) . *Zimanvanîya Têkstî*, Çapxaneya Hawar, Dihok.

Talan Muhemed Umer (2010) . *Şîkirdineweyî Deqî Witare Ayînekan: Rojî Heynî le Şarî Hewlêr*, Nameyî Master, Zankoyî Selaheddîn, Hewlêr.

Welîd el 'Înatî (2010) . Tehlîl el Xîtab we Te'lîm Mufredat el 'Erebîye lîl Natiqîn Bîxeyrîha, Mucele 'Ilmîye Mehkeme, el 'Eded 2, Rebî'el Ûla, Uman.

Wilyem Raîy (1987) . *El Me'na el Edebî,* el Teb'el Ûla, Tercume: Yunîl Yusif, Dar el Memûn lîl Tercume we Neşir, Bexdad.

Wirya Umer Emîn (2004) . *Asoyekî Tirî Zimanewanî, Çapa Yekem*, Le Kitêbxaneyî Giştî Roşenbîrî û Hunerî, Hewlêr.

Wiza' bin Hadî, Fen el Texellis . http://said.net/doat/wadah/index.htm

Xazî Hesen (2020) . *Mana û Deq le Defterekanî Derbaxel da*, Govara Raman, Hejmara 274, Hewlêr.

Xeyat Arî Usman (2011) . *Sê Wêstgey Edebî* , Çapî Yekem, Çapxaneyî Silêmanî.

Yadîgar Letîf Şarezorî (2013) . *Tîyorekanî Wergirtin le Îstatîkayî Wergirtinewe bo Rexneyî Hatine Welamî Xwîner*, Çapxaneyî Hemdî, Silêmanî.

Yasîn Qadir Berzincî (2009) . *Honerî Dirama Ramanêk le Diramayî Kurdî da*, Çapxaneyî Kemal, Silêmanî.

Yehîya Ehmed (1989) . *El Îticahe el Wezîfî we Dewre fî Tehlîl el Luxe*, Mucele 'Alem el Fikir, Muceled 20, 'Eded 30, Kûweyt.

# JÎYAN NAME

Bextîyar Îsmaîl Ebdulrehman li sala 1984 an li Gundê Gabêrgê ser bi Nahîya Zawîte û parêzgeha Dihokê li başûrê kurdîstanê hatîme dinyayê , perwerda xwe ya seretayî li Gundê Gabêrkê qetandîye û paşan navincî û duwa navincî li Dihokê qetandî ye û paşan derbazî zanîngeha Dihokê bûyme û beşa ziman û edeba kurdî li 7/7/ sala 2013 li ser astê 78 xwendekaran pila duwem bi dest xistîye . Her di heman salda 7/11/ 2013 bi awayekê fermî weko vekoler li beşa ziman û edeba kurdî li zanîngeha Dihokê hatîme damezirandin û hete niha li ser karê xwe berdewamim. Herwesa li sala 2019 li Zanîngeha van yuzuncu yilê li enstîtuya zimanê zindî weku xwendekarê lîsansa bilind hatime wergirtin .